
Arjen Arî

# Xasenezer



Ceribîn

EVRENSEL
BASIM
YAYIN



EVRENSEL

BASIM YAYIN

Arjen Arî

# XASENEZER

Ceribîn

**DOĞA BASIN YAYIN**
**Dağıtım Ticaret Limited Şirketi**
Tarlabaşı Blv. Kamerhatun Mah. Alhatun Sk. No: 25 Beyoğlu / İstanbul
T: 0212 255 25 46 F: 0212 255 25 87
www.evrenselbasim.com - info@evrenselbasim.com

Evrensel Basım Yayın **526**
Rêza Pirtûkên Kurdî **17**
**Xasenezer: Arjen Arî**

Dîzayna Bergê: Savaş Çekiç
Amadekirina Bergê: Devrim Koçlan

**ISBN 978-605-5315-50-4**
© Evrensel Basım Yayın 2013 - Sertîfîka No 11015

Çapa Yekemîn Avrêl 2013 • Stembol

Çap: Ezgi Matbaası Sertîfîka No: 12142
www.ezgimatbaa.net - ezgimatbaa@maynet.com
Sanayi Cad. Altay Sk. No: 10 Çobançeşme-Yenibosna / İstanbul

# XASENEZER

*...*
*...*

*Ger dê wî nezer bida me carek*
*Îksîrê tewecciha mibarek*

*Ev qewl-i hemî dikirne eş'ar*
*Ev pûl-î hemî dibûne dînar*

*Emma, nezera wî zêde a'm e*
*Lew xasenezer ji dil neda me*
*...*

zimanê xwe ne rojekê
her roj her saet her kêlî
li mal li kolanê li bazarê
bi axaftinê piroz bikin

A. Av

*Diyarî giyanê mirovê xas*
*Heyvanê hizr û ramana xas*
*Xwedan berhem û şiyana xas: Ehmedê Xanî*

## NAVEROK


*Pêşgotin* ..... 13
*Helbest û welatê ez jê* ..... 15
*Ez mecbûr im / Dinivîsim* ..... 19
*Ez mecbûr im / Xweda jî nivîskar e* ..... 21
*Ez mecbûr im / Kerem bikin...* ..... 25
*Mahr* ..... 27
*'Sefartî'* ..... 30
*Ji 56 çivîkan qertelek...* ..... 34
*Cegerxwîn: Homerosê Erdnîgariya Kurd* ..... 36
*Wêje û dîroka wêjeyê* ..... 39
*Ji klasîkiyê ber bi futuristiyê: Reşîdê Kurd* ..... 42
*'Roja dilefroz'* ..... 47
*Dengên ku di guhên me de dixulxulin* ..... 53
*Pira di navbera îro û siberojê de* ..... 58
*Xanî û Newroz* ..... 61
*Şa'irê Korocax* ..... 64
*'Xasenezer'* ..... 67
*Di navbera du 'reş'an de 24 deq!* ..... 71
*Dilê Xembar* ..... 74
*'Florttistî' an 'Forttîstî'?* ..... 77
*70 rûpel êş!* ..... 81
*Gotin* ..... 85
*Serkîsof* ..... 88
*Portre* ..... 90
*Helbest: ya her kesî* ..... 93
*Hilmek jiyan* ..... 96
*Tu tî, ez tî...* ..... 99
*Ji min re helbestekê bixwîne* ..... 102

*Hinekî ziman, hebekî wêje* ..... *104*
*Li Zagrosan* ..... *106*
*Mirina xweşik* ..... *108*
*Şabaş ji bo şaira di zîndanê de!* ..... *111*
*Kaya Kevn* ..... *114*
*Niyet û helwest* ..... *117*
*Qabil û xebîr* ..... *122*
*'Alema kelama mewzûn'* ..... *125*
*Em; ez, tu, ew...* ..... *127*
*Şeqşeqçî* ..... *130*
*Ez ji mirîyan...* ..... *133*
*H. N. H.* ..... *136*
*Eger hat, û...* ..... *139*
*Zarokên Evdêl* ..... *142*
*Tucholsky'ên kurd* ..... *145*
*Enûma elîş: Demekê... li jor* ..... *148*
*Min ji bîr meke* ..... *150*

# *Pêşgotin*

*Arjen Arî, ji bo ku helbesta xwe bipijîne, bi hevîrtirşa helbesta klasîk hevîrê xwe stiraye lê ne di tenûra gundê Çalê de, di firneya nûjen a cîhana modern de nanê xwe pehtiye. Ango tovên ku ji çiya û zozanên Kurdistanê berhev kirine, anîne, di zeviyên deşta welatê xwe de çandine û ev tov xweş û xweşik şîn bûne. Ber girtine.*

*Erê ew tov şîn hatin, ber girtin bûne berhem; ramûsanên xwe li geliyan veşartin, li çiyayên rûspî bûne lehengê berxwedana kurdan, bûne Kawa, bûne Şêrgele; ne çar û ne çil, bûne bi sedan helbest, ne tenê li bakur û li başûr, li her çar qetan, di dilê kurdan de gobilîn, ligel newayên mîna dengê têla gîtara hunermendê kurd, Memet Atlî.*

*Arî paleyekî zeviya wêjeya kurdî ye, paleyekî kedkar e ku bi keda xwe, bi dil û mêjiyê xwe giyana xwe ya bindest şuşt û pikîpak ji nav me çû. Wî Kurdistaneke azad nedît lê dê helbestên wî di dilê kurdên azad de, her tim zindî bin, heya wê roja ku her kurdê birûmet li benda wê ye. Ku her belbesteke wî, dikare bibe stranek, dikare bibe sirûdek ji rojên azadiyê re, di rojên dijwar de...*

*Bi pênûsa xwe, bi dilê xwe rengekî delal da helbesta kurdî û bi wê helwestê bû paleyekî zimanê kurdî jî, ku bi helbesta wî kurdî dibe kewara hingivî. Di pêvajoya bindestiya gelê xwe de, tişta herî zehf dilê wî diêşand, perçebûna welatê wî bû ku wî evê yekê weke – çar parî– bi nav dikir. Loma heta jê hat dengê xwe li helbesta xwe bar kir û dil û mêjiyê xwe jî pê re û ew deng li –çar qetan- belav kir, bi hêviya ku rojekê kulîk di dilê wî û dilê her kurdê birûmet de vebin. Kulîlkên azadiyê...*

*Di wêjeya neteweyên bindest de, ziman hêman û navgîna girîng a nasnameyê ye. Arjen Arî jî bi vê hişmendiyê, her tim zimanê xwe di jiyana xwe de zindî û çalak girt. Dîsa bi vê ve girêdayî, di helbesta*

*xwe de, di nivîskariya xwe de, çanda gelê xwe bikar anî. Û bi vê yekê xwest bi qasî serê derziyekê be jî keda wî di avakirina netewebûna gelê wî de hebe. Weke ku nivîskar û şairê Ingilîz Aldous Huxley jî angaşt dike ku 'romanûs û helbestvan heta radeyeke mezin îcatkarê neteweyên xwe ne*[*]*, bi vê baweriyê tevgeriya û bi vê mebestê helbestên xwe ristin.*

*Di hevpeyvîneke ku Kovara W pê re kiribû de weha gotibû Arjen Arî, "Min xwest ez her tim bi 'bîr' bim, bi bîr bînim, xîtabî 'bîrê' bikim."*[**]

*Belê bi hişmendiya wê 'bîrê', rahijt pênûsê, her tim rabirdûya gelê wî, di 'bîra' wî de bû, gava helbestên xwe diristin, dixwest xwendevan her tim vê dîrokê û bi vê re çand, ziman ango nasnameya xwe ji 'bîr' neke.*

*Ji ber keda wî ya di warê wêjeyê de ku di encama vê kedê de berhemên hêja diyarî gelê xwe kir tu caran dê neyê jibîrkirin, ew ê her tim di 'bîr'a gelê xwe de be.*

*Mixabin weke ku wi jî di jînenîgariya xwe de gotiye, "Kurdan gotiye, 'ji lêhatinê, ji jêhatinê' ji min re li hevdu nehat. Hê ez 11 salî bûm, bavê min çû rehmetê."*[***] *Jiyan jî jê re li hev neanî û di demeke bêwext de, ji nişkê ve ji nav me bar kir û çû. Lê helbestên wî dê her tim hebin, ma ku ev ne bextewarî be, bextewarî çi ye?*

*'Xasenezer', berhema wî ya dawî bû. Di vê berhema cerbînê de, helbest di serî de, dîtin û gotinên xwe yên derbarê wêje û zimanê kurdî de bi me re parve kirine. Mixabin nexweşiya kambax nehişt çapa vê berhemê bibîne. Lê gava ku wî li bajarê Edenê tedawî didît û min bi riya telefonê rewşa wî pirsîbû, wî jî rewşa 'Xasenezerê' ya dawî ji min pirsîbû û li ser daxwaza wî, min dosya bi riya înternetê jê re şiyandibû. Niha jî, bi bextewerî, em diyariya Arjen Arî ya dawiyê, li ser navê wî, pêşkêşî xwendekarên kurdî dikin.*

*Oxir be Arjen Arî, oxir be paleyê helbesta kurdî...*

*Îsmaîl Dîndar, 06.02.2013, Amed*

---

* Romana Kurdî û Nasname, Haşim Ahmedzade, avesta, 2011-Stenbol

** Kovara W, hej. 32, r. 59, hevpeyvîna ligel Elîxan Loran

*** Kovara W, hej. 32, r.56

# *Helbest û welatê ez jê*

Helbest; peyva herî bi raz û bi efsûn, û evçend jî dilsoj! Evçend dilsoj e; mîna pirpirîneka bask mişt hez, li dora rewnaqa sotîner perwane ye geh, geh dîwane...

Ji wî welatî me; welatê helbestên nebihîstî... Welatê ku roj di berbangê de ristik ristik helbestî, tîrêj bi tîrêjê ve bestî, bi bişirînên herî himbêzker hiltê, û bi hilatinê re deşt û çiyan, asêgeh û riyan, dil û dildaran bi hetava rûxwedawendî, zêrîn zêrîn dişo...

Ji wî welatî me; welatê destanhelbestên jibîrbûyî...

Weyê jî bihîstibe û dibe ku hûn jî nas bikin war û wargehên Girgamêş û Enkîdo'yê ku di berizîneke dijwar de rastî hev û mêrxasiyê, rastî hev û hevaltiya heta kêlîka mirinê hatin...

Ji wira me... ji wir... ji wira ku bi destê Babiliyan Dastanê Afirîneriyê hate afirandin, lê afirînerên wê niha ne bi destanên xwe, ne bi stiranên xwe, ne jî bi nivîsa ku afirandin û xetkêşên Summeriyan li ser kahfikên kîlî; Guttîyan, Hûrîyan, Aqadiyan mîna berbejneke pîroz ew himandin û bi stûyê dîrokê ve alandin û çûn, têm.

Têm; di mista min de dilê min, di nava lêvên min de hezên di stiranên gelêrî de kedirî...

Têm; di dilê min de xuşk û biratiya ku li ser xuşk û bira, li dû xuşk û bira birra birra mirî...

Peyvê çawa helbestên hêviyê afirandibe li ser erdnîgariya ku jê têm; li heman erdnîgariyê, hosteyên peyvê dara jiyanê bi qelemê mirinê tahmandin, û mirin bi mirina xwe veguheztin ekla nemirtiyê.

Nemir in ew jî: Weke peyvên nemir ên helbesta Birabozê ku yara xwe vedixwîne geşt û seyranê, û Babekî'yê ku hatina biharê hezar sal

berî niha dike zimanê bişkivîna kulîlkan, û nergizê pê bejinxembar û kofîxwar dike!

Li rexeke din ê vê bihara helbestê, hemdemê Babekî Baba Tahirê Ûryan ê ku nemirtiyê dide peyva kurdî heye; ku niha, hinek vî milkê bi peyva kurdî çandî, dixwazin bikin milkekî talan û wêrankirî!

Talan û wêran bûbe jî milkê wan, ew hê jî evînê şîr didin bi stêlmên hêviyê, da bi ser piya bixin azadiya ku roj û şev li hêviyê; li çiyayên her devî Xec, her lat Siyabend: li Herekol, li Gebar û Cûdiyê Miradan... ku her navek çarîneke Uryan dixe bîra min:

*Hûmayûn im serê çiyê weten e*
*Gerdûnê seyr dikim herder çemen e*
*Ne mal heye ne welat û ne saman*
*Ku ez bimrim per û baskêm kefen e*[1]...

Wan; evçend helbestî ji jiyan û jiyînê hez kirin, evçend jê hez kirin, di 16 saliya xwe de mîna Cegerxwînê şêx û derwêşê helbestê guldesteyekê pêşkêşî dildara xwe ya nemir Kurdistana xwe bike; wan jî wisa eşkere û bêtalde, di binê tava hîvê de an jî ronîvro, enî çik li xwe ewle; xewnên xwe yên herî gewrik, dahatuya xwe ya herî bi rewnaq û temenên xwe yên herî rexl rexl rîhanî, bi newaya herî dengvedêr, kirin destan-helbesteke bihîstî lê nenivîsandî, û... gotin!

Gotin... û her gotin weke çavşînkekê bi pêşenîka çiyayekî vekirin û çûn.

Ew herin jî, her peyva ku bi dû tolhildana wan ket û ji mêrxasiya wan gon xwar û bû helwesthelbest; xwe di malzaroka azadiya siberojê de bi hêz û heza lorîka dayikekê meyand û xwe li çiyayên helbesta wan nenivîsandî, qewimand!

Ez ji wî welatî me... ji wî welatê ku çiyayên wê helbestên evînên bêmirad dinehwirînin û digorînin di ber xwe de.

Li wî welatî bi temtêla dayikeke kitan di soringiya xwînê de mayî, bi helbestekê be jî min xwest destanhelbestekê zêde bikim li dû nemirtiya giyanên eyloyî...

---

1 Baba Tahirê Uryan, Du Beytî, Sabah Kara, Wş. Nûbihar.

Li wî welatî her tiştê min; axa min, navê gundê min, şopên zaroktiya min a bêguneh û sava jî ji min stendin... Bi vê stendinê re xwestin min bêziman û giyan, bêjiyan û uryan bihêlin! Û wan, piştî ku her tiştê min stendin ji min, zimanê xwe dane min!

Ew ziman zimanekî ku ne tenê xerîbê min; ne pîra min pê diaxivî, ne diya min jê fam dikir, ne jî xuşka min ew nas dikir bû! Ew, zimanekî din bû; nedişibiya zimanê stiranên min û zimanê çîrokên ku pîra min her êvar ji min re digot, û ez di xew ve dibirim.

Min ew ziman li dibîstaneke ku paçeke sor di serê dîrekekî de bû, nas kir.

Wê rojê wî zimanî zimanê min li min qedexe kir, û xwest hemû çîrokên xwe jibîr bikim, hemû stiranên xwe nema bilêvînim...

Min nedikarî; wekî hemû zarokên ku nedikarîn têhna hembêza diya xwe ji bîr bikin, min nedikarî sirûdên ku bi min dabûn jiberkirin li tevî stiranên diya xwe bikim û bibêjim.

Ji lew, piştî 16 salên xitm ên di bişaftgehên bi al û sirûd de, di rojeke ku ew ziman bû serpozka postaleke reş û bi hiçka li hestiyê birçî yê piyê bavê min ket; diya min xwe dexîlî xwedîyê potînên reş kiribû, ku bi hurmizkan, bi pehînan li bavê min nedin...

Lê, xwediyê potînên reş guh nedabûn zimanê diya min û bi potînên reş û zimanê reş bavê min dabûn ber dahf û dijunan...

Wê gavê, diya min destê xwe î mîna axa xwe tîştîşî berû-Xwedê ve kiribû û nifirên herî dojehî di xwediyên potînên reş werkiribû:

Rebê min bela we bide!.. Biqeşitin... biqeşitin! zimanê xwe jî bi xwe re bibin û herin!..

Biçûna jî ji ber deriyê diya min ji ser axa wê; zimanê xwe hiştibûn di devê milyon milyon zarokên mîna min de...

Wê kêlîkê bi kerbeke xwedîkuj min destê xwe avêtibû devê xwe, û min zimanê wan kişandibû ji şikefta devê xwe... Her ku min dikişand û derdixist, ew dirêj dibû. Her ku min dikişand wî xwe li bedena min dialand... Dîna ku min dît; ne di şikefta devê min de bi tenê: di hizra min de, têramîn û hestên min de; di awirên çavên min de xuya kir zimanê ku min dikişand û min dixwest ji devê xwe derbixim...

Rojekê di rêvitiyeke ku ez biliyê kişandina zimanê di devê xwe de bûm, rihspîyekî xwîna di devê min de dît û gote min, 'kurê min çawa ku xwîn bi xwînê nayê şûstin, tu vî zimanî dikarî bi şîrînîya zimanê xwe derbixî ji devê xwe'!

Wê rojê min bi ya wî kalemêrî kir û min xwe di şîrîniya zimanê xwe werkir:

Paşê min fam kir, xwe têwerkirina di zimanê xwe de biserxwebûna kesayeta min û giya min î li ber wendabûnê ye!

Bindest bûma jî li ser xaka ku herkesê li serê bindest; bi zimanê xwe min berê xwe da azadiya ku di berbangekê de wekî roja ku herkes li hêviya hilatina wê ye.

# *Ez mecbûr im / Dinivîsim*

Di helbestekê de, 'Min li Quîmper'ê pazdeh salên bihurî ji nû ve dîtin, lê li hêsrên çavên xwe rast nehatim' dibêje, Maks Jacop.

Jacop'ê ji dê û bavekî Cihû, sala 1876 ê li Frensa li herêma Brîtanya li Qûîmper'ê têt dinyayê. Di xortaniya xwe de dil dide stî Pefeîpfer'ê û ev dildarî heta dawiya temenê wî bidome jî, ji Yaqop pê ve keseke din navê rastîn yê vê hurmetê nizane...

Nêzedostê Pîcasso Yaqop di sala 1903ê de bi Apollînaîre, Andrê Bîll û Andrê Salom re dolaba hevaltiyê digerîne.Wan wextan Yaqop li Parîs'ê li sikaka Ravîgnan li xaniyê jimara derî 7, nişteçî ye. Jaqop bêwestan û bê bêhnvedan helbestan dinivîse, lê van helbestan ne çap dike ne jî diweşîne; taxe taxe di baxoleke biçûk de wan tomar dike...

Yaqop'ê ku helbestên xwe di 'baxola biçûk de dikesidîne' ji hêlekê de wêneyan jî çêdike.

Di rojeke Hezîrana 1941 de Maks li bajarê Montargîs'ê li mala dostekî xwe rastî xortekî xwendekarê tip'ê têt. Bavê xortê cuwan nivîskarê 'Le Cornetê a Dês' vexwendiye xwarine. Di kêliya ku xwarin têt xwarin û sohbet germ dibe de J.E.'yê ciwan vê pirsê aresteyî şair dike: 'Çi ye helbesta lîrik?'

Jaqob pirsa J.E. nabersivîne; bi dilovanî dibêje, 'Li pêş dê û bavan meriv qala helbestê nake!'

Lê piştî ku vedigere Saînt-Benoît'ê pirsa xwendekarê tip'ê dike ku Jaqop berê xwe bide dikanekê û defterekê bikire û bi lez li ser berga pembî ya defterê vêya binivîse: 'Ev defter deftera J.E.'ye'. Jaqop bi heman lezê rûpelên deftera xêzçarkoşe dike diraxeya 'ceribandinên estetîkî'. Piştî derengiya bi qasî du sê hefteyan –ji ber imtîhanên

zankoyê– xwendakarê ciwan J.E. spasiyên xwe pêşkêşî nivîskarê vê diyariya bêhempa dike, û jê dixwaze ku navekî li hestan/dilînan bike.

5ê Temmûza 1941ê Maks Jaqop wisa dinivîse: 'Ez nizanim bê pendên ku min li J.E. kirine çiqasî hêja ne. Ya ku zanim; min ew şîret ji dil kirin. Dibe ku bi kêrî hinekên din jî werin. Daxwaza min jî jixwe ew e...'

Jaqop ji wê dîrokê piştî 13 rojan vê dinivîse: 'Şîretên min î li J.E. weşanxaneya Manoll dixwaze çap bike. Min bê dilî xwe qebûl kir, û qet jî kêfa min nehat! Ya rast, pend/şîret, bo mirovên dilsoz û narîn tiştine ji rêzê û basît, bo mirovên basît û ji rêzê jî tiştine bi çiv û çivanok in!'

Min ji J.E. nameyek stend. Ji min dipirse, 'Hest çi ne?' Dixwaze jê re rave bikim. Ev kurik ji çavdêriyan pê ve bi tiştekî din nizane. Min jê re got, 'pênasekirina hestan nabe; hebe hebe meriv dikare wan bi peyvên weke evînê, kerbê, êşê, fihêtê, welatparêzî'yê bi nav bike...'

Berhema Maks Jaqop' Şîretên Li Şa'irekî Cuwan' bi vê hevokê destpê dike:

Ez ê dibîstaneke dinyaya hundirîn damezrînim û ez ê li ser deriyê wê weha binivîsim:

Dibîstana Huner!*

*Kî ji me ji deriyê Dibistana Huner ket hundir?*
*Kê ji me karî dinyaya xwe ya hundirîn derxe der?*
*Ez şa'irek im, herûwer, kek Zekî mecbûr im, dinivîsim!*

* Şîretên Li Şa'irekî Cuwan, Maks Jaqop, Wş. Nîsan, 1997, wergêr Selah Bîrsel.

# *Ez mecbûr im / Xweda jî nivîskar e*

Em pirsa xoşewîst Zekî Ozmen, 'Ma Hûn Mecbûr in Helbestan Binivîsin?' bi bîr bînin û bi 'tembiyên' Maks Jaqop yên 'Li Şa'irekî Cuwan'* kirî, bidomînin:

'Dinyaya hundirîn divê ji dinyaya der veqete; rikeberiya aqil ya bi dinyaya der re ye dinyaya hindurîn. Ferîşteyin wê dinyayê çê ne, hinin ne çê!.. Ji cinan re em ê çi bibêjin? Her çi be, dengê helbestê ne dengê Xweda ye! Mirovên jîr jî bi destê Xweda xuliqî ne, lê belê ne Xweda ne. Ji ber hindê, hînî veqetandina dengên xirab yên ku peroşê/bestê (esîn) pêk tînin bibin, û hewl bidin ku Xweda bibe serwerê/serdestê (egemen) vebestyariya we. Pêşî xwe ji bo Xweda amade bikin, lewre fona herî baş ya wêneyê ev e: Pêşî Xweda bibînin...'

Çima Xweda?

Di felsefeya Tessawûfê de jî her tişt,bi taybetî evîn, yar, dildar... qetek ji spehîtî û bedewî û bêqusuriya Xweda ye. Li tevî şa'irên ereb û faris, yên kurd Mala jî, Herîrî jî, Xanî jî dane ser vê rêyê peydakirin û bidestxistina bedewîtiyê.

Jaqop'ê bavcihû –bi dû re ji hêla keşeyekî ve tê waftîzkirin/helalkirin û derbesî Îsewîtiyê dibe– di pirsa 'di helbestê de estekîk/bedewkariyê de çima dixwaze berê şa'irê ciwan ber bi Xweda ve bike? Di baweriya Îsewîtiyê de Xweda, mîna fikirkariya tessewûfê remza delaliyê, hezê û xweşbîniyê ye, ji ber ku...

Şa'iran, gelo? lê pêximberan bi ya Jaqop kiriye.

Tikaya Mûsa li Tûr î Sîna ji Xweda kirî, ma ne kiriye ku wesfeke din li wesfên Xweda zêde bibe: Nivîskarî?

---

* Maks Jaqop.

Rîwayet têt zanîn, û em dizanin ku kitêbên pîroz jî mît û rîwayet, qewimîn û serpêhatiyên di wextekê de bûyî, mîna Tofana Nûh, zayîn û jidayikbûna Îsa... kirine palpişta 'ragihandinên' xwe!

Li vir em bi coş hembêz bikin, an bi 'şik' nêzî bûyerê bibin, tiştek nayê guhertin: Musa li Tûr î Sîna bi Xweda re kelimiye, piştî deh tembî/pend/şîretên ku dê bibe binkeyê dabînkeriya jiyaneke aram a civakî di nava qewmê li dû de, Mûsa di dilê xwe de vê dibihurîne: 'Xwezî niha ev peyv yek bi yek bihatana nivîsîn!'

Wekî ku têt zanîn, Yezdan gelek caran bi daxwazên qasidên xwe ve rabûye.Wê carê jî wisa dibe: Xweda her deh deq/xalan li ser du ferşan dinivîse,û Mûsa ji Tur î Sîna, 'ahda kevn di bin çengan de wedigere nava qewmê xwe, qewmê ku Xweda wahdê 'axa ku dê li ser bijî û pirr bibe' dayiyê!

Kurdan dev ji 16 herêmên bihuştîn* berdabin jî, Cihû ji wê rojê de xewna 'axa wahdkirî' dibînin û ji dû vê 'xeyala gewre û rengîn' venagerin. Her roj li ber 'hîmê giryanê' ji derwêşekî j' derwêşên Dergeha Şêxê Xiznewî bêhtir bi sûr û cizbê ketî, serê xwe bi vir ve bi wir ve dihejînin, û pê re 'ahdê' dixwînin li dahatû û ayîndeya xwe.

Ku em bala xwe bidinê, nameyên kevn û ji berhemên kilasîk Mesnewî, –kek Ramazan Alan Mesnewiyê weke bingeha romana rojava dibîne, bi ya min ji erdê heta bigihe ezman mafdar e– weke Mem û Zînê bi 'namê Ellah' dest pê dikin:

*Sernameê name namê Ellah*
*Bê namê wî netemam e,wellal*
*Ey metleê hisnê işqebazî*
*Mehbûbê heqîqî-yû mecazî*
*Namê te ye lewhê nameya işq*
*İsmê te ye nexşê xameya işq*
*Bê nexşê te nexşê xame xam e*
*Bê namê te name ne temam e***
*...*

---

* Kovara War, Jmr. 3, 1998 (Zend Avesta, Vendîdad, Fargard 1. Wergera Nergiza Torî).

** Mem û Zîn, E. Xanî.

Hêzdarî û pîrozweriya ‘peyvê’ piştî demeke dirêj, bi peydakirina/ bi biservebûna xetê/nivîsê re herçend bi destê mirov veguhere ‘nexşê xame’yî jî, pirtûkên pîroz vê jîritî û jêhatîbûnê bi bexşînkariya Xweda ve ditêkilînin û dibêjin, ‘Me hûn qewm qewm,eşîr eşîr, bavik bavik afirandin, û me her yek ji we zimanek xiste dev!..’*

Wî xistibe devê me, me peyda kiribe; bi dîtina ‘xetê’ re mirovahiyê bi qahfikên kîlî, bi ferş û berdereşan, bi qeteçerm û papûrûsê kariye serencama xwe vebêje, şiyaye mîrateya xwe ya hevbeş bêyî winda bibe, ji demên dêrîn radestî îro û nivşê nû bike.

Ev kirin, mixabin di nava kurdan de bi navbir e, perçebûyî û qeto qeto ye. Yek ji sedeman bêpahrbûna ji ‘mîrateya hevbeş’: yek ax, yek ziman, yek vîn, yek mebest, yek bawerî, yek xewn... ew e ku kurdan dev ji ayîna xwe ya hevbeş berdaye, ya duyemîn jî lêxwedîderneketin û bikarneanîna yek ‘xet’ê, yanî alfabeyekê ye.

Ayîn –di wateya îroyîn de hûn lihevkombûnê fam bikin– ji destpêka bêsalix operaya peyvê, lerze-bizava laş, xusûlkirina ruh, terkkirina can, vejandin û têrkirina hestan û tijekirin û mîştkirina bîrê ye. Li vir hemû peyv bo wî/wê –em ê ‘wê’ jî bikin şirîkê ‘wî’, da jinên dilînkuh xwe neenirînin– yê ku ‘hawar û hêvî’ ye. Bi dû re dû re, şirîkek dibe şirîkê yê ku ‘hawar û hêvî’ jê têt kirin: qeran, siltan, tacîdar... ango yê dest bi şûr!

Ya balkêştirîn ew e ku mîtosên ji duhiya dêrîn de bi mirovahiya îroyîn mayî jî, berhemên ji berberî, berizîn, pevçûn û girr û qayîşa navxweyî ya xwedawendan pêk tên in. Ev yek çi di destanên Homeros İlyada û Odysseîa de, çi di mîtolojiya Babîliyan ‘Dastana Afirînê’ de eyan beyan e.

Ji van destanan Destana Gilgamiş/Girgamêş, li gel şerê bi Enkîdû re du babetên din tên vegotin: ‘Tofana Nûh’ û ‘Geyayê Nemirtiyê’...

Gilgamêş’ê nîv-xweda ‘geyayê heyata ebedî’ bi destnexistibe jî destana hezar hezar salî destê ‘nemirtiya hunerî’ dirêjî me dike.

Xweda nemir e!

Yê ku tu biafirînî, tu nikarî zû bi zû bikujî?

* Qur’an.

Nemirtî hebû ye ku kurd di metolikinan de bahsa mirovên ku hezar salî jîyane, dikin. Bavê me Adem (eleyhî selam) yek ji wan e!

Dênê xwe bidinê;yek ji birînên mirov yê duhî û îroyîn e nemirtî!

Evdê serreş î temen bi tixûb, di lêgerînên bi servebûna serencama nemirtiyê de bi nivîsê destê xwe dirêjî taybetiyeke Xwedayî; nemirtiyê kiriye...

Na xwe, nivîs ji roja roj de pîroz e, û nivîskarî ji roja roj de karekî pîrozwer e!

Jixwe hinek di despêka nivîskarî/şa'irtiya xwe de; weke Nerûda, mîna Serwantes 'nemirtî' bi dest xistine, hinin jî pîştî 300 salên xitm, weke Ehmedê Xanî, gihiştine asta nemirtiyê!

Ku em vegerin ser tembiyên Jaqop... Marcel Bêalu di beşeke nivîsa xwe ya li ser xebata Jaqop vê dibêje: ...Xanima ku li kevalê/tabloya li pêşberî xwe dinere,û dibêje, 'pirr bûhaye', bersiva wênasazê gewre (Pîcasso) çi qasî li bejna Maks tê:

Erê keda çaryek saetê ye, lê tecrûbeya şêst salî ye!

Niha, ne ji mafê min e ku ji çi kesî/ê re bibêjim nenivîse; bi taybetî helbestê!

Lê werin bibînin;bi pirsa xoşewîst Zekî Ozmen 'Ma Hûn Mecbûr in Helbestan Binivîsin?' ve girêdayî; nivîskariya kurdan 'bi çavpêketinê' dest pê dike. Yanî bi gotineke eşkeretir, her 'nivîskar' bi vê pirsa ku ji xwe dike dadikeve qada nivîsê: 'Ma çiyê min kêmî yê filankes e?'

Ev pirsa ku helbestkar/nivîskar bêhiska ji xwe dike, destpêka 'biçûkdîtin' û pê re 'biçûkkirina' nivîskariyê ye...'

Na xwe?

Na xwe, her nivîskar divê ji bîr neke ku Xweda jî nivîskar e!..

# *Ez mecbûr im / Kerem bikin...*

Piştî ku me kirasê pîrozwer yê 'nivîskariyê' li Xweda kir, pêdivî ye ku em 'cawê mayî': destanên dêrîn, pirtukên pîroz, mîrateya hevpişk ya gelêrî û neteweyî; dengbêjiya peyv-efsûn, bûyervebêjiya ciwakî: stiran, kilam, çîrok û çîvanokan... û berhemên nivîskî yên temen hezar sale... deynin ser 'dezgehê' xwe, û jê bo bejn û bala 'nivîskariya xwe' çend gazan bidin ber devê meqesê peyvê...

Peyv tenê, tenê peyv dikare zeman 'bibirre'. Ji ber ku her tişt ji destpêka bêsalix tê û berê xwe dide dahatuya bêdawî!

Mîna şikestin û têkçûnên artêşên xişr-giran di qada şerên bûyî de, şerê peyvê 'efra' bi zeman re ye. Peyva ku di neqebên herî xeternak û teng yên zeman de nelikume, asê nebe, wekî hespeke bêrişm, beza û rehwan li xwe bide, dikare biqewize di ser sînorê zemanê bi destê mirov sînorkirî re!

Na xwe peyv û zeman du kujer in; miqîm li kuştina hev digerin.

Şerê zeman û peyvê, şerê bêwestan û bêrawestan di heman kêlîkê de destpê dike: kêlîka ku peyv diniqute dil û di dil de dimeyê!

Peyv jî mîna şîrê li bendî heyvên, dikare biquse!

Yê ku peyvê diqusîne, zeman e. Zemanê 'qusînkar' di heman demê de 'geliyê peyvên bi bedewiyê meyandî' ye! Yanî, yê ku peyvê diqusîne jî zeman e, yê ku dihimmîne jî... Ev pêkarîn ango ev serwerî ji hêza peyvê tê!

Vê gotina pêşiyan em nikarin nebihîzin: 'Peyva nexweş ji şûr tûjtir e!'

Ya a xweş?

Jixwe em li ya xweş, ya şa û dilşaker, ya ku bi xweşiya xwe dikare bi ruhê me re hişê me, bîra me, hest û dilînên me bizelilîne digerin!

Ev lêgerîn serencameke dûdirêj e. Lê ku meriv dest bi lêgerînê neke, biservebûn ne hêsan e,ku Maks Jaqob radibe, dibêje: Ji nava helbestên Apollînaîre li yên dilşa bigerin. Hûn ê li du sê heban rast bên an neyên! Helbesta dilşa helbesta bi rêkûpêk, bi pergal, û herikbar e... pertew pertew diçurise. Gundiyê herî kawik gava ku bibihîze, dibêje 'çi qasî xweş e', nabêje 'min çi tişt jê fêm nekir'!

'Min çi tişt fêm nekir!' Em bi vê peyvê diberizin helbestkarê ku me necoşîne.

Ji peyvên erzşikên ya herî giran ev peyv e!'*

Em jê fahm bikin nekin, peyva baş mayînde ye.

Peyva baş e ya ku berhema baş tîne pê ye...

Newala berhemên jibîrbûyî hima hima berxweş e. Nexasim newala berhemên kurdî! Bi gotina hêja Cîhan Roj 'sergo'!

Li şûna sergo; em çêj û lodên berhemên bedewîyê girstir û xişintir û bilindtir bikin dê ne paktir be? Li şûnwarê Biraboz, Hamedanî, Xanî, Nalî... li şûwarê ku peyva mayî misk û embera spehîtî û delaliyê bi ser me de difûrîne, em rabin 'ting' û 'sergoyan' bilind bikin... bi min em ê neheqiya herî mezin li xwe, li yên berî xwe, li yên li dû xwe bikin...

Yên ku vî mafî di xwe de bibînin, bila kerem bikin.

* Ji 'Şîretên Li Şa'irekî Ciwan' 19.07.2007, Arjen Arî.

# *Mahr*

Felestîn... welatê êş û azarê...

Welatê ku kelareşk û teyrên goştxwir li ser axa wê êrîşî cendekê miriyan dikin...

Welatê ku axa wê xwînê vedixwe venaxwe dêm e, têhniya xwîna şa'ir e!

Ji vê xaka ku ji dêvla bîhna çîçekan ya bahrûdê difûre, û sîng û berên wê şîrê sor diherikîne destên hezkiriyên xwe; Mahmûd Derwîş ewçend jê hez dike; di helbesteke xwe de weha dibêje:

Ku ti tişt nemîne bo te bihimînim, diranên min bes in!

Her şa'irî mahra xwe bi axa xwe re birriye. Mahreke fillehkî ye ev mahr. Piştî ku ji axekê hez kir û mahr birî, ne mimkun e ku telaqê wê têxe dest: Li ser dijî, li ser digirî, pê re dikene, pê re dibe hevpêra şîna wê. Û tu hêz nikare zû be zû destê şa'ir ji yê axê derxe!

Lê... ku hat û dest ji dest bû, dilê xwe di nava destên axê de dihêle û diçe! Diçe mîna Nazim*... Diçe mîna Tholsky...**

Li ser axa xwe jî ji axê hez kirine, li koçberiyê jî; zarokên ku mezin nebûn: Cegerxwîn, Sebrî Botanî, Peşêw, Barnas, Ronga, Huseynî... Li dûr, ji dûr ve jî nahtorên sîng û berên xaka xwe ne... Dilnarîn bin jî, ku nêzî hêlîna evîna wan bibe keftarek, çeqelek an koremarek... dibin eyloyek; herdu destên wan dibin du pençe,û bi 'qijjîn' xwe tê werkirine!

Li dûr an li ser, evçend rêzdar in li hember; herkesî wedixwînin rêzgirtinê. Yek ji wan radibe dibêje, 'rojekê... ku hin biçin welatê min, nebe nebe bê tacegul biçin.'***

---

* Nâzim Hîkmet, şa'irê tirk.

** Şa'irê ku ji ber zilma naziyan revî û li Swêdê mir.

*** Birakujî, E. Peşêw, Wş. Avesta.

Ev vexwendin ne ji bo biyaniyan bi tenê ye; di kêlîkên xeternak de ku bibîne 'mahr' dikeve xetereyê, bêyî ku çi xemê bixwe, bi dilêriyeke pêşmergeyane, berê tivinga peyvê dide desthelata xwe yî mahrheremolîker:

*Cotek pêlavên reş li min in*
*Bi pîne, erzan, gemarî, sivik û heram*
*Hezar car ev pî û ew pî bi hev guherîne*
*Çi cara ez li wan dinêrim*
*Ne bi destê min e*
*Serê pêlavê*
*Pozê hin serokên kurd tîne ber çavên min!**

Ji ber vê 'bekçîtiya namûsê', axa şa'ir, heta gelê ku dengê şa'ir wek dengê xwe dibîne, carinan bizava ku di nav de û pê re tevdigere li şa'ir dibin mengene: Mînaka 'kurê şoreşê' Mayokovskî'yê peyvgurz di bîra helbestkariya dinyayê de ye.

Çiqasî layangir be jî, bo dahatûya 'mahrê'; hinekan, bizavinan, serokinan... ji xwe re bike 'pût û senem' jî, di encamê de mineta Xweda jî weke barekî dibîne:

*Ger di heşrêde nebînim ez dilberê*
*Cenetê pê çi bikim,pê werkim axa ser rê***

Şa'irê ku 'ceneta ala' ji bo dilberê red dike, çavên xwe hew berdide dilber-axa xwe.

Erê; ji 'xaçparêzekî' bêtir 'axparêz' e, lê ew çav bernade çengek axa milkê şa'irekî din. Ji vê çavtêriyê şa'irê 'zikbirçî' radibe dibêje:

*Min ji nav baxê cîhanê bax û bostanim bes e!****

Çarenûsa 'birçîtiya' şa'ir jî mîna 'mahra' wî ya 'fillehkî'ya bi axê re, çarenûseke hevbeş e.

Ev hevbeşî di roja îroyîn de bi destek û delîve-pêşkeriya desthelatê, –çi li hûndir çi li der,wek numûne navin hene ku serperiştê sazî û dezgehina ne û li vir ez ê navê wan nelêvînim– birçîtiya hinan bike têrî jî; çarenûs ji wextê Xanî'yê nemir ê ku gotiye 'dîn çû û bi dest me neket dînar' hê jî çareya bêçare ya şa'ir û nivîskarên kurd ên li 'çar kenar' in.

* Ji helbesteke E. Peşêw.

** Ji E. Xanî.

*** Ji Şi'ireke Cegerxwîn.

Ji vê rastiya rastteqînane ye; serkêşê tevgera Tîrêj hemdemê min Barnas, bi ya xwe re dibe 'mikurvanê' rewşa heyî: ... 'şa'irî û nivîskariya min ya nan jê xwarinê nîne, ya ji bona kêf û meraqê ye. Jiyana min a aborî li ser karê min î memûriyetiyê ye ku tu têkiliya wî bi kurdîtî û bi nivîskariyê re tune ye.'*

Gelo, sedemên berdewamî û mayîndetiya vê 'çarenûsê' çi ne?

Bi qasî ku ev babet dikare bibe mijara nivîseke din, wek destnîşankirin ango 'berstûkvekirinê' bersiva min dê ev be: Kengî gelê kurd; gelê ku 'hinek û gellek' wî weke gelê xwe dibînin û dixwazin bikin 'alavê' mayîndekirina desthelata xwe ya 'pirrdest û pirrmil', mîna xelkê Şîlî bibin xwîner û xwendayê berhemên bi zimanê xwe, wê gavê Cegerxwînên îroyîn; Rênas Jiyan, Îrfan Amîda, Kawa Nemir, Lal Laleş, Osmanê Memed, Ehmed Ronîar, Fatma Savcî... dê karibin qesrên havînî li qeraxa Gola Wanê, yên zivistanî jî li germyanên Berîka Mêrdînê, berîka ku 'pozê Qerejdaxa şewitî bi ser de xuz e', ava bikin...

Çima dê nekin?

Bi qasî ku kurê karkerekî li ser şiva trênê dixebite ye, Nerûda, bi hatina/telîfa pirtûkên xwe xwediyê qesrên havînî û zivistanî ye!

Peyveke pêşiyan e, rast an derew, ji wan bi me maye û ez jî li vir neqil dikim. Gotine,' Ku axe/mîr bibine ker, li wan siwar bibin, lê lingên xwe li wan mehejînin'.

Yê ku rabû û bi lingê xwe re destê xwe jî hejand di ser serê şair re!

Çarenûs û aqûbeta Xanemîrên Botan kêm zêde her kes dizane. Kêm zêde, her kes pê hesiyaye ku Cegerxwîn taliya e'mrê xwe berê xwe da Swêdê. Û kêm zêde her kes pê hesiya ye Sebrî Botanî li xerîbiyê çavên xwe dane ser hev...

Êêê baş e... hûn bi Xwedayê min û xwe kin, qewmekî ku nikaribe şa'irê xwe xwedî bike, meşrûiyeta nivîskar/helbestkar/hunermend di nava lep û lêvên bizavinan de be, ew qewm, ew gel, ew ax... azadiyê heq dike?!

*08/09/2007, Amed*

* Ji jînenîgariya Rojen Barnas ya ku ji min re bo 'Bakûrê Helbestê/Antolojiya Helbesta Bakûr' hinartiye.

# *'Sefartî'*

Ez jî di nêv de, hindek kesan dizanî ku Melayê Cizîrî Dîwana xwe diyarî Şah İsmaîlê Sefewî kiriye. Heta ku bi ser vê agahiyê vebûm, min xwelîserî; malika 'Ger lu'luyê mensûrî ji nezmê tu dixwazî/ Wer şiîrê Mela bîn,te bi Şîrazî çi hacet?[1] wekî navtêdaneke Mela, bangeke li Kurdan dinîrxand!

Lê, dema ku min nivîsa seyda Abdullah Varli[2] xwend, ez ji xewa xwexapandinê hilçeniyam,û min ev ji xwe pirsî: Baş e; di Dîwana Mela ya ku diyarî Şahê Sefewî dike de, li tevî xezel, qesîde, çarîn û pesinnameya ku 'Tebrîz û Kurdistan'weke xalîçeyekê li ber pêyên Şah radixe û sed şahê wek'Şahê Xoresanê' dike 'xulam' û 'ferwarê 'wî, malika li jor jî hebû?

Vekolînerên giranbiha yên mîna Ebdullah Varli, Osman Resûlan, M. Xalid Sadinî, Celaleddîn Yoyler ...û hêjayên din ên ku wekî mijar şi'ira klasîk hilbijartine, vê bûyerê zelal bikin; asta hunerî, ciwankariya şi'irê, hunerbaziya helbestî ya Mela ...dê misqalekê ji xwe kêm neke; lê bi yên mina min re dilê gelek kesan têkeve cih: aya ji çi sedemê, Mela ji Cizîra Botan Dîwana xwe rêdike, 'datîne' ber destê text û taca Şahê Eyran?

Baş dizanim ku şa'irên klasîk di serdema xwe de zana ne, alim in; bi pirayî nêzî pergalê, şêwirmend û şareza ne, di nava refê gizîr û wezîr û maqûlan de xwedî xwe û ciheke taybet in. Ev taybetmendî bo dengbêjan jî wisa bûye.

Minaka Evdalê Zeynikê weke neynikê li 'ortê' ye!

Dengbêjên ku îro gellek kes wan bi 'dîrok-nivîsînê', bi 'bîra civakî',

1 Dîwana Mela.

2 Kovara Nûbihar, Jm. 62.

bi dû dayikan de 'bavikên ziman', 'xwediyê kelepora berdest...' bi nav dikin, gelo zanin ku mîna 'dengbêjê odeya Mehmet Paşayê Surmelî, Evdal'ên mayî jî dengbêjê mîrekî an yê axayekî bûn?

Weke pirs: Ev rastiya civakî bi demê re çilo/ çawa/çima/li kû/kengî/ bi çi awayî ...xwe spart rastiya îroyîn? li hêviya bersivê ye. Bersiva vê pirsê ku ji layî pisporên Dîroka Wêjeyê ve bêt dayîn, bi baweriya min rewşa îroyîn ya helbest û helbestkariyê, ya huner û hunermendiyê, ya nivîs û nivîskariyê dê di nava kevalekê de bêt çarçovekirin!

Û, ne min; pêşiyan gotine 'hinek dikin hinek dixwin!'

Kîjan hinek? Hinekên wek Osman Sebrî, wek Qedrî Can... wek Koyî, Mayî, Nalbend... wek Cegerxwîn, wek Binemala Bedirxani'yan...

Kîjan hinek? Hinekên wekî Mela, Herîrî ...û Xanî'yê ku gotiye:

...
*Qelbê me nekir qebûlê hîle*
*Qet bo xerezê nebû wesîle*
*Dîn çû ,û ne ket bi dest me dînar*
*Paşê ji neçarî bûyne seffar*
*Sifrê xweyê xef me eşkere kir*
*Qirtasiyebû me li lê dua kir*
...[3]

*Kurmancî ye, sifr e bêguman e*
*Zêr nîne bibên, 'sipîde mane'!*

Li gorî agahî û dazanîna li ber dest, Xanî di seraya ku îro navê wê Seraya Îshak Paşa ye de, dest bi 'seffartiya' vî zimanî dike. Dike... û ne li bendî tiştekî ye! Dike...û dibêje 'ez û Xweda, hûn û Xweda!' Dike; ku xwediyê 'sifr' jê re bibêje 'saet xweş, te xweş spî kiriye'... dê nede bi terş û ferş, talan û terş û bi mal û mewdanê diyariya şah û siltanan!..

Ez 'feqîrhal' di gel azarkêşiya ku kêşane, sê mirovên ku di jiyana xwe de têr xwarine, têr wexwarine, têr geriyane; xwedî qesr û qonaxên havînî û zivistanî, di qesrên xwe de xwedî dergevan û qerwaş bûne, dinasim:

3 Mem û Zîn, E. Xanî, Wş. Hasat, Rp. 64.

Yek Pablo Nerûda'yê Şîlîyî ye, yê din Nazim Hîkmet'ê Komûnist e.

Lê yê sêyemîn?!

Zanim; hûn li bendî ne ku navê sêyemîn ji devê min bipeke: Ew jî Kurdek e.

Û ez soz didim ku rojekê –ne dûr; di demek nêz de– weke mijareke cuda, vê babetê jî di bin sernavê 'Hinek Dikin, Hinek Dixwin' de pêşkêşî we bikim...

Dîsa jî hey ku peyv hatiye ser peyvê, ka ji we bipirsim:

Hûn dizanin ku Mîr Celadet di bîra ku dikola de werbû û navê vê bîrê bû 'Bîra Qederê'?

Qedera Mîr di bîrê de mirin be,ya Hejar derî û dertûl in. Ku hûn bi 'hejartiya demekê' ya Hejar nizanibin û bixwazin hînî 'hejartiya' Hejar' bibin, berhema wî ya bi navê 'Çeşnî Micewer' bixwînin...

A ku niha li vir ez ê venivîsim, 'kurtepistiyeke' bi rastî ye.

Li gorî vê kurtepistiyê; Şêx Riza Telebanî ji Arthur Rimbaud bêtir –Rimbaud li Marsilyayê lingekî xwe wenda dike û di nexweşxaneyê de dimre[4]– dide dû bidestxistina malê dinyayê, ew tiştê ku li ber dilê her serreşî, xwezî û şîrîn!

Şêxê di hozanê de hoste û hicîwkar ne xeşîm e; zane ku şa'irekî feqîr û haltenik di nava xelkê de ne bi buhayê du 'qiruşekî' ye!

Û wî jî mîna 'kula bi ser kulê' de, ev gotina pêşiyan bihistiye: Malê dinyayê qiloçê mêra ye'!

Baş e; ku 'qiloçê mêran' be ha ji we re çar rist 'poşş':

*Çi ye; qiloçê mêra ye!*
*Kî ji dê bi qiloç zaye?*
*Hestîkojî pahra sa ye,*
*Solalêsî bi kê dikevê?*[*]

Bi 'hestîkojiya' seyî her kes dizane, lê 'solalêsiyê' çi kes naîne ser xwe.

Jixwe ne min; yên berî min hunermend û roşenbîr ji hev 'tîş'kirine:

4 Arthur Rimbaud

* A. Arî

Hunermend û roşenbîrê 'şûrkêş û pastarên pergalê', 'hunermend û roşenbîrê dij û dijberên pergalê'!

Pergal jî her kesî welê zû zû 'nahewîne' nava xwe, ku wî 'nehebîne'!

Hele hele ev pergal ku pergala Kurdan be, wey li halê 'Rimbaud'yên' kurd!

Rimbaud'ê ku Rimbaud'e di 17 saliya xwe de zend û bendan ba dide bo 'seffartiya' helbesta Firensawî, û hê bîstûsê salî ji ber ku di ber xwe de dibêje, 'dîn çû, û bi dest me neket florîn' dev ji 'seffartiyê' berdide û berê xwe dide taciriyê!

Ji derûdora xwe re jî wisa dibêje: Ez ê hemû weslên xwe bi hesin kim... û ez ê vegerim!

Vegeryan..? Rimbaud'yên me jî vegeriyan! Hem jî piştî pirr salan! Hem jî bi qesr û qonax û qerwaş... û bi xişrên giran!

# *Ji 56 çivîkan qertelek...*

*Çîve-çîva çivîk e*
*Çivîk lepek e.*
*Çîve-çîva çivîk e*
*Çivîk gepek e.*
*Çîve-çîva çivîk e*
*Çivîk naçe berkurka qertelekî!*

*Di 'koleksiyona 19'em... de Rênas Jiyan qertelekî weha diwesfîne:*
*...*
*...*
*ê wî, ew qertel bû*
*tenê bû*
*tev li refên çivîkan nebû*
*hezkiriyên qitikan û*
*xalê qulingan bû*
*ê wî, ew qertel bû*
*şoreşvan bû*
*mîr bû*
*û xwe li kîjan çahlên ezmên ên qelew qelibandibû*
*dîn bû*[*]
*...*
*Qertel dîn in, jixwe!*
*Û qertelî dînitî ye!*

Ku ne dîn bûya ev çend ba dijend. Ne dîn bûya evqas bilind difiriya û ji bilindahiyê tîrikî noqî nêçîra xwe dibû!

* Mexzena Xwînê, R. Jiyan, Wş. Belkî.

Li kû bifire bila bifire, qertel hêlîna xwe di xirramê herî asê de, li lutkeyên herî li jor çêdike!

Dênê xwe bidinê; li Rojhilata Navîn ji roja roj de remzên li ser hîm û hêtan, yên li ser al û direfşên şahristaniyên çûyî/wendabûyî, û yên welatên niha li ser piya mayî, sembola hêzdarî û desthelatdariya wan an şêr e, an qertel e, an jî baz e.

Niha jî; siûdiyên ûrxişn û stûstûr her havîn seydvaniyên teyrên baz dişênin ber bi çiyayên Bakûrê Kurdistanê ve, da bazên esîl bi dahfikên li ser pişta kevokan bigirin, û bi girtinê re çavên wan lixab bikin...

Çiya wargeha teyr û bazen be, çol welatê qijk/kelereşka ye.

Berî salekê di biwarê pirsgirêka Kerkûkê de li ser pirseke kirî (Kovara Nûbûn e esseh, lê niha jimara wê nayê bîra min) Serokê Herêma Kurdîstan Rêzdar Mesût Barzanî ev digot:

Em baz in, hînî çiyayên bilind bûne. Jixwe em jî naxwazin li gel 'kelereşkan'* bijîn!

Li gorî rîwayetan baz evçend esîl e, di kêlîka ku bêt girtin de derfetê bibîne naxwaze dîl bikeve; xwe dikuje.

Lê...lê bi dû hêsîrketinê de?!

Min bi çavên serê xwe dîtiye; 'qertelekî' berika dawî bo cênîka xwe hiştiye!

Min bi van guhan bihîstiye; 'qertelekî' narincok bi xwe û dujminê xwe de peqandiye!.

*Dibînin; dost jî dujmin jî dibîne.*
*Ev 'gelê' ku hinek wî dikin 'gelê' xwe jî dibîne kî çivîk e kî qertel e!*
*Qertel evçend pirr in li vî welatî li van çiyan...*
*Ku ji çivîkan bêt dê rê nedin fira 'qertelan'.*
*Ez bi xwe ji 'qerteliyê' hez dikim*
*Û dixwazim bi 'qertelan' re bifirim!*
*Pêşiyan gotine: 'her teyr bi refê xwe re difire!*

*20.06.2007, Amed*

* Cureyeke qijikê.

# *Cegerxwîn: Homerosê Erdnîgariya Kurd*

*Wezîfey xom her teblîxî kurd e*
*Le mirdû herçî dimîne nawe*

Îro li vê holê ne tenha şa'irekî ku bi helbesta xwe mohra xwe li rûpelên dîroka wêjeya kurdî ya qirnê 19'emîn daye bi bîr tînin; bi du cild 'Dîroka Kurdistan' dîroknûsekî, ferhengsazekî xwedî du cild 'Ferhenga Kurdî'; bi pirtukeke rêziman rêşanîderê zimên, bi 'Cîm û Gûlperî', û 'Reşoyê Darê' çîroknûsekî; bi berhema bi navê 'Folklora Kurdî' folklorzanekî, bi kitêba bi navê 'Jînenîgariya Min' bûyervebêjerekî rewan, ku qewimînên civakî û serpêhatiyên dem û temenekî, bi wext, bi mekan, bi nav û nîşan; carinan bi vegotineke kêlî bi kêlî, carinan jî bi navbirine bi meh û sal ... û bi deh dîwanên ku li dû xwe hiştine, şa'irekî gewre, şa'irê xwediyê şi'ira Kîme Ez' ku navê xwe daye festîvalê, yad dikin...

Digel ku wî weke remz, navê Hesarî, Seyda, Cegerxwîn li xwe kiriye, weke şagirtekî ji mafê xwe dibînim ku ez du navên din li wî bikim:

1- Homeros'ê Kurd

2- Seydayê Evîn û Birînê!

Hemû taybetmendiyên wî li layekî, Cegerxwîn bi hilbijartina zimanekî fesîh û sivik û zelal, bi her peyvê li dil û deriyê her kurdî daye.

Ji vêya, em dikarin bibêjin ku wî jî weke Seydayê xwe Xanî, xwestiye 'a'mê' bi hez û hêz û bedewiya peyvê bihesine, û a'mê, yanî tebaqeya jêr ya nezan û xizan û bindest bi sewta helbestê hişyar bike, rake ser pê!

Dema ku dibêje 'dil wegeriya ji nezma xweşlugat/hate ser nezma sê car faîlat' rê li ber me digire ku em bi çaveke rexnegirî nêzî huner û zimanê helbesta wî bibin.

Di hilbijartina ‘wezna sê car faîlat de’ evçend bi ser dikeve, yekem car, helbestên şairekî kurd hem di nava gelê a’mî’ de, hem jî di hucreyên medreseyan û tekiyayên şêxan; û pê re li dîwanên axayên ku Cegerxwîn bi tujî û tundî bi ser wan diçe de; dihên xwendin û jiberkirin...

Bi gotineke din mina ‘rabsodên’ ‘Homeros’ derwêşên helbesta Cegerxwîn, helbestê ji devan digihînin devan, û li çar rexên xaka dabeşkirî digerînin.

Dîroknivîsên Wêjeya Dinyayê bo dastanên Homeros ‘Îlyada’ û ‘Odesîa’yê vê têbiniyê lêdikin, dibêjin ‘Ne ji Rabsodan (ew kesên ku ji devê Homeros destanên wî dibihîzin û ji ber dikin) bûya dinya dê ji wan destanan bêpahr mabûya!’

Cegerxwîn’ê ku di sala 1925ê de dadikeve qada helbestê, weke ku tê zanîn di sala 1945ê de dîwana xwe ya yekem, ‘Agir û Pirûsk’ li Şamê bi alîkariya Mîr Celadet çap dike.

Ev mawe maveyek dûdirêj e. Di vê wexta raborî de wusa dixuye ku Cegerxwîn jî helbestên xwe mîna qetedastanên Îlyada’yê li malên hezkerên peyva kurdî, di şevbuhêrk û civînên dost û yaran de xwendine.

Ev yek, liv û helwesteke Homeros’ane ye.

Zimanê sivik û zelal, ristên xweşkêş û xweşserwa di demeke kurt de ‘rapsodên’ xwe peyda dike, û ew weke ‘derwêşên terîqeta Cegerxwîn’ helbestan yek bi yek ji ber dikin û di nava gel de belav dikin.

Ji derwêşên helbesta Cegerxwîn hê jî hindek kes li heyatê ne:Ji van kesan yek jê Sebriyê Xelo Sîtî ye, yek Ehmed Kurdî, yek jî Bavê Mislih e... ku ev ciwanmêr ji Cegerxwîn bêhtir helbesta Cegerxwîn jiber dizanin!

Şahidekî din yê vê ‘dengbêjiya’ Seyda, şa’irê ciwan Kawa Nemir e ku ji herêma Serhedê ye. Nemir dibêje, ‘rojekê dêya min di ber xwe de stiranek digot. Vê stiranê bala min kişand û min jê pirsî,’ ev stiran a kê ye dayê?

Bersiva dayê ev e, ‘Jê re dibêjin Cegerxwîn lawo, dengbêjek e!

‘Dengbêj’ Cegerxwîn ne bi tenê li Serhedê diqîre; hê di salên 60î

de bi vê helbesta li jêr ya bi zaravê sorî, doza qedr û siyanet û xatirê xwe yê ku îro li vê ser vê axa azad, bi al û xwedîşiyan û desthelat; li Kurdistanê dike:

*Ey welatem pût û latem pîrî xemgînî te me*
*Rencberî lawanî tû me,peykê mizgînê te me*

*Gerçî kurdit pêm delên 'bê dîn û gawir' pêm xweş e*
*Dîn û îmanim tû wî men dîn û bê dînê te me*

*Em perîşanî û zilet têk le işqê tû exum*
*Pêm delên em şat û dîn e, rast e men dînê te me*
*...*
*Tamî sebrem tamî sebr e tal û tûjî zor me xwar*
*Wa bi alem tal û tuj im çunkî şêrînê te me*
*...*
*Bes yekitî xweş divêtin da ku têk serbest bibin*
*Men be qurbanê sera û, ala rengînê te me!*

*Zilmî bêgane dibînim wa li xakî tû dibî*
*Şuhretî dawe dielêm men Cegerxwînê te me*[*]

*Belê...ew Cegerxwînê Kurd û Kurdistanê ye.*
*Û îro Kurdîstan heye.*

Kurdîstan zû an dereng mecbûr e rûmetê bide rûmetdarên xwe, û li hemû nirx û hêjayîyên xwe xwedî derkeve.

*11-29/02/2008, Hewlêr-Amed*

Têbinî: Ev nivîs qetek ji axaftina min a bo festîvala Cegerxwîn e berî pêşkêşkirina babeta 'Sedemê Kurdînivîsînê û Di Helbesta Cegerxwîn de Zaravayê Soranî' ye.

* Agir û Pirûsk.

# *Wêje û dîroka wêjeyê*[*]

Hinek bibêjin jî xwe-dubarekirin e dîrok; ne dubarekirî, lê di her serdemê de xwenûker û lixwezêdeker e dîrokek: Dîroka wêjeyê!

Dîroka wêjeya neynikeke pirr zelal e, ku meriv dikare giyanê qewmekî yê millî, jiyana wî ya millî tê de bibîne.

Ev neynik, ne çavpêketineke nihayî raberî me dike: Wêne-şanikên hemû dem û serdeman radixe ber çavan. Ji lew, meriv di vê neynika ku kes di derûdîmenên rabirdûyê re dikeviyê, û ji deriyê 'niha'yê berê xwe ber bi dergehê dahatûyê vedike de, bi hêsanî bi ser liv, tevger û hewldanên civatê yên mîrovî ve dibe, û meriv dikare bi ser bersiva pirsên wekî; 'qewmek çawakî, bi kijan çavî li jiyanê dinere; xem û kul û xeyalên wî çine, hizr û têhizirînên wî çi ne; pêjnên wî, hest û hisên wî çine?' ve be.

Ku em ji ravekirina li jorê re bibêjin 'belê'; gelo em dikarin bibêjin, 'dîroka wêjeyê, ne dîrokek çêkirî, dîrokek e zindî ye bi berhemên li ber dest ên devkî û nivîskî...'?

Herdu dîrok vê paşiyê hatibin nivîsandin jî; yek jê, yanî dîroka wêjeyê ji dîroka dîtir bêhtir xwedî binyad û asasekî tebût e.

Dîsa jî herdu; dîroka mirovî-neteweyî û dîroka wêjeyê ji du hêlên xwe ve dişibihin hev: Yek; çawa ku her qewm, bi taybetî her netewdewlet koknîjada xwe li ser kokelateke nîjadî/xwînî datîne û ava dike; dîroka wêjeyê jî bi aqûbeta 'dîroka rûdayî', rûberû ye. Du; herdu jî ji hêlên xwe yên avakariyê ve xwedî têxistin û derxistin in. Yanî lêzêdekirin û jêkêmkirin...

Evyek bi tayebetî têt kirin, da ku kes di dil û çavên xwe de xwe

---

* E. Xanî, Mem û Zîn, Wş. Lîs.

wekî peyayê/endamê qewmekî xwediyê paşerojeke kevn bibîne/hest bike; ewleya xwe bi xwe bîne, bi vîn û hestên xwe ve xwe bi ser nîjada di navê de dijî de berde, girêka xwe ya navxweyî, yanî pevgirêdana di navbera xwe û qewmê xwe de zexmtir û qayimtir bike.

Bi qasî ku ez jî xwe wekî yekî ji pêmayê 33 şaristaniyên li ser axa Mezrabotan jiyayî û nebedîbûyî dibînim; xakdabeşkerên ku hemû dews, şopeşûn û şûwarên ku me bi pêjna wan a konedîrokî dihesînin; li gel rêşkirina şopên mayî yên li ser erdê, wekî keftarên li ser termê nêçîrê; nirxinin zexm û tebût ên çandî-wêjeyî jî, mîna ku genimê zeviya wan be, kirine/dikin/dixwazin bikin zadê kewara dîroka wêjeya xwe.

Nivîskarên esilkurd ên ku zimanê xwe 'jêkirinê' û zimanê serdestan xistine devên xwe û derbasî dîroka wêjeya wan bûne, li hêlekê; eyan e ku hewldanên van rojên dawiyê; –li Agiriyê Konferansa Ehmedê Xanî, li Wanê 'Sempozyûma Feqiyê Teyran– li Hakariyê Rojên Wêjeya Kurdî ji hêla qelemdar, nivîskar û rewşenbîrên kurd ve divê baş were xwendin û helsingandin!

Hewldanên hamasiyane ên ku ji demên kevn de wekî riya talankeriyeke din hatine hilbijartin; divê em ji bîr nekin, dikare bibe tewawkirina pêvajoya kêmxistin, qelskirin û wekîxwekirina gel û ziman û çanda di çavên serdestên kurdan de 'heyî' û 'tune'!

Li bakûr, evyek ji destpêka avakirina komarê ve bi navê prosesa yek netew, yek ziman, yek al ketibe meriyetê û hatibe meşandin jî; ji ber biserneketin û têkçûna polîtîkayên dewletê ên di vî warî de, îro, bi lêxwedîderketineke kirêtker û gotinên dahfikî; ên wekî; 'Ehmedê Xanî jî dewlemendiya me ye, Yûnis Emre jî'; berê xwe dane ji holê rakirina rûmet û nihîtenîrxên me yên wêjeyî. Yên ku Mewlana kirine tirk, û wî wekî tirkekî berpêşî dinyayê dikin, bi hewldanê wisa daxwaza wan ew e, ku hemû senemên me yên pîrozwer hilweşînin!

Çawa ku kurdekî Lorî, Baba Tahirê Hemedanî wekî hîmavêjê wêjeya nivîskî ya farisî hatibe qebûlkirin û nasandin, û dîsa hemû berhemên jêmayî bi destê 'pisepismaman' me veguhezîbin zimanê farisî; rayedar û rêveberên Tirkiyeyê, yên ku di her deliveyê de li qada

navdewletî hinekan bi hostetiya kuştinê tawanbar dikin; ji bîr dikin ku ew bi xwe jî alav û navgîn û şêwekuştinên dermirovî diceribînin li mirina kurdan û kêmarên din ên di nava sînorên misakî millî de.

Bawerî û feraseta min çendî dest bide, ku zatên nola Ûryan, mîna Mella, Feqî, Herîrî û Xanî... wekî dewlemendiya hevbeş ya qewmên Rojhilat û Rojhilata Navîn bêne dîtin jî; divê neyê jibîrkirin ku ew yekeyek durr û gewherên gencîniya Wêjeya Kurdî ne.

Belam, dîroka wêjeyê dîrokeke zindî ye, û rê dide ku bi her berhemê em di qeteneynikeke nû de neynika yekker bibînin, û neynika mezin de li xwe binerin.

Ev nerîn bi awireke zanistî be, dê ji me ve bixuye, ku wêje 'saziyeke' civatî ya hevbeş e, û ew bi saziyên din ên neteweyî û civakî ve têkildar û xwedî-girêdaneke zexm û hevaheng e.

Ku ev hevahengî nebe/nebûbe di nêva wêjeya kurdî û saziyên din ên civatî de?!

Wê demê, divê em li ristên Xanî vegerin:

*...*
*Saqî! Tu jibo Xwedê kerem ke*
*Yek cureˀe mey di Cam-i Cem ke*
*Da cam-i bi mey cîhannuma bit*
*Herçî me îrade ye, xuya bit*
*Da keşf-i bibit li ber me ehwal*
*Kanî bibitin muyesser îqbal*
*İdbara me wê giha kemalê*
*Aya bûwe qabilê zewalê ?**

Zewal, bêkêrkeriya me ya eşkere a di vî warî de ye, an na; tiştine din in? Divê em li ser vê pirsê rawestin, û li bersivên çareserker bigerin.

---

* Li gel hawêrdora (derûdor) erdnîgarî a ku qewmek li serê dijî; di navbera dîn û ayîn, çandinî, hilberîn û abur, sinc û tore, û jiyana siyasî û civatî a neteweyekî û wêjeya wî de têkiliyeke berbiçav heye. Ji ber vêya, bo ku berhemeke kevn baş bête naskirin û famkirin, pêdivî ye, jiyana civakî a dem û çaxê ku berhem hatiye nivîsîn ji hemû hêl û rexên xwe ve were nasîn. Ev, dê me bêtir nêzî 'neynikê' bike!

# *Ji klasîkiyê ber bi futuristiyê: Reşîdê Kurd*

Bi qandî Nazim bi salan di heps û zîndanan de şev nesipartibin destê rojê jî, Reşîdê Kurd ji Nazim bêhtir ketiye hepsê û derketiye.

Jixwe hê li welêt di dema girtina dawî de, ku pêdihese wê wî daleqînin, ji Hepsa Dêrikê direve[1] weke gelekên berî xwe, dibêje 'lingo bi qurbano' û berê xwe dide Binxetê!

Binxet wê demê di bin dagerkeriya Frensawiyan de ye.

Reşîdê ku di 1940î de pê li axa Binxetê dike[2-3] piştî salên mişt girtin û berdan, û azarkêşiyeke giran a di hepsa bi nav û deng de ya ku li tevî Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can û gelek ronakbîrên kurd lê bûne mêvan, Hepsa Mezê de dest bi helbestkariyê dike.[4]

Weke Qedrî Can, ristên bêrîker û xerîbîdêr nexuyin û em li hisretkêşiyeke kambax rast neyên jî di helbesta Reşîd de, dema ku nexweşiya bêderman lê giran dibe, peyvên ku ji hevsera xwe re dibêje, 'Hîn gelek karên ko min bikirana hebûn, min hîn ew bi ser ve neanîne, diviyabû ez niha nemirimaya. Heger ez vegeriyama Dêrikê û min ew baxçe bidîtina ko min ew ji mêj ve nedîtine, bila mirin wê gavê bi xêr bihataya'[5] têrî me dike bê Rêşîd çendî bêriya axa xwe, warê ku dest û pêyên wî jê hatiye birîn, Roşata Dêrika Çiyayê Mazî, kiriye...

---

1 Nefel, Nivîsa Enwer Karahan.

2 Nefel, Nivîsa Enwer Karahan.

3 Diyarname, Nivîsa Cemîl Oguz.

4 Nefel, Nivîsa Enwer Karahan.

5 Nefel, Nivîsa Enwer Karahan.

Di biwarê têkilî û danûstendinên herdu Dêrikî'yan de em bê agah bin jî, Qedrî Can hest û hisretê li peyvan bar dike, bi ristên têrbêrî mîna ku bi xweziya dilê Reşîd bizanibe, me bi bêrî, hisret û arezûya dîtina warê bav û kalan dihesîne:

*Dêrika Çiyayê Mazî*
*Welatê bav û kal e*
*Lê sed hawar û gazî*
*Jê dûr ketim çand sal e*

*Ez li wê hatim dinê*
*Wê dergûşê, hejandim*
*Heywax hey mala minê*
*Dijminan, jê revandim*

*Perçake ji buhiştê*
*Besreka Zêrîn welat*
*Îro dest nagehiştê*
*Ax û keser ji dil hat*

*Bax û baxçe bê hejmar*
*Cî bi cî mêrg û zevî*
*Li her derê, avên sar*
*Ji kaniya tê dizî*

*Xwezî vê carê jî min*
*Serê Xabê bidîta*
*Bila ruhistîn canê min*
*Hingê ji xwe re bistenda*[6]

Ya ku şa'ir bi saxî dikuje yek jê fîraqa ji yarê be, ya din dûrbûna ji pêçeka zaroktiyê ji axa wî ye!

Reşîd'ê Kurd, kêm zêde bi qasî nivşê ciwan û yê navsere yê dema xwe, çepgir e, ji dil û can bawermendekî bîrdoza 'bihuşta lal'e, û rêwi-

6 Qedrî Can.

yekî li ser rêça 'sewra sor' e, ku xoşewîst Enwer Karahan di nivîsa xwe de dibêje'. Di helbestên wî de jî hêlên wî yê fikrî bi pêş de ne'.[7]

Salên ku Reşîd ji cergê safî baweriya xwe bi 'iştirakiyetê' tîne, çepgirên Sûrî ên ereb bi piştgiriya Partiya Bolşewîk dîtina 'xewna' pevrejiyîneke bi rûmet, azad û serbixwe weke wahdekê berpêşî kurdên Binxetê, kurdên li ser Kudistanê cegerperitî, dikin.

Yek ji van kurdan jî Reşîdê Kurd e..

Em şopên jovaniya ji vê bîrdozê di helbestên Reşîd de nebînin jî, rexne û gilî û gazincên di ristan de, navên ku di rist û bendên helbestên li dû xwe hiştine de bi cih kirine, şanî me dide ku Reşît xwe wekî yekî 'xapandî', dibîne!

...
*Rê dibirin li kerwên*
*Ser jê dikin ew serwên*
*Bi wan pîjk û finêsan*
*Nahêlin ku bi hêsan*
*Bê derengî bi çaxê*
*Kerwan bigihe qonaxê*[8]
...
...

Kerwanê ku Reşîd jî di navê de berê wê li ser rêka 'biratiya gelan'

'yekitiya gelên bindest',' hevkariya karker û gundiyên cihanê' ye, mix abin nagihe qonaxê; li herêmê, li rawestgeha bîrdoza nijadperest ya Ba'sî'yan radiweste, û nema dilive!

Ev bêlivî, Reşîdê cegerdar bê hêvî nake; di Hepsa Mezê de bi helbesta xwe ya bi navê 'Kerwan'[9] ku heft kîteyî ye, Reşîd bi zimanekî rewan û sivik, ristine qayim û tebût, dewlemendiyeke serwayî, bi wezneke xweşteql û bi hosteyiyeke zorciwan şanî me dide, ku serdestê ziman e, û her weha serwextê helbesta klasîk e.

---

7 Nefel, Nivîsa Enwer Karahan.

8 Ez, Reşîdê Kurd, Wş. Avesta.

9 Kerwan, hem navê helbesteke Reşîdê Kurd e,hem jî navê dîwana wî ya li Swedê çap bûye ye.

Reşîdê ku di helbesta klasîk de wezna herî zahmet, hetf kîteyîyê hildibijêre, wisa dixuye ku bi sura futurîsmê a ku bi bayê 'biratiya gelan' re gihiştiye beriya Binxetê, Reşîd dixe bin karteka 'kurê şoreşê' serkêşê fûtûrîstên Rûs Mayakovskî, ku helbesta bi navê 'Basên Beyrûdê' bi heman şêweyê lê dike:

*Zîvirîn çerx*
*Bas liviya*
*Dolab geriya*
*Gêr bû bas*
*Bas firiya...*

*Wek colek berx*
*Rêwî*
*Bi ser hev de bûne kerx...*
*Hin rûniştin, hin ji piya*
*Bi çeng ve daliqîn*
*Qor qor sik sikîn*
*Pev zeliqîn...*

*--Nere bas!*
*--Here bas!*
*Şofêr*
*Zirezop*
*Çav li serî bûne tas!*
*...*
*...*
*Bi giştî deh peya*
*Rûniştî...*
*Ên mayî*
*Tev ji piya*
*Bi çenga ve daliqîn*
*Qorqor sik sikîn*
*Pev zeliqîn...*
*Nere bas!*

*Here bas*
*Şofêr*
*Çav lê bûne tas ...*
*Hop!*
*Berdestî mîna top*
*...*
*...*
*--Here bas !*
*Gêr bû bas*
*Kilek li pêş*
*Du kil li paş...*
*Hejiyan bîst û neh laş...*[10]

Di helbesta kurdî de bi helbesta Reşîdê Kurd re em bi ser helbesta kurdî ya fûtûrîst vedibin. Du sê mînak bin jî, weke 'Basên Beyrûdê Bersiv' helbesta Reşîdê Kurd di gel ku şopên helbesta klasik vedihewînin û dihûndirînin, helbestên ku me navên wan li jor bi bîr xistin, weke numûneyên destpêkê yên şêwefûtûrîstiya helbesta kurdî divê bên dîtin:

*Şing...şinggg...*
*Şirringgg*
*Vebû derî*
*Yekî soterî*
*Bi dijûn û guregur*
*Bi yek lotê ket hundir...*
*...*

Yên ku helbesta Nazim 'Makîlaşmak istiyorum' xwendibin, dê li hevahengiya di navbera herdu helbastan de biwarqilin û dê bibînin ku Reşit bi du sê helbestan be jî, destpêkêr û rêvekêrê helbesta fûtûrîst e.

Bi hêvî û daxwaza ku her helbestkar û nivîskarê kurd, vekolînerên zana û bîhnfere jiyana wan a taybetî û hunerî, huner û zimanê wan, têgîn û afirîneriya wan a wêjeyî û berhemên herdu Dêrikiyan yek bi yek vekolin û bireqifînin refikên Kitêbxaneya Kurdî...

10 Ez, Reşîdê Kurd, Wş. Avesta.

# *'Roja dilefroz'*

*Zi mûş, melex xorden û sosimar**
*Ereb ra bi cayî resîd est kar*
*Ki tacî Keyan ra kuned arizû*
*Tifû bad ber çerxê gerdûn tifû*[1]

Newroza ku hinek dîrokzan ji hêla dîrokî ve wê dispêrin 4350 sal berî zayînê, ayîngeriya di ayîngehên Zagmuk ên Gutîyan, û wê wekî baweriyeke serçaweyên xwe ji ola Zerdeştî'yê sitendî, rojeke nû û cejneke hevpar a ku ji aliyê Hurrî, Kassît, Mitanî, Urartu û Medan ve li dora agir hatiye pîrozkirin; hin lêkolîner jî berevajî vê pêşbîna dîrokî –wekî Gurdal Aksoy– wê, yanî Newrozê mîna rojeke derdîrokî; çavkaniyên xwe ji gotegot û efsaneyan wergirtî dihelsingînin, û vê rojê ji şerê berî zayînê di 612ê de di navbera Med û Babiliyan de rûdayî, vediqetînin.

Wekî her rûdana dîrokî-civakî a di serdemeke diyar an nediyar de pêk hatî, ne gengaz e ku roja kirasguherîna gerdûnê, kêliya wekheviya şev û rojê, vejîna erd û ezman û sirûştê, pêlika destpêka biharê Newroz; di wêjeyê de, di felsefeyê de, di çandê de cîh negire, di jiyana civakî de şop û dewsa xwe nehêle; nebe stiran û neyê gotin, nebe helbest û neyê vegotin, û nebe sedemê afirîneriya wêjeyî û hunerî...

Çîroka serboriya wê û hêlên wê yên têkildar ên bi dîrokê re ku em li hêlekê bihêlin; Newroz di berhemeke wêjeyî, berhemeke ku temenê wê zêdetir î hezar salan e, di Şahname'yê de derdikeve pêşberî me:

---

* Mêş û mihor dixwarin mişk û gumgumok
Desthelat ku kete destê erebên rû-pîrebok
Çav berdan her hêjayiyê û taca Keyanî jî
Wey tifû li çerxa te gerdûn, tifû li te jî

1 Şahname, Beşek Farisî, Jan Dost, Diyarname.

*Kurê Tahmurs, Cemşîd'ê pir hêja*
*Ser û dil gewre, raman û vên hêja*
*Meşî berû text, taca zêr da ser*
*Bi dur û gewher, li piştê kember*
*Kete bin hikm, hemîşe gerdûn*
*Li tevî dêwan lawirên ku hebûn*
*Ger wî bixwesta, taca keyanî*
*Dê bibûya roj l' nêva ezmanî*
*Her wisa li jêr, li ber piyên text*
*Xelkê dadparêz ne bi kotek û zext*
*Bexşandin ji dil mal û milk û koz*
*Navê vê rojê ew ro bû Newroz![2]*

Şahnameya ku ji 60 hezar malikî pêk tê, bi beşên di bin sernavê

'Tahmurs', 'Cemşîd', û qetebeşên wekî 'Serboriya Dahaq û bavê wî', Dawiya desthelata Cemşîd', 'Serencama Gaweyê Asingar û Dahaq' û hwd... bûyerê bi berferehî bi zimanekî wêjeyî vebêje jî; Fîrdewsî berevajî zanîn, qebûlkirin û jiberkirina heyî; ne roja ku Dehaq bi destê Kawa tê kuştin; roja ku Cemşîd hildikişe ser textê kayantiyê bi navê Newrozê bi nav dike...

Ji bilî Fîrdewsî şa'irin din; O. Hayyam, Nîzamî Gencewî, Melayê Cizîrî û Ahmedê Xani jî bi çêjeke hûnerî, û zimanekî wêjeyî Newroz kirine babeta helbest û berhemên xwe.

Ji wan wêjevanan yê ku herî zêde –piştî Fîrdewsî bi zaravê kurmancî- bi berferehî Newrozê bi devê kalekî j' kalê zemanan vedihûne û radigihîne me, Ehmedê Xanî ye:

*...*
*Zanayê miemmerê kuhensal*
*Ev rengê ha go bo me ehwal*
*Go, 'adetê pêşî ê zemanan*
*Ev bû li hemî cî û mekanan*

*Wextê weku şehsiwarê xawer*
*Tehwîl-î dikir di mahê Azer*

2 Şahname/Tirkî, Necatî Lugal, Rêzeberhemên Zanis û Çandê, Weşanên Wezareta Perwerdeya Millî.

*Yanî ku dihate bircê Sersal*
*Qet kes nedima di mesken û mal*
*Bilcûmle diçûne der ji malan*
*Hetta digihişte pîr û kalan*
*Roja ku dibûye Îdê Newroz*
*Te'zîm î ji bo dema dilefroz*[3]

Ehmedê Xanî di destpêka Mem û Zînê de çawa ku gotiye, Şerha dil bikim fesane/ Mem û Zîn bikim behane; di vê beşê de jî Newroz kiriye 'mahneya' hevdudîtina Mem û Zînê.

Di nivîseke bi vê mijarê ve girêdayî 'Xanî û Newroz: Li ser sekoyê Cizîra Botan'[4] de min wiha nivîsîbû:

'H. Mem bi berhema xwe ya dawî 'Xanî û Newroz'ê[5] dide ser şopa Newroza ku ji wextê hilweşîna birc û kelehên zordariya Asûriyan ve weke salveger û destpêka sala nû bi çoşa roja ewil têt pîrozkirin.

Ji bilî spartekên dirokî, H. Mem di kitêba xwe ya bi navê 'Xanî Û Newroz' de di 12 beşan de li çirûskên agirê Newrozê digere; serî li dergeha Fîrdewsî, Şahnameyê dide, û nêziktêdayîna Firdewsî ya bi çavnebarî, xefker û berovajîkirinan mişt, radixe ber çavên xwîner, û ji wir dadigere ser kitêba kitêban Mem û Zînê; ku hevnaskirina herdu lehengên sereke li ser dika şanoya neteweyî, serbajarê Mîrektiya Botan li Cizîrê bi destê Xanî'yê derhêner û vebêjeriya zanayê kuhensal, perdeya xwe di rojeke Newrozê de vedike.

...

Armanca H. Mem ew e ku; Newrozê, Newroza ku di roja îroyîn de jî li ser vê erdnîgariya ku bûye mazûvanê gellek qewman, û destûr da ku birek ji wan konê xwe yî pirrcax û pirrstûn vegirin û bijîn, lê paşê an konê xwe dane hev û koçber bûn, an jî konê wan rastî lehiya dîrokê hat û şop û dewsên wan hatin maliştin; lê Newroz weke rojeke ayînî, roja yadkirina hilweşîna kelehên zordariyê, roja zayîna kurrojên li dû azadiyê; ji nû ve, bi şêl û temtêla zanayekî kuhensal vebêje:

---

3 Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, Weşanên Lîs.
4 'Xanî û Newroz: Li ser sekoyê Cizîra Botan'.
5 Xanî û Newroz, H. Mem, Wş. Ens. Kurdî a Stenbolê.

‘Mîtolojiya di biwarê Newrozê de ji xwe re 21ê heyvê, wê demê, dema ku Cemşîd li ser textê xwe yî remzerojî ketiye Babîlê, hildibijêre. Li vir jî eşkere xuyaye ku roj bextê hemû dia û hêviyan e’...[6]

Dia û hêvî du senedeyên li serpêmayînê ne, ku her mirov xwe dispêre wan..

Kurdan ji roja ku roja wan tarî bû û ta niha bi berxwedêriyeke nedîtî, dil bi hêvî, li bendî hilatina roja pirpertew roja Newrozê man. Ev bendemayîna bi kul û bi hisretê mişt, di helbesta Osman Sebrî de dibe gilî û gazinc, dibe banga lixwevarqilînê; hatina biharê, ‘xwendina’ dîrokê, yadkirina demên dêrîn, bilêvkirina nav û lehengiya Kawa û banga xwedîderketina li welatekî:

*Bi xêr hatî tu Newroz*
*Dilê min her li gel te*
*Ji çavên te xuya ne*
*Teqez tu jî wekî min*
*Em dê kînga xilas bin*
*Newroza xwe vejînin*
*Ma têr nakin ev şaşî?*
*Tev bi ramanek xweser*
*Wek Kawayê hesinker*
*Rabin bi şûreşê xurt*
*Welatê xwe bistînin*
*Hemi aza bextiyar,*
*Hînga hêja ye Newroz*
*Bi kêf û saz û govend*
*sersala me kurdan î*
*hêja û sergiran î.*
*dibînim rûgirîn î,*
*pir êş û dilbirîn î.*
*ji zîneta neyaran?*
*di destpêka baharan*
*divê em jê şiyar bin,*
*bo şûreşê li kar bin*
*bervaneke xwe rakin,*
*pergala wan bela kin.*
*tê de bijîn serfiraz,*
*dewlemend û belengaz.*
*bimîn sersala kurdan,*
*vejînin li Kurdistan.*[7]

Wekî Osman Sebrî, Cegerxwîn jî di[8] dîwanên xwe de vê bûyera dîrokî/efsanewî/mîtolojîk ku dikarîbû bibe serkaniya vejîna peyvê, derne û jêdera afirîneriya helbestkariyê; ne bi berhemeke xwerû û xweser; bi temakirina du sê helbestên lîrîk, ku dikarin bibin stiran, pêşkeşî me kiriye:

6 Heman Berham
7 Newroz, Dîwana O.Sebrî, Wş. Perî, rp. 54.
8 Newroz e, Kîme ez, Cegerxwîn, Wş. Avesta/rp. 267.

*Nûroz e, nûroz e, sibhînê nûroz e*
*Maçek bide min yar, cehna te pîroz e*
*Nûroz û bihar e*
*Nûroz e...*
*Bel bûn gul û dar e*
*Nûroz e...*
*Bîna gulê har e*
*Nûroz e...*
*Destim bi destê yar e*
*Nûroz e...*
*...*
*...*
*Nûroz û mizgîn e*
*Nûroz e...*
*Bihar e bengîn e*
*Nûroz e...*
*Kesk û zer û şîn e*
*Nûroz e...*
*Xalîça rengîn e*
*Nûroz e...*

*Nûroz e, xweş bat ê*
*Nûroz e...*
*Bîhna kulîlka tê*
*Nûroz e...*
*Sinbil bi sema tê*
*Nûroz e...*
*Xum xum ji çema tê*
*Nûroz e...*[8]

Di helbesta li jor, helbestkar mîna ku bixwaze xwe ji hemû reng û rewşa heyî a civakî: xîzanî, nezanî, bindestî, çarkenarî ...û hwd. xwe dûr bixe; helbestê bi her rist û peyvê dixe ber çoş û şahiya hatina biharê, kirasguherîna jêr û jor...û vêya, vê kêliya aram û şa –bîstikekê be jî– dike hilma azadiyê û dikişîna hinavên xwe...

Helbestkarê siwarê peyva kurdî, rişmragirê rist û beyt û çarînan wisa zû û bi lez dixwaze bigihê felatê, ji ber hindê di helbesteke din de, mîna ku bixwaze bibêje,' binere; welat rizgar e, em şa û dilşa, serbilind û payedar in' li ber çavên me bi peyvê mizgîniya roja rizgarîyê diwênîne:

*Bihar e, ba bi xêr bê, li ser çavên me Nûroz*
*Ba kurd ji hev re bêjin: bira cejna te pîroz*
*...*
*Canfîdayên ciwanmêr em deynin ser milên xwe*
*Îdî em şer naxwazin,gulebaran û bahoz*
*...*
*Xwedê li jor dizanî em ji bona çi dane*
*Çima girtî û dîl bin weke berxê di nav koz*[9]

Di nivîsekê de min gotibû, helbest bîr e. Her helbestkar bi şêweyeke ji şêweyan û ji nû ve 'bîr'a me ya 'jibîrbûyî' vedipexirîne, û 'jibîrkiri'nên me bi ristekê, bi helbestekê bi bîra me dixe:

*lê biharê, soj û arê gewrî rengê dinyayê*
*qazûqerê, şa û şerê xeml û ala medyayê*
*ar-rêberê, cejna berê, pîrozîya Kurdayê*
*herûherê, nemirberê, serhildana xwezayê*
*lê biharê, Kawa warê, mijara dîrokayê*
*ji ar zayê, bi me mayê, li vî milkî jîyayê*
*her biharî her adarî serî l' zilmê hildayê![10]*

Helbestkar bi helwest û helbesta xwe kengî, li kû serî li ber zilmê çimand?

Wî, wekî dûhî îro jî bîra me ya hişk bi peyvê nimand, ziman kir direfşa hebûnê û hejand, û welatek û xelk û zimanekî çarkenar, bi mertalê peyvê himand, himand, himand...

*11.03.2010, Amed*

9 Bere bihar bi xêr bê, Kîme ez, Cegerxwîn, Wş. Avesta, rp. 28.
10 Biharê re serhawe, A. Arî.

# *Dengên ku di guhên me de dixulxulin*

Bêşik û bêguman; ziman ne qetegoşteke di şikefta devê mirovî de; nasnameya mirov ya mirovî, nijadî û wêjeyê ye jî.

Dinya ber bi serdestiya yekzimanî ve bisûrike û hûr û gir bi du sê zimanan dest bi axivtinê bikin jî, ziman: keskesora nasnameya wêjeyî, di heman katê de newala kelepora devkî û nivîskî ya ji hezar salan ve weke mîrate bi her qewmî mayî ye, û dîsa heman ziman e diyarkerê her çanda ku malbata mirovahiyê ji hev cuda dike, û bi hev re dixe nava têkiliyê, û bi vê têkilîdanînê dike ku ji hev bixwe û li xwe û li hevdu zêde bike...

Digel vê xweseriyê çandek an jî zimanekî xwerû, ji yek kaniyê derbûyî û di dirêjahiya dîrokê de di delavê xwe de weke çemekî li herik, jê çemk û robar neqetyayî; venexwarî ji ava gol û kahniyin din, heye gelo?

Ji dêvla bersivandina vê pirsê pêşniyaza min ev e:Weke dara malbata mirovahiyê, dar-secereya pirşax û pirgulî ya zimanan bînin bîra xwe.

Weke tirkan, gelek qewmên di dil xwe de konenijad û qaşo xwedî ax û rabûrduyeke dirêj-dîrokî, ji hêla ferhenga zimanî ve deyndarê zimanê qewmin din in.

Ji qewmên deyndar, weke Swêdiyên li jora banê gerdûnê, xwezî tirkan jî, tirkên ku nivîskarên wan bi xelatên Nobelê wan bi rû û rûmet dikin, bigotina em deyndarê kurdî ne, û rojekê em ê vî deynî li xwedî vegerînin?

Lê na; ji dêvla ku minetdariya xwe bînin zimên; di dirêjahiya 80 salên xweavakirinê de û îro jî ketine/dikevin nava hewldaneke ku qirdikan bi xwe bikenînin: Înkar!

Mandelkirin di binyata xwe de hewldana tunedîtin û tûnekirinê ye, ku yek xak, yek qewm, yek ziman; pêşî xistin pişt sînorên peymana Qesrî Şîrîn, paşê bi ahda Lozanê re sînorên heyî yê di navbera xakekê, qewmekî, zimanekî û çandekê de zêdetir û bilindtir kirin ...

Peyva resen weke bazê bilindwar û hezkerê bilindahiya bêsînor, sînor nas nekiribin û xwe li aso û asîmanên xakeke tîştîşî qewimandibe jî; sînorên heyî yên di navbera dewlet û milletan de ji wêjeya kurd pê ve li ser rûyê dinyayê ji bilî wêjeya bi navê 'wêjeya kurd a diasporayê' têt bi nav kirin; wêjeyeke ku di 5 wargehên perçekirî de di berxwedanê de şîn bûbe, gurr û geş bibe û bi berhemên nemir xwe gihandibe îro, heye gelo?

Ev wêjeya ku weke xaka xwe pêrçeperçe, digel sersedên bilind û asê: siya devê şûran û lûleyên tivingan, û ferzkirina qedexekariya bi zagonên reş; ji dîrokeke salix dayî, ji serdema nivîsa bizmarî bi neh alfabeyên cuda û çar zaravên sereke yê yek zimanî, bi berhemên ku du hezar salên din jî di ser wan re biqevizin, dîsa jî ji ekl û çêja xwe ya edebî û hûnerî misqalekê wenda nakin; kitêbxaneya xwe û pê re ya mirovahiyê dewlemendtir kiriye.

Ew nebihîzin lênewarqilîn jî, heta ku yek kesê kurdîaxêv hebe, ev wêje bi qasî pişk û pahra kurdan, mal û milk û mîreteya mirovahiyê ye jî...

Wêjeya kurdî ya ku niha jî ji sedî 80ê helbest e; li ser axa xwedîdewlementirîn wêjeya gelêrî, weke qurmê dareke ku qesta asîman bike; bi şax û guliyên nû qurmê xwe dixemilîne, û îro li gel dîwanên helbestkarên Nerûdayî, bi roman û çîrokên ku wergerin 72 zimanên li dinyayê,dê çêjeke wêjeyî û hûnerî ji wan were girtin; ji Bakûr, ji Başûr, ji hêla Qefkasan heta bigihe peravên Rojhilat û ji wir xwe li Başûrê Rojavayê Kurdistanê bide, aso û bergeha wêjeyî ya zimanê kurdî ferewantir dike.

Li tevî muzîkê, helbesta ku makedara hemû dar û daristanên wêjeyî û hunerî ye; li ser axa kurdan, axa ku bi reng û dengê xwe ve stiraneke gewre-xweristî pêk tîne; ney'îtî û lîriktiya dilok û payîzokên gelêrî ji xwe re kiriye palpişt, dengbêjiya konedêrîn a ku bi qasî serê

derziyê ne kêmî Odesa û Îlyada'ya Homeros e, kiriye hîmekî tebût, û ji wextê Biraboz de hemû hawe û şêweyên edebiyata klasîk a ku meriv dikare ji hêla şêweyî ve wê weke 'milkê edebiyata hevbeş a Rojhilata Navîn' bi nav bike; bi qesîde, xezel, çarîn, û mesnewiyên weke Yûsiv û Zileyxa, Leyla û Mecnûn, û Mem û Zîn ...bi wext û mekan, xweşvebêje jî mişţşayesan, bi lehengên bi nav û nîşan: Mem û Zîn, Stî û Tacdîn, Beko û Mîr Zeydîn...ku îro jî ekl û çêja romanekê radigihîne xwîner, di bazneya bi sînor û alfabeyên cuda hatiye tengkirin de li tevî afirînerên xwe li xêrindar û xêrîdarê xwe digere...

Di vê lêgerîna ku pêlên wê digihije dema vêga; peyva birîndar, şîn û kul û azarên xwe çawakî kiribin buxçika stiranan; wisa jî her rûdana civakî-dîrokî kiriye stiranhelbesteke ku zarok di dema leyistikê hem bileyizin hem bibêjin, û bi leyistin û gotinê re pê bihesin ka çi qewimiye, çi bi serê pêşî û pêşewayên wan de hatiye:

*Qîqanê qîqanê*
*Pablûka mercanê*
*Mîrê kelê kanê?*

*Mîrê kelê kuştî*
*Ehya beg rûniştî*

*Ehya begê diz e*
*Qeytan kirne rêz e*

*Qeytanê mamê min*
*Her êk û bejna min*

*Bejna min çinar e*
*Wek dara henare*

*Henara romê ye*
*L'ber darê zorê ye*

*Bûka me d' hewşê de*
*Osmano di koşê de*

*Osmano,Osmano*
*Kulav rep î pano*
*Mîrê kelê kano?*[*]

Ev helbesta ku di ber leyistikê de zarokên kurd hem dibêjin û di ber re dileyizin, ji bûyera mîştkaresat, hilweşandina Mîrektiya Botan a bi destê Osmaniyan, ji sala 1847ê de maye...

Gava ku em destê xwe dahijin bîra helbesta kurdî, weke helbesta li jor gellek helbestên din, çîrok û stiran û çîvanok... dê bi destê me ve bên.

Helbesta hozanvanê wê nediyar –ku hindek rewşenbîrên kurd vê helbestê wekî helbesteke paşê hatibe çêkirin bihelsengînin jî– belge karesata beriya 1400 salan a serdema êrîşên Xalidî dixe bîra me:

*Hormizgan riman atiran kujan*
*Weşan şardewe gewrey gewrekan*
*Zorkarî ereb kirdine xapûr*
*Ginaw paleyî heta Şarezûr*
*Şîn û kenîkan we dîl beşêna*
*Mêrd azar tilî we rûy hiwêna*
*Rewişt Zerdîştire manewe bê des*
*Bezêka nêka Hormiz we hêç kes.*[**]

Piştî vê helbesta helbestkar nediyar, xwediyê Mem û Zînê hîma-vêjê vîna milî-neteweyî Ehmedê Xanî heman tamemijarê wisa bi cih dike di beşeke Mem û Zînê de:

*Rom û Hebeş û Fireng û Tatar*
*Herçî ku nekir bi dîn î îqrar*
*Neçarî gelek bi şûr fenabûn*
*Hetta ku hinek bi dîn teba bûn*
*Pûtxane bi agirê dişuştin*
*Atêşgede cimlekî ve kuştin*
...
...

---

* Arşîva Dr. Arif hîto.

** Di Dîroka Kurditan de Dêrsim, N. Zaza, Wş.

*Da'wa xwe dikir bi dest û ezman*
*Destê wî bi şûr û dev bi Qur'an*[*]

Helbest heke bîreke hevbeş a ku nemiçiqe û her kes jê avê vexwe be, wê gavê helbestkar ji duhî de birêketî kasidê gihandin û ragihandina îro ber sibe û bisiberojê ve de ye, ku em tûşî vê taybetiyê dibin di helbesteke di dîwana Ehmedê Xanî de:

*Tasek ji ava zelal nadim bi hewzê Kewserê*
*Levhatina Qesra Şîrîn jê nabînim tu meferê*
*Piştî roja me bû tarî mirin xweştir e j' emberê*[**]
...

Di ristên helbestê de em rastî şairekî evçend hişk bi ax û welatê xwe gêrêdayî tên, dikare bibêje mirina min ji perçekirina welatê min xweştir e.

Her şair bi qasî dilsoziya Ehmedê Xanî bihêz û hez niha jî destgirtî û dil û dîlgirtiyê axa welatê xwe ye...

Ji helbestkarên klasîk her pênçê gewre: Elî Herîrî, Melayê Cizîrî,,Feqî'yê Teyran, Melayê Batê,Ehmedê Xanî û sê gewrenavên din: Simaîl Bazidî, Şerefxan û Muratxan... ne tê de, koçberî ye qedera şairê kurd, bi taybetî piştî serhildana 1925ê...

Ez jî yek ji wan im ku niha li ser axa welatê xwe ne li devera ku lê ji dayikê bûme û min xwestiye lê bijîm; li bajarê ku bi birîndarî hatimê surgun im...

---

* Mem û Zîn, E. Xanî, Wş, Lîs.

** H. Mem, Mamosteyê Sêyem: Xanî Wş Ens. Stenbolê.

# *Pira di navbera îro û siberojê de*

Ji xêzewêneyên li ser dîwarên şikeftan em têderdixin; ziman wekî alavake/navgîneke ragihandinê û ji hev famkirinê, di destpêkê de nîne.

Lê wirde wirde, her ku mirovê kit, kite-kit hatine cem hev û bûne cot û civat; 'zimanek jî ji xwe re peyda kirine.

Wekî qeteke goşt ji zayîna mîrovî ve di şikefta devê mirov de weslek heye/hebûye. Lê ev 'hebûna wesl' di destpêkê de alîkarê diranan e, wekî 'melhêbekê', çep û rast xwarin avitiye ber rêza diranan, da baş bête hêrtin/cûtin, û ew tişta cûtî jî bi hêsanî bête daqurtandin.

Jixwe ku ne ji ziman be, meriv nikare xwêsiya xwe jî daqurtinê!

Lê erka wî ya bingehîn –yanî ne wekî perçeyekî goşt– vê paşiyê lê hatiye barkirin: Axaftin

Û jixwe, ji wî/wê pê ve, hertişt diaxivî!

Mirovê ku di nava şiruştê de wekî îro duhî jî ne tenê –lê mîna îro evçend ne serdest û serwerê siruştê–; li dorê dar û devî, kulîlk û geya, av û hewa, û zûrîn, orrîn û ba'rîna lawiran hebû.

Û deng dihatiyê.

Bi matmayîn,- belkî jî bi baldarî- li xûşşîna sipîndarê guh didêra, li herikîna avê temaşe dikir.

Lê, lê dema ku orîna fengenozekî* dibihîst, teqez diquttifî! Teqez, ji nişkê de dema ku rastî şêrekî dihat, dibehitî! Belkî jî gellek caran xwest wekî şêrekî bibêje, 'irrrrrrrrrrrrrxwww'! An jî xwest neqla pisîka berî bike: Miiiii-yeeeewwwwwwwwwww!

* Fengenoz: dînazor.

Lê na; ne xêzewêneyan têrî derbirîna wî dikir, ne jî liv û lebata bi dest û jestan: Ew mirov bû, diviyabû biaxive! Diviyabû biaxive; ji ber ku xweza bi zimanê xwe, lawir bi zimanê xwe dikelimîn.

Beriya bikelime, û bi bêjeyên li dû hev rêzkirî ma'neyekê li dengê ku derdixe barbike; peyva di destpêkê de ya her merivê/a ji diya xwe re bûyî yek bû: Qîrîn!

Û, paşê jî girî!

Girî; wekî kenîn, kerb, bahc, tirs, kêf, şabûn... liva dilînderker ya mirovî bû, û girî her girî bû.

Lê girî, hestederkirineke mirovî ya hevbeş bûya jî, her dayik wekî dayikên kurd, di ber girî re li xwe nedixistin, porê xwe nedikişindan, rûyê xwe nedixirimandin.

Evyek nîşaneya êşa ji êşan pirtir bû.

Êş hebû, û axaftin bi xwe carinan êşeke din dida mirov.

Ji lew, êş; 'vederker e, vebêjer e'!

Ji lew, gotine, 'yê ku derdê xwe nebêje derman nabîne'! Ji lew, gotine, 'bi gotinê dil hênik dibe, êş sivik dibe'!

Êş ku neyê gotin, meriv disojîne. Wekî çivîka genimê bijahr xwarî, meriv diperpitîne!

Û êşeke me, ji hemû êşên me yên heyî girantir heye: ziman!

Dibêjin ziman hebûn e, neyîna ziman jî tûnebûn e. Ez jî dibêjim ziman ez bi xwe me. Ez tune bim, ziman jî tune. Ziman tune be, jixwe ez jî tune me!

Piştî ku ez bibim yekî 'tune'; zimanê min di pirtukan de hebe çiye, nebe çiye?

Piştî ku zimanê we nebe, hûn hebin çiye hûn nebin çiye?

Piştî ku zimanê mirov geriyaye, ji nû ve, mezinên wî, yanî bav û kalên wî peyvek gotine: zikê gede tije ye, zimanê wî tune ye'!

Jixwe armanca min jî ew bû, ku vê peyvê bi bîr bixim: zikê gede tije ye, zimanê wî tune ye'!

Zimanê 2500 gedeyên di vê, wê girtigehê de girtî jî mîna ku tune

be; wekî kahrikên ku tu bajoyî hewşî, hikumetê jî ew ajotin hewşeke dorgirtî lê servekirî: Zîndana 5 nolî!

Niha li ber derîyê der ê 5 noliyê çadirek heye.

Ji kerema xwe, wextê xwe veqetînin û herin serdana malbatên zarokên girtî. Piştgiriya xwe diyarî bav û dayikan bikin. Dilê wan xweş bikin, hebekî. Û bibêjin ev zarok ên me ne jî!

Û paşê, meyzênin; heke we yek afîş, yek pankarta bi kurdî dît?

Zarokên ku di navbera îro û siberojê de 'pira' me bin, bi kîjan zimanî diaxivin di hûndir de?

Bi tirkî, bi kurdî?

Û...em ên li der?

# *Xanî û Newroz*[*]

Weke şairekî feqîrhal, wekî kurdekî di nava kurdan de bi halê kurdan re hemhal; digel bindestî û bêderfetiyê min xwestiye bi çavên neviyekî ji neviyên Xanî li xwe meyzênim.

Li gel afirîneriya xwe ew hûnerbazek e, hişmend û endazyarê hişê milî, zadeganekî hemû dewr û dewrana ye!..

Ew Xanî ye: Xwedîyê genciniya neteweyî!

Weke kes, kesekî ji edeb û toreya wî misqalek bi pahra wî ketî; ez jî bi yê beriya xwe, bi yên bi xwe re û bi yên bi dû xwe re dilşad im, serbilind im, bi paye me...

Ev bipayebûn ne qurretî ye, ne jî pozbilindî...

Û ji vê awir û derbirînê, ji kerema xwe kesek bila di binê dawa xwe de li 'heftokan' negere û hewl nede –ne bibêje ne jî biniqutine dile xwe, ku ez xwe li cihekî datînim, an jî xwe beramberî cenabê cenaban, Xanî dikim:

Ne bi afirîneriya xwe, ne jî bi helwest û sekna xwe nagihim çonga wî.

Hebe hebe yek heyran û mirî û murîdên kalê xwe me, kalê xwe yê ku gotiye:

Pırsî jı dınê min ev bi hîkmet:

Mehra te çı? gote min ku: Hîmmet!

Xwediyê himmetê ew bi xwe ye:

Roja ku rahişt xameyê qeselî û biryara nivîsandina 'Destana Dehan'[**] da, zanibû tişta ku dê bike hem 'hîkmet' e, hem 'hîmmet' e, hem jî 'qudret' e...

---

* Xanî û Newroz, H. Mem, Wş. Enst. Kurdî ya Stenbolê.

** Destana Dehan, Manîfestoya Rizgariyê, Tewrata Kurdan: Navlêkirina H.Mem.

Û wî, ev 'hîmmet' bi berhema xwe ya bêhempa kir 'qudreta' zar, bi her malikê kir 'ateşgeha' neteweyî, atêşgeha ku di hemû dewr û dewranan de agirê wê dê her gurr û vêketî be.

Jixwe H.Mem'ê kurê Xanî –ji ber ku cenabê H.Mem ji Xanî re dibêje bavo, min jî wisa ra lê dît– daye dû vî agirî, vî agirê ku di rojeke Newrozê de ji nava nikilê xameyê Xanî dinizile dilê herdu dildaran û li cihekî ne lamekan; li Cizîra Botan hatiye vêxistin.

Weke têt zanîn; kurdan bi şahiditiya dîrokê, hima bêje 2620 sal e ku bêwestan dane dû hêviya dilê xwe, roniya çavên xwe; roja Hûrmûzîn, roja ku dê ji hemû rojan zertir û bi pertewtir hilê, roja nû, yanî Newrozê!

Lêkolînerin –mînak Gurdal Aksoy– bûyera Newrozê bixwazin ji ra û rîşalên wê yên dîrokî bibirin û wê weke xebroşkekê, bi gotegot û bi mîtolojiyê ve girêbidin jî; H.Mem dide ser şopa Newroza ku ji wextê hilweşîna birc û kelehên zordariya Asûriyan ve weke salveger û destpêka sala nû bi çoşa roja ewil têt pîrozkirin.

Ji bilî spartekên dirokî, H. Mem di kitêba xwe ya bi navê 'Xanî Û Newroz' de di 12 beşan de li çirûskên agirê Nerozê digere; serî li dergeha Fîrdewsî, Şahnameyê dide, û nêziktêdayîna Firdewsî ya bi çavnebarî,xefker û berovajîkirinan mişt, radixe ber çavên xwîner, û ji wir dadigere ser kitêba kitêban Mem û Zînê; ku hevnaskirina herdu lehengên sereke li ser dika şanoya neteweyî serbajarê Mîrektiya Botan li Cizîrê bi destê Xanî'yê derhêner û vebêjeriya zanayê kuhensal, perdeya xwe di rojeke Newrozê de vedike.

Her xwînerên kitêba kitêban bi qasî ku ji vê rûdanê haydar e, ta niha ji hêja H. Mem pê ve kesek ranebû û neda dû vê pirsê:

Hevdûnaskirina Mem û Zîn, Stî û Tacdîn çima ne di rojeke din de, lê di roja Newrozê de; roja ku ji hêla zeman ve serdemeke nû ye, ji hêla xwezayê ve kirasguherîn e, ji hêla şev û rojê ve zeman terazîn e?

H. Mem di vir de serî li çavkaniya hemû bersivan, 'Destana Dehan', 'Manifestoya Neteweyî', 'Tewrata Kurdan'* Mem û Zînê dide û bersiva pirsa ku dê bêt dayîn wusa bi wate dike:

* Destana Dehan, Manîfestoya Rizgariyê, Tewrata Kurdan: Navlêkirina H. Mem.

‘Belê Newroz roja nû ye; roja bi Nûbihara Biçûkan re perwerdekirî, bi Eqîdeya Îmanê kemilî, armanckirina dahatûya nivşê nû ye bi Mem û Zînê ... Ango zeman û mekanê bişkivîna hêvî û adanan e...’

Armanca H. Mem ew e ku; Newrozê, Newroza ku di roja îroyîn de jî li ser vê erdnîgariya ku bûye mazûvanê gellek qewman, û destûr da ku birek ji wan konê xwe yî pirrcax û pirrstûn vegirin û bijîn, lê paşê an konê xwe dane hev û koçber bûn, an jî konê wan rastî lehiya dîrokê hat û şop û dewsên wan hatin maliştin; lê Newroz weke rojeke ayînî, roja yadkirina hilweşîna kelehên zordariyê, roja zayîna kurrojên li dû azadiyê ji nû ve, bi şêl û temtêla zanayekî kuhensal vebêje:

Mîtolojiya di biwarê Newrozê de ji xwe re 21ê heyvê, wê demê, dema ku Cemşîd li ser textê xwe yî remzerojî ketiye Babîlê, hildibijêre. Li vir jî eşkere xuyaye ku roj bextê hemû dia û hêviyan e...

Hêvî ew e ku her kes di roja ku her kes li bendê ye ‘bihingive rojê’. Yanî bi gotina kurê Xanî, H. Mem ‘hevîrtirşê mirovahiyê ye azadî’!

Ew jî ew roja ku her kes rizgar, her azad be, ew roj e:

*...*
*Zanayê miemmerê kuhensal*
*Ev rengê ha go bo me ehwal*
*Go, ‘adetê pêşî ê zemanan*
*Ev bû li hemî cî û mekanan*
*Wextê weku şehsiwarê xawer*
*Tehwîl-î dikir di mahê Azer*
*Yanî ku dihate bircê Sersal*
*Qet kes nedima di mesken û mal*[*]
*Bilcûmle diçûne der ji malan*
*Hetta digihişte pîr û kalan*
*Roja ku dibûye Îdê Newroz*
*Te’zîm î ji bo dema dilefroz*[**]
*...*

* Ehmedê Xanî, Hemû Berhem, Wş. Lîs.

** Ehmedê Xanî, Hemû Berhem, Wş. Lîs.

# *Şa'irê Korocax*[*]

*Ewî şa'ire nabê korocaxî*
*Le sayey şa'irekan babî kuran im.*

Hecî Qadirê Koyî di sala 1817an li Kurdistana Başûr li gundê Koyê, Gorqerecê hatîye dinyayê. Bavê wî Mela Ehmedê Mela Salihê Mela Ehmedê Gewre ye. Navê diya wî jî Fatê ye. Vê agahiyê Hacî Qadir bi xwe di malikên helbesteke xwe de eşkere dike:

*Bawkim Ehmed bû nawî fikrim dê,*
*Xelqî ladê bû, daykî min Fatê.*
*Tê bîra min navê bavê min Ehmed bû*
*Diya min Fatê jî xelkê gundan bû.*

Wekî aqûbeta piraniya şairên kurd Hacî Qadir jî hê di biçûktiya xwe de bavê xwe wenda dike. Dayka wî Fatê jî piştî mirina bavê wî bi demeke kurt diçe ser dilovaniya xwe. Di gotareke xwe de Mahmûd Lewendî rewşa Koyî wiha vedibêje: Diya wî, wî dide ber destê Mela Ehmedê Gunbetî daku bixwîne. Lê Hacî Qadir dibe neh salî diya wî jî dimire. Mela Ehmed, Hacî Qadir digire cem xwe wî dide xwendin. Paşê Hacî Qadir diçe bajarê Koyê, li wir dixwîne. Piştre wek mela li Koyê, Xoşnav, Serdest, Mehabad, Kerkuk, Silêmanî, Hewlêr û gelek bajarên Kurdistanê digere, dixwîne û melatîyê dike'.

Piştî salên 1850î Hacî ji Kurdistanê derdikeve, berê xwe dide payitextê Tacîdariya Osmanî, Stenbolê.

Li Stenbolê danustendinên wî bi kurdan re, bi taybetî bi malbata Bedirxaniyan re çêdibe. Di vê hevdunasînê de li ser daxwaza Mîr Bedirxan, Koyî dibe mamosteyê zarokên malbata Bedirxaniyan. Hacî Qadir piştî ku dibe mamosteyê malbatê, ew bêhtir tûşî pirsa kurdî dibe.

* Heci Qadirê Koyî (1817-1897).

Hem ji gotara Lewendî hem jî ji nivîsên Mîr Celadet em têdigihijin ku pêwendiyeke wî ya zexm li gel malbata Bedirxaniyan heye.

Koyî'yê ku cara pêşî Mem û Zîn'a Ehmedê Xanî li mala Mîr Bedirxan dibîne û dixwîne, bi qasî Cegerxwîn ew jî dikeve bin bandor û karteka hunerbazî, afirînerî û zexmevîna neteweyî a Xanî.

Ji ber hindê Helbesta li jêrê Koyî bi destxeta xwe li ser Memûzîna bavê Celadet dinivîse:

*Zemane resmi caranî nemawe, çiraxî nazim û minşî kujawe*
*Le dewrî ême roman û cerîde eger çi meqsed e;zanînî baw e*
*Eman, qedrê bizane em kitêbe le dinya êstekî hemtay nemawe*
*Le eyamî heyatî şêxî Xanî le ser nisxey xet ew nûsirawe*
*Le layî erbabî xoy bo qedr û qiymet xezîney gewher e,û kîsey diraw e*
*Le mecmûhî diwel;Soran û Botan le sayey em kitêbe nasirawe*
*Le kurdan xeyrî Hacî û şêxî Xanî esasî nezmî kurdî danenawe*

Danîna 'esasê nezma kurdî' li hêlekê; li gorî helsingîna Mîr Celadet Koyî Xanî'yê duyemîn e, û ew wî wiha dipesinîne:

"Ew jî weke Xanî bi derdê miletê xwe dişewitî. Şihir û qesîdeyên wî tev de li ser milet û welêt in. Şihirên Koyî sala 1925ê li Bexdayê di bin navê 'Komela Şihirên Hecî Qadirê Koyî' de hatine çap kirin. Hecî diwaneke mezin heye an hebû. Min dîwana wî dîtiye; bi destnivîseke hûr qederê 800 rûpel hebû. Hecî ji dîwana xwe di nisxe nivîsandi bûn; heke nisxeyeke wê tirkan şewitandiye, heye ko nisxa din rojekê bikeve destên min".

Dîwana ku qala wê têt kirin, bi ihtîmaleke mezin dê neketibe destê Mîr Celadet. Mîr jî yek ji wan kesan e ku hêjayiyek giranbûha dide şa'irên kurd. Wan bi qasî Birca Belek' weke kelebendên ku dê nerûxin dibîne, û di her delîveyê de bi gotarekê, bi şerhkirina helbestekê şairên kurd bi riya nivîsên ku di Hawarê de diweşin, bi bîr tîne.

Koyî'yê ku hê zarok ji pêsîra Gorqereçê vedibe, piştî sêwîtiyeke ne dayik e ne bav, dikeve nava pençeyên jiyana sext û dirinde. Ew, ji ber mebesteke ku em jê bêagahin, xwe li nav û spehîtiya Stenbola 'surperî' digire.

Lê; li Stenbola ku bi sed hêviyî hatiyê û xwe avêtiye himbêza wê, wekî 'sêwiyekî namoyî' vê malikê lê dike:

*Her min im êsta warisî Îsa*
*Bêkur û bêmal we bêjin mewa...*

Koyî'yê ji Koyê dûr li xerîbiyê bêjin, bêmal û bêkur; sala 1897 li Stenbolê diçe ser heqiya xwe. Wî li goristana Karacaehmed vedişêrin. Ji bilî dîwan û helbestên xwe yê wendabûyî- bi gotina Mîr Celadet hatine sotin- hê wan wextan bi çarînekê nîqaşa ku îro jî carcaran dikeve rojeva roşenbîr û nivîskarên kurd; di wêjeyê de bikaranîna zimanê serdestan, li cem xwe diqedîne:

*Kurdî axir bilê çîye 'eybî,*
*Her kelamî heqqe nîye 'eybî*
*Ya le gel Farisî çî ferqî heye,*
*Bo çî ew rast, bo çî em kemîye**

* Axir bêje bo min eyba kurdî çi ye
Her ziman heq e nîne eyba wî
Ya li gel farisî cudaya wî çi ye
Bo çi rast e yek, yê din kêmî ye

# *'Xasenezer'*

Seydayê min ê ku ez xwe weke şagirtekî ji dibistana wî dibînim, Cegerxwîn'ê 'mêlak û ceger bi xwîn', û 'mirî û mirîdê lêvên erxewanî' di helbesteke xwe de gotibe jî:

*...*
*...*
*Wezîfey xom her teblîxî kurd e*
*Le mirdû herçî dimîne nawe*
*Cegerxwîn gerçî seydayê kurd e*
*Ta êsta pesnî kesêk nedawe*[*]

di helbesteke xwe ya di heman dîwanê de, mîna ku xwe ji bîr kiribe, pesnê hemnivşekî xwe; Mele Ehmedê Namî dide:

*Namî, me ji nameya te zanî*
*Seyda yî ji bo melayê Xanî*
*Serbestir î ez Feqihê Teyran*
*Sed rengê Herîrî bo te heyran*
*...*
*...*
*Mehbûb tu yî der sera Medînê*
*Mem çû bi xelet seraya Zînê*
*Ger çendî niha li Til-şe'îrê*
*Yusif tu yî min tu xistî bîrê!*
*Lakîn tu misrê dil de şah î*
*Sahib elem î,xwedî kulah î*[**]

Belê... weke ku ji helbestnameya ku Mela Ehmedê Namî re şandiye

* Cegerxwîn, Agir û Prûsk, Wş. Avesta.

** Cegerxwîn, Agir û Prûsk, Wş. Avesta.

jî diyar e, Seydayê Cegerxwîn wesfê wî daye, paye dayiyê, ew beramberî Feqiyê Teyran kiriye!

Ev pesn, ne şabaşeke mitirbî ye û ne jî navtêdaneke beytûşe:

Yekî weke Cegerxwîn ku Medreseya Ehmedê Xanî qedandiye, û bi gellek helbestê xwe bi Melayê Cizîrî re bi rêya 'telmîh'ê ketiye heftûheştê, 'hikmetekê' nebîne di ristên hevnivşê xwe Ehmedê Namî de, zû bi zû ranebe nabêje 'Sed rengê Herîrî bo te heyran!

Weke helbestkarekî navsere yê vî zimanî, di gellek sohbetên dorteng de; li kafeyekê, li kolanekê, li malekê ...ku mijar û babet bûbe wêje, min bê dudilî dilbijokiya xwe ya bo vî an wî kesî/ê lêvandiye.

Mînak; dema ku min çîrokên xoşewîst Helîm Yûsiv xwendin, xwendinê pê re pê re kurmê çîroknivîsandinê di pêjn û pênûsa min de gerandiye!

Li gelek cihan min ev gotiye, û niha jî li vir gotinê dixim bin nîrê nivîsê: Ferhat Pîrpal yek ji wan kesan e, kiriye ku bi çîroka wî re derkevim geryanê, û xwe têxim şûna lehengê di çîrokê de.

Wan rojan jî min bela xwe di Bavê Nazê daye. Bavê Nazê, yê ku gotiye 'nivîskarî dana Xwedê ye'![*]

Mikûr têm: heta niha min çîrokine wisa realîst, raste rast qetên ji jiyana civakî, bi tevn û hûner û hûnerbazî... û bi jiyana civakê re evqas li hev, nedîtine.

Belê... vê pêle nexweşê Bavê Nazê me.

Lê... Lê; di nivîsa xwe ya bi navê 'Florttîstî an Forttîstî[**] de min gotibû, 'Ji ber ku em jî nivşek in: Rojen Barnas, Berken Bereh, Mem Ronga, Malmîsanij û Filît Totanî'yê ku Rojen Barnas bi xwe, û Arjen Arî'yê ku wê demê navê wî Behram Dara bû, weke 'Nivşê Tîrêjê' bi nav dibin, û em ji edebeke edebî û exlaqekî sermedî tên, heta niha min ne li pêş, ne jî li paş Rojen Barnas jê re negotiye Rojen!

Û min domandibû: Bi qasî ku evtişt dê mijara nivîseke din be, dixwazim vê bibêjim:

Dema ku min xwe radikişand rişmê hespê helbestê, ciwamêr

* Gotara M, Alî Kut, Malpera Nefel.

** Florttîstî an Fortîstî, Arjen Arî, Azadiya Welat.

xwedî xwe û dîwan bû; li hêlekê 'Mindalekî çar salî bû li kolanên Mehabadê, li hêla din 'Navê xwe dikola li bircên Diyarbekirê'!

Bi hatina 12ê Îlonê, 'bayê payîzê' wekî gellek kesan em jî kirin 'noka li kevir ketî'; her yek û pelek, her yek û kişwerek, û her yek û welatek...

Ku hûn li berhama Rojen Barnas ya bi navê 'Şi'ir'* ku ji hêla Weşenxaneya Nûdemê ve hatiye çapkirin, binerin;hûnê bibînin ku di derbarê jînenîgariya wî de tu agahî nîn e.

Diponijim û tê derdixim ku wî di timamê jîyana xwe de, xwestiye ne xwe; berhema xwe, afirîneriya xwe, hûnera xwe derxe pêş. Ji ber hindê jî bi salan e ku li biyanistanê, di 'xewletgeha xwe ya bêmîrnişîn' de dijî!

Di helbesteke xwe de gotibe jî 'Mêrxas hebûn, hevalo', evyek, eva ku kek Rojen hilbijartiye ne karê her mêrxasî ye.

Jixwe; li vê dinyaya ku pêşiyan weke 'siya darê' bi nav kirine, hew carekê em hatine rûyê hev; sala 2001ê li Stockholmê, li Kafe Nûdem.

Piştî vê serboriyê, sala 2005ê dema ku min ji bajarê Orebro ji mala Xuşka xwe telefonî cenabê wî kir, piştî sohbeteke dûdirêj, dawiya dawî ev gotibû: 'Min hevîrê xwe kir, û min nanê xwe paht'!

Nanê ku ji ardê genimê kurmancî; bi nişa, bi ekl û xweştahm e, li ortê ye.

Jixwe meriv bi 'pêrezeya' ku li dû xwe dihêle; an meriv heta-hetayê dijî, an jî; hima roja ku dimire, mirî ye!

Lê bawer dikim ku Rojen Barnas, weke şaîrekî îro jî, sibê jî... dê cihê xwe yê di 'milkê mîrnişîntiya helbesta kurdî' de bi mertalê helbesta xwe biparêze.

*Ezbenî, Xweda temenekî dirêj bide te.*
*Ji kerema xwe, dilê xwe megire ji 'ehlê nezer'!*
*Ji ber ku Seydayê Seydayan gotiye:*
*Mîrê ku bi navê Mîrîza ye*
*Mehza nezera wî kîmîya ye*

---

* Şi'ir, Rojen Barnas, Wş. Nûdem.

*...*
*...*
*Zengîn dikitin bi destê hîmmet*
*Hîkmet ew e nakitin çû mînnet*
*Ger dê wî nezer bida me carek*
*Îksîrê tewecciha mibarek*
*Ev qewl-i hemî dikirne eş'ar*
*Ev pûl-î hemî dibûne dînar*
*Emma nezera wî zêde a'm e*
*Lew xasenezer ji dil neda me*[*]

'Nezer' îro jî ne 'xasenezer'; a'm e, kek Rojen!

* Mem û Zîn, Wş. Hasat, 29.07.08, Amed, Arjen Ar

# *Di navbera du 'reş'an de 24 deq!*

Kî çi dibêje bila bibêje, bi min helbest ne qasekî; tibabekî bîr e!

Ku ne bîr be, helbest dê çawa karibe duh bîne îro, îro bi sibe, sibe bi siberojê ve ke...

Helbesta ku ji hêlekê de ji bîra xemên rojan e dertê û dixwaze bi xwepirkirinê xwe bi ser hev de; ji hêla din ve di erdnîgariya raboriya civakî de bi lêgerîneke takekesî li 'bîrên xitimî' digere, da xitimandinê bi serê darikê peyvê vepixêre, û vepixirandina deq bi deq derxe ber tava ravekirinê...

Weke deqên di dema zaroktiyê de, di hewldana dema vepixirandina 'bîrê' de, helbestkar ji nava vepixirandinan 'deqine vepixîner' hildibijê re, da bîr, bîra qedera hevbeş, weke 'Bîra Qederê' bi ser serê xwediyê xwe de nekumişe.

Gelek 'bîr' hatine xitimandin, û ew 'bîrên' bi destê xitimîneran xitimandî; 'bîra' serê qoqê qewmên kitm in.

Yek ji qesas-sedemên kitmî û jiholêrabûna qewman jî 'bêbîrî' û 'jibîrkirî' ye.

Helbestkar Lal Laleş, bi xebate xwe ya dawî 'Deqên Qesas' peyvê dike bêra vepexirtina 'bîra' me, û her deq'î, her deqê bîra jibîrbûyî' dixe dewla hişê me, û dike ku serê me geh li vî dîwarî bikeve, geh li wî dîwarî.

Ya seyr ew e ku her du dîwar, bi qasî ku dikarin bibin ser û binê bîra deqan, dikarin wekî du dîwarên ku li hemû deqan hatibin hev û nehêlin ji bîrê derkevin, ne jî di binê bîrê de biqeliqin, bilivin.

Pêşiyên xweşbêj çendî gotibin 'Me bext neda bi text' jî; Lal Laleş ji nava 24 'Deqên Qesas' 22 Deqan di navbera 'deqa bext û deqa text' de bi cih dike, û piştî Deqa Bextê Reş, me dadihêje binê bîrê:

*Me ji hespê hezkira wan hez kirin*
*Wan em ji zêrzemîna zêmara me kirin*
*Hespa Şê binefşê*
*Biborîne!*
*Me bi destê xwe hûn xistin ber erebeya şer*[*]

*Û şer hê jî didome, hem jî bi hemû dijwariya xwe.*
*Û ka kî zane ku dê çend şox û şepal têkevin ber erebeya şer?*
*Û şer hê jî mezintirîn bîr û birîna me û ya dijminê me ye!*

Lal Lalêşê ku di vê xebata xwe de berê xwe daye hêsan-vebirîna deqên birrîna bîrê; di birrîna bîrê de ji bilî Deqa Kawa; bi yê El Cizîrî, Xanî, Feqî re yê Celadet Bedirxan û birek hêjayên din, û zeman û jiyana rasteqîn a ku em niha tê de ne jî weke deq hildibijêre:

*Komeke ciwan, komek kal û çend sûtal*
*Li ber bedenê li ser kursiyan*
*Li lavlavkên bi sûran ve radiperilike dinihêrin*
*Li nik wan şeqşeqa tewla*
*Hîrêhîra hespên sedrencê*
*Ava sûsê memikê qîzê*[**]

Di nava deqên bijarte de, deqa jor deqek wisa ye, ku li cawê jiyînê vedaye, û jiyan debixandiye.

Li vir, deq xwe ji serwerdeqiyê vediguherin 'deqeke' li heyatê ketî.

Li gel hemû rengên heyî, rengin hene ku ji hemarengiyê wirvetir; li hev vedidin, hevdu didebixînin:

*Bî man, beyar man ew erdên adanî hê jî beyar in*
*Bavê min dibêje lawo! Ger îsal rehma xwedê hebe*
*Emê birakujiyê bizar bikin*
*Li dû xubarajotinên genim*[***]

Di bendedeqinan de Lal li gelek cihan bi yek ristê; hizirkûriyê, pirwatetiyê û wêneyekî berfere li ber cavan radixe:

---

* Deqên Qesas, Helbest, Lal Laleş, Wş. Lîs 2009.

** Deqên Qesas, Helbest, Lal Laleş, Wş. Lîs 2009.

*** Deqên Qesas, Helbest, Lal Laleş, Wş. Lîs 2009.

*Gava min her tiştê xwe wenda kir hingê her tiştê min çêbû*[*]

Piştî evqas tiştên wendakirî û çêbûnên çê û neçê, ji kîsî Mîr wisa bibêje jî; Lal sûretê axeke bîrbir wisa diwênîne:

*Helbestvên helbesta xwe avêt nav şerê kirêt*
*Aştî saz bû!*
*Ax ji kêfan kerr bû*
*Di destê axê de risteke helbestvên*

* Deqên Qesas, Helbest, Lal Laleş, Wş. Lîs 2009.

# *Dilê Xembar*[*]

Berî rabûna babelîska 12 Îlonê ye hevdunasîna min û helbesta Nazim: Ji Welatê Min Dîmenên Mirovan, Destana Şerê Rizgariyê, Em ê rojê zevt bikin!..

Wan salan, şairên herî bi nav û deng, yek kêm yek zêde ev in: Nazim, Ahmed Arîf, Enwer Gokçe, Hasan Huseyîn...

Çend ristên helbesta Hasan Huseyîn ya bi navê 'kurekî min dê çêbibe, ez ê navê wî bikim Temmûz' ji wan wext û dewranan de di bîra min de maye!..

Ji bilî yên ku di dema perwerdehiyê de:Yahya Kemal, Cahît Sikti, Orhan Welî... nav û jiyan û hunera wan bi me dane zanîn, weke xwendevanekî şi'irê, haya min ji Ulkû Tamer, Salah Bîrsel, Hasan Îzettîn Dînamo jî heye.

Gava ku dihizirim, tê digihim ku wê demê jî mîna aniha kêfa min ji helbest û helbestkariya nêzî helbesta gelêrî hatiye!

Erê karteka li dil û li ruh a şi'ira Arîf, bi zimanekî din weke 'me'ala' kul û êşan bû, lê cihê Nazim ê di dilê min de wê gavê jî cuda bû ji ber dengê wî yê bi qeb-qeb, qube... û mîna çemekî boş:

*'Hê ku wext heye gula min, hê ku wext heye,*
*Hê ku nerûxiyaye Parîs bi ser hev de tax bi tax*
*Pişta te bispêrim diwarekî ji van dîwaran*
*Û ramûsim ji devê te, gula min te ramûsim ji devê te...'*

Nazim zêdeyî deh salan ma di heps û zindanên wî welatî de. Di helbesteke xwe de dipirse ji Abîdîn Dîno:Tu dikarî bextewariyê biwênînî, Abidîn?

---

* Dilê Xembar, Zekî Kayar, Wş. Tevn, 2007.

Helbesta wî ya her rist pendek, her rist şîretek jî di bîra min de maye:

*'Tu bikevî hundir rojekê*
*Razî deh salan panzdeh salan*
*Belkî jî zêdetir...'*

Weke risteke kurwate, Nazim di cihekî helbestê de vê şîretê dike li yê ku têkeve hepsê:

*Di hundir de çiya bîne bîra xwe'!*

Ez jî gellek caran hatim girtin.Lê ne bi salan, ne jî bi qasî ku 'di hûndir de çiyan bînim bîra xwe'! Girtina min a ewil û hevdunasîna min û hepsê vedigere sala 1976ê. Bi dû re sala 1979ê; desteseriya 27 rojên di Tugaya Mêrdînê de...û piştre jî hatina 12ê Îlonê, û desteseriya 53 rojên li Girêmîra, Nisêbîn, Mêrdîn, û Diyarbekirê...

Lê tu rojan û tu wextan weke ku bên devê deriyê şa'îrekî, nehatin devê deriyê min: herdem bi tawana 'teroristiyê' hatim desteserkirin û darezandin!

Di sala 1981ê de ji ber vê gotina bi şik û gilî, 'Min fahm nekir; ez şa'îr im an qatîl im', 'hesab' ji min hate xwestin...

Jixwe yek ji diruşmên wê gavê, tije gefûref, û ku serê xwe li desthelatê kil dikir ev diruşm bû:

Roj wê bê, em ê hesap bixwazin ji we..!

Hesab hat xwestin... hem jî misqal bi misqal... hem dilop bi dilop, hem jî sal bi sal...

Niha piştî ewqas salên derbasbûyî, di hizûra we de heman pirsa Nazim ji Abîdîn Dîno kirî, ez ê ji Zekî Kayar bikim:

Tu dikarî suretê bextewariyê çêbikî, Zekî?

Zekî; xwediyê dîwana helbestan a bi navê 'Dilê Xembar', ji sala 1993yê ve di girtîgehê de li dû 'qedandina sûretê bextewariyê' ye. Bi eslê xwe ji Dihê ye, Zekî. Bi qasî ku şa'irekî ji medreseyê derketî ye, ne bîhn; bîhna bixûra helbesta klasîk jî ji helbesta Zekî nayê:

*Zêde xwe raht neke Delal*
*Ji bo paşdeanîna dîmenên dilgeş*

*Piştî te*
*Bagera karesatên gewre*
*Viqî vala kir*
*Aloleya gizikên ciwan*
*Bi anteroza sêguçeya bêxwedî ve*
*Li sûlaveke bêbinî wer bûm*
*...*
*Di buhara jiyaneke xeşîm de*
*Reftarên cuwaniya tiroleyî*
*Serî li min gerandin*
*Û ez bi temenê neseridî ve*
*Li derbendên talûke qelibandim.*
*"Heya ku min xwe nas kir,*
*Min temenê xwe xilas kir"*
*Bila hew vebêjin çîroka dilê xembar,*
*Di rûpelên peyamên dildaran de...*

Zekiyê ku dibêje' Heya ku min xwe nas kir/Min temenê xwe xelas kir' ji sala 1993yê ve ta niha ku di van 13-14 salên bihurî de ji vê girtîgehê birine ya din; niha di girtîgeha Sêrtê de ye.

Rêveberiya Girtîgehê (Lîcneya Xwendinê) bi gotina Zekî, 'bi navê neteweyê tirk' du sal e ku pirtuka Zekî nadiyê.

Zekî bi nameya ku ji min re ji girtîgehê şandiye, dixwaze balê bikşîne ser vê hêl û helwesta keyfî ya 'min kir, min çê û xweş kir' ya rêveberiya girtîgehên li Tirkiyeyê û li herêmê.

Min bi xwe, du dîwanê xwe rêkirin bo Zekî Kayar'ê girtî!

Ji vir ez bang li hemû nivîskaran dikim, ku pirtukek du pirtukên xwe ji Zekî re rêkin. Tika min ji hemû nivîskaran ku Zekî'yên girtî bêpirtûk nehêlin!

Bila 'Licneya Xwendin û Nirxandinê' a girtîgehê pirtukan nede Zekî; ew dê bi girtina her pirtûkê hê bêhtir bitengijin ji zimanê Zekî!

# *'Florttistî' an 'Forttîstî'?*

Du sê roj in dudilîtiyekê bi pêsîra min girtiye:Binivîsim,nenivîsim?

Binivîsim kek Cîhan dê bibêje, 'Arjen milê xwe bi nivîsa min giran kiriye'; nenivîsim, peyva 'flort' bi qasî min dê bibe pahr û pişka yên berî min: Ehmedê Xanî, Koyî, Cegerxwîn...û yên mayî.

Erê ez ne 'berdevkê' wa me; lêbelê ji ber ku Hacî Qadir'ê 'kurdûnde' gotiye, 'Le sayey şa'irekan babî kuran im!', ji destûra ku wî daye, ez jî xwe qurre dikim, û xwe bi ser neviyekî ji neviyên van 'bextesîyahan' ve berdidim!

Baş e ku ji bilî navê min navine din; yê Ehmed Huseynî, Rênas Jiyan, Kawa Nemir, Kejo, Rodî Zerya... û kek Berken jî lêvandiye, û li yek tûşê di wan re jî bihuriye: 'Nivîsa Helîm Yûsiv a di der barê Menaf Osman de nivîseke wanî ye. Banga Salihê Kevirbirî ya li S. Dilpolo bangeke wanî ye. Di van demên dawî de dengê Arjen ê ji bo Osman Mihemed heman tişt e. Nivîsa Jan Dost û nêziktêdayîna Dawid Rêbiwar a di der barê helbestên Arjen de heman tişt e.'*

Yek: Ji ber ku em jî nivşek in, û em ji edebeke edebî û exlaqekî sermedî tên, heta niha min ne li pêş, ne jî li paş Rojen Barnas jê re negotiye Rojen!

Bi qasî ku evtişt dê mijara nivîseke din be,dixwazim vê bibêjim, 'dema ku min xwe radikişand rişmê hespê helbestê, ciwamêr xwedî xwe û dîwan bû, li hêlekê 'Mindalekî çar salî bû li kolanên Mehabadê, li hêla din 'Navê xwe dikola li bircên Diyarbekirê'!

Kek Cîhan hineke din dikarin rabin bêbêjin, 'lêv ji diranan pêştir e!!

Pêştir be jî, lêv heta heta nikarin diranên 'kurmî', yê ku ne mîna

* Nîvîsa Cîhan Roj,Filortên edebî û şîrove,Malpera Diyarname.

libên birinca Qerejdaxê ne, weke ku gotina pêşiyan 'reş ke, dilê xweyî xweş ke' spî spî û birincî şanî hinekên din bidin.

Û edebiyat, ne meseleya 'mastê min'e:

Her wêjevan bênderekê bi ser hev de kom dike, û pirêzeyekê li dû xwe dihêle û diçe!

Hawldanên nivîskarên navborî- ku kêm zêde her yek ji wan xwediyê bênderekê ne û Cîhan wan bi 'flortkariyê' diricimîne, dikare xwe veguhere vê biwêjê:Dest dest dişo dest vedigere rû dişo!

Di dawiya nivîsa xwe de bixwaze mijarê hebekî bîne bi ser hev de jî, dixuye ku 'ben' ji destê wî filitiye, ku bi vê hevokê nivîsê kuta dike:

'Edebiyata bê şîrove û bê filort hinek dişibe siyaseta bê sosyolojî, berteng dimîne, di nav qaliban de dimîne, ji modernîzmê bêhtir xwî û xisletên kevnare yên teng bandor li dil û şêweyan dikin.'

Li benda jor, mebest ji' xwî û xisletên kevnare yên teng'; çavnebarî, dilreşî, dexsokiya kes û kûsan be; yên berî me ev tişt nekirine; hebe nebe nexweşiyeke vî nivşê 'xwedî kesayeta nû' ye, ku îro em pê dihesin, û kek Cihan radibe serê xwe li ser diêşîne!

Baş e...û pêşiyan gotine, 'serê ku neêşe ne tu serî ye'!

Li vir, bêyî ku serê we biêşînim, dixwazim bi bîra bixim, ku pêşiyan gotine, 'xir bi paçan mezin nabe'!

Elî Herîrî mezinê ewil e ku, mezinê mezinan, maqul û giregir, û 'kalê' me helbestkaran ê 5.emîn Ehmedê Xanî radibe dibêje:

*Ger dê hebûya me jî xwedanek*
*Alîkeremek, latîfedanek*
*İlm û huner û kemal û îzan*
*Şê'r û xezel û kîtab û dîwan*
*Ev cins biba li ba wî me'mûl*
*Ev neqd biba li nik wî meqbûl*
*Min dê alema kelamê mewzûn*
*Alî bikira li banê gerdûn!*
*Bîna ve rûha Melê Cızîrî*
*Pê hey bikira Elî Herîrî*

*Keyfek wê bida Feqîyê Teyran*
*Hetta bi ebed bimayî heyran*[*]

Ji ristên li jor dixuye ku, kalo ji şa'irên berî xwe haydar e, û bi vê yekê rûmeddar e.

Lê, li vir pirsek derdikeve holê: Pesn...ê kê, û çawa?

Herîrî berî Xanî bi çarsed salekî jiya be jî, berhema wî wê demê jî niha jî weke neynikê li rastê ye; û dîwana Cizîrî jî û helbestên Feqiyê Teyran jî...

Ji vê, em ji ku serî dinyayê rexnegirekî bînin, li ber berhema Herîrî rûnînin, ew dê dîsa nikaribe ji bihayê berhama Herîrî misqalî-zere kêm bike!

Niha, li gorî min 'flort' tiştek e, hez tişteke din e.

Edebî, ne edebî; peyva 'flortê' di hûndirê xwe de 'xwe bi hevşîrînkirinê', 'xwe bi hev şahîkkirinê', 'xwe bi hev ve sûtinê' dihewîne.

Lê hez? Hez ji dil e!

Bi qasî ku mîna kincên xilmet ên li Sûka Şewitî erzan bû be jî li vî welatî, hez nehatiye/nayê bazarê!

Di vê navberê de îddîaya teqez û mutlaq, weke ya H. Qadirê Koyî a ku tu rê jê neçe, tiştekî din e:

*Le dewrî ême roman û cerîde*
*Eger çi meqsed e; zanînî baw e*
*Eman, qedrê bizane em kitêbe*
*Le dinya êstekî hemtay nemawe*
*Le eyamî heyatî şêxî Xanî*
*Le ser nisxey xet ew nûsirawe*
*Le layî erbabî xoy bo qedr û qiymet*
*Xezîney gewher e, û kîsey diraw e*
*Le mecmûhî diwel; Soran û Botan*
*Le sayey em kitêbe nasirawe*
*Le kurdan xeyrî Hacî û şêxî Xanî*

---

* Ehmedê Xanî,Hemû Berhem,Wş. Lîs

*Esasî nezmî kurdî danenawe*[*]

Hecî'yê gornbuhişt- evqas car e ez diçim û têm Stenbolê min carekê fatîheyek li ser ruhê wî nexwend- raste rast xwe û Xanî dike 'danerê riknê nezma kurdî'!

Yanî...yanî weke tinazpêkirinekê, ku peyv zêde dibe li peyvê, carcarinan hinek dibêjin ya: Li gundê me du mêrxas hene, yek pisxaltiyê min e, yê din jî ma hewce ye navê wî bibêjim'?

*Ez jî dibêjim, 'Hecî ye, dibêje.*
*Cîhan e; wê bibêje'...*
*Ez jî karim bibêjim...*
*Lê...divê ez zanibim çi dibêjim!*

* Li Mala Mîr C.A. Bedirxan, F. Cewerî, Wş. Nûdem.

# *70 rûpel êş!*

Di nivîseke xwe de min gotibû, 'li şûna pezê pir man du kavirê kurr'!

Mebest ji bikaranîna vê peyva pêşiyan ev bû: Di kovara Tîrêjê de herûwer du sê şair û sê çar nivîskar hebûn, û ew jî bi hatina darbeya leşkerî ya 12 Îlonê re yê revî reviya; yê ma jî di heps û zindanan de raza!

Xwezî 'razan' tenê bûya:

Esat Oktay Yildiran'ê xwedayê tirsê bi segên xwe yên har î dev bi girrêz, bi qelas û dar û jop û serpozkên postalan nehişt ku şevekê jî yek ji wan girtiyan serê xwe bêxem deyne ser balgihê û têkeve xewa şîrîn, razên?

Ên li derve mayî, çendî 'filitî' bixuyana jî ji 'bobelatê'; tirsa wê siharê, wê sihara teng ya ku meriv kare bi 'weriyana pelên çinarê' bi nav bike, yê herî dilêr î leheng û berxwedêr jî ew saw bi salan bi vî rengî bi wî rengî hilgirt di dil û hinav û kûrahiya ruhê xwe de...

Di gel ku pênç şeş caran hatim desteserkirin destê min ji 'êşê' nebû; ne revî revî reviyam, ne jî bi salan di hepsê de mam!

Lê Berken? Berken Bereh?

Yekî qurre gotibe jî, 'şair ji roja ku ji dêya xwe dibe, şair e', Berken ne weke şairekî; lê weke şoreşgerekî, weke welatparêzekî çepgir hate girtin û bi salan di hepsa nasraw û navdar Zîndana Diyarbekrê de ma!

Wekî ku wî jî di helbesteke xwe de aniyê zimên û gotiye 'em ji nifşa êşeke perekende ne', bi rastî jî em di heman demê de, li heman welatî, bi heman şêweyê rûberûyên heman êş û azarê ne!

Û em – belku ez, belku jî em tev- ne li hêviya êşê; li bendî spêdeyeke zendspî, li hêvîya hilatina rojeke porroj bûn...

Û em, em nivşê zarokên xeşîm û naşî, û kite kit dilsoz, bi dilêrî û dilovanî li pawika şoreşê bûn!

Lê, şoreş pêk nehat, nebû:

Ji dêvla pertewên rojeke sor, di spêdeyek devteng de 'roj reş' hilat û 'êşa şoreşê', ya axê, ya rojê, ya dil, ya hêviyên şikestî... li tevî rayên bedenên me bi ser sênga weletakî de herikî:

*li kûrahiya şeva bi şehwet diherike*
*neçarim li ber serê êşa xwe*
*dûr im ji xwe qasî stêrkan,*
*pîr im li vir bi qasî çiyan*

*sêwiyek im, ji bilî êşê kesekî min tune*

Berken di dîwana xwe ya nû 'Şîna Helbestê' de weke 'kesê li ber serê êşa xwe', nola birîndarê bi birîna xwe re bikelime tikûtenê li ber tahtekê, bi dilovaniyeke şairane êşê rist bi rist, peyv bi peyv, kite bi kite li tayê tizbeha semaxê dixe:

*min dilê xwe bar kir li helbesta êşên xwe*
*bêyî bitirsim daketim mexzenên vê heyata hov*
*bi hêminî dawerivî ji dîrokê çîrokên kevnare*
*bi dilşadî mexel hat şeva sar, tûreya hişê min*
*herikîm, wenda bûm li nav vîzîniya bayê sar*

Di 'herikîn' û 'wendabûna di nav bayê sar' de, 'di dilê wî de tofanek evîn', di hişê wî de mehrîcana xewnên ronak', Berken derdikeve rêwitiyeke mezin:

*di dilê te de tofana evînê*
*di hişê te de mehrîcana xewnên ronak*
*noqî bager û bahozên rêwitiya gewre bû yî*

*te bi destê rêwiyên kor girt di tunelên şevê de*
*qala delaliya berbangên nebînayî kir li terazinan*
*wek keştiyeke bê al bihurî li deryayên bê perav*

*tenê evîn bû her dem di tûrikê te de*

*ne axê ne derya ne esmên tu hewandî*
*ne tu bişirî li ber felekê*

*li xwe mikûr were, şairo*
*dema bar kirinê ye ji zozanan!*

Li ser rêya 'rêwîtiya gewre ya bi bager û bahoz' ji bîr nake, dizane ku evîn navê' qulzema êşa' me bû! Û dizane ku ev qulzem navê welatekî bi xwe bû: li tevî asikan, qitikan, qulingên koçber; refê kewan, qeflên kevokan qesta dilopek ava wê dikirin û dihatin...

Lê em dereng pê hesiyan ku êşên xelk û alemê yek in dudu ne; yê me hê di pêçekê de bi şîrê diya me re dikeve xwîna me, bi peyvên her lorîkê re dinizile ruhê me, û bi her nehwirandinê re hê di dergûşê de me derdixe rêwîtiya êşkêşiyê:

*li wir biheje çiqilek darê*
*ez li vira dicemidim*
*dilerize dilê min î rêşele yî*
*xew li min diherime.*

*li wir ba bialêse çiyê*
*dicefile gewdeyê min*
*dicefile helbesta li bin balgîfê*
*bajar di şevê de wenda dibe.*

*li wir stêrkek bixurice*
*li vir dihelim mîna mûmekê!*

Kî nebû şahidê xuricîna stêrkan? Û kî neveciniqî di dema xuricînê de? Û kî, kî dikare bibêje mûm mûmdankê jî bi xwe re nasojîne!

Her evîn evîndaran diwestîne.

Evîn; siya me ya ku em li dû, û wê dev ji me nediqeriya...

Evîn; li ser rêya me rewrewka ku geh wenda dibû, geh dixuya...

Li ser kîjan kahniyê em rawestiyana têhn têhn, tî; bi qasî nanê

tenûrê û mewîjê Torê di tûrikê me de li gel seriyek penîrê sîrik; evîn qatixê me bû:

*stêrkeke xwînşîrîne her tîpeke navê te*
*her ku ez wan bi bîr tînim*
*bi îsîn diherikin çemên bextewariyê*
*gulên zîvîn vedibin li bexçê dilê min*

Kesek nizanibe jî, evîn pê dizane ku em babaderwêşê zimanê xwe û yê navê evînê bi xwe ne. Û dizane ku tiliyên me, tiliyên me yên ku dê li ber neynika siharê di nava porê yarê de bibûna şeh; ne têr-tije çûn ser tetîkê, ne jî bi têra xwe rahiştin çeka giran: Pênûsê!

Lê dîsa jî, geh 'derwêşkî' geh bi xetkêştiyê em bûne êşkêşê êşa xwe.

Berken, li gel êşkêşiyê, êşê dike êşdanka êşa xwe, bi nav dike û helbest bi helbest, rûpel bi rûpel li me belav dike bi diwana xwe ya dawîn 'Şîna Helbestê'*:

*wê raweste ev êş*
*wê hilbe ji nû ve tav*
*ev demsala hov, ev oqyanûsa reştarî*
*wê binexşîne rûyê esmên*
*êşa natebite di hundurê min de*

*dê bibişire bihar li bexçê*
*li zeviyê genim har û dîn*
*evîn zaroka herî çeleng û şîrîn*
*û nan û biratî û bextewarî*
*wê mîna dildarekê ramûse*
*rûyê xweşik ê heyatê*

Dîtina 'rûyê xweşik ê heyatê' jî êşek e; piştî êşkêşiyeke dûdirêj!

* Şîna Helbestê, Berken Bereh, Wş. Doz, 2008.

# *Gotin*

Omer Dilsoz, Omerê bi qasî paşnavê xwe ji mêlakê dilsozê nivîs û xwînerê xwe beriya romana 'Neynika Dilî, diwaneke helbestan bi navê Bila Gotineke Me Jî Hebe* weşand, û gotina xwe bi rêya nivîsê, bi şêweyeke çak, bi ramanek pak; di newaya stiranekê de ji me re vegot.

Weke gotina her nivîskarî gotina Omer jî 'gotegot' bû û ji ber ku berî nivîsê; berî ku Hamûrabî gotina xwe li ser berdê reş bide neqişandin, berî ku xetkêş Dastana Gilgamiş gotin bi gotin hilgirin ser qahfikên kîlî, û berî Mûsa'yê mizgîndarê 'axa wahdkirî' li Tûr î Sîna berzûrî Rebê xwe bibe û bibêje 'Xwezî niha ev peyv yek bi yek ketibûna bin nîrê nivîsê'; ya her kesî gotin bû û gotin hebû...

Weke gotina her kesî hebû, gotineke her nivîskarî/ê jî heye ku dibêje, û vê gotinê, berhemkî bispêre refikeke geliyê zeman...

Zeman; lehiya ku ketûber her tiştî; qirş û qal, husn û cemal, can û mal dixe ber devê pêlên xwe û li ber xwe dibe; pê re gotina herî pîrozwer, ya herî efsûnkar û watedar jî ji devê jêderketî

digire û berê wê dide rêya çûn û nehatinê...

Gotin ji roja ku bi lêv bûye û hatiye gotin, di hêlana zeman de di hêlikanê de ye...

Zemanê ku her tiştî sersam û sewsî dike, carinan bi sêhra gotinekê serî li wê bi xwe geriyaye, û wê, yanî zeman gotinin mîna pitikên di pêçekan de bi delalî, xwedî kirine, mezin kirine, kirinê mal û milkê her zemanî...

Zeman însan bi xwe, însan ji bo xwe ew ji hev dariştibe û navê rojan, yên meh û salan lê kiribe jî; bi tu rengî nekariye rişma wê ragire, biwestîne, wê li cihekî bisekinîne...

---

* Bila Gotineke Min û Te jî Hebe, O. Dilsoz, Wş. Berçem, 2006.

Ji ber vê 'şûmiya zeman' em li cihê xwe rawestin, di germahiyeke heyva pûşperê de bo vehêsaneke hênik em pala xwe bidin siya darekê û vekevin; dîsa jî, zeman, li derveyî me, bêyî me, digel me diherike, kêlî bi kêlî me ber bi sînorê tûnebûne ve dibe...

Digel ku weke 'wendayîyên' ji nava me 'wenda', yên ku îro jî her şemî li Amedê li Parka Qada Beza Hespan, hûrûgir bi dilekî mişt hêvî, em li 'wend'a û 'wendayiyên' li nava xwe dipirsin û digerin; zemanê dermanê her birînê, ji newala gotinê gotinan vedize, xef bike û hinan berze bike jî; zemanê devgur, zemanê ku her tiştî mîna patozê dicû, dihêrifîne û hûr hûrî dike; bi tiştekî nikare: Bi hêza 'gotinê!

Gotin çi bi rêya gotinê, çi bi rêya nivîsê hebû/heye/ dê hebe.

Bi qasî destnîşankirina teqez ya li jor, evçend eşkere ye ku gotin jî dimire!

Bi qasî ku dimire, û weke her bûnewerî pahra mirinê ye; gotina çak, gotina resen, gotina delal, gotina ciwan...weke vê gotina pêşiyan,' Ga dimire çerm dimîne, mêr dimire nav dimîne'; di gelek qonaxên dijwar re dibihure û qesta me dike...

Ev qest xwe li nemirtiyê girtin e!

Jixwe her nivîskar bi qasî hêza şûrê ku bi gotinê li zeman kişandiye, serî li zeman û dewranan hejandiye, û berê peyvê xwe daye konaxên bêdawî...

Gotin an ji jêderka mêjî mişt aqil e, an jî her nuqit ji qulzema ji hezê, ji kahniya dil e.

Gotinên ji kahniya dil gotinine tîhnegerm, nermehevrîşmîn û fûrek in.

Her gotin, her gotina ji dil bayê baweriyê û delaliya newayî hildigire, û mîna sureke nesîmî; şek, hênik, tenik tenik diwirwire, û weke çivîkê ku ji hêlinê bifire û qesta şaxa darê bike, wisa firok, fûrok, û bîhn-şimamok e...

Weke vê bendehelbestê:

*Lûleper*
*Li beyarekê, li taldeyeke veder*

*Bi kîjan êşê vedihewînî bêhna xwe*
*Ji kîjan keserê,*
*Ji kîjan rondikê,*
*Ji kîjan dilopa xwînê;*
*Ji dilê kê diniqutî?*

*Lûleper...*
*Êşan nede der*
*Ev, taldeya veder*
*Ew, wargeha bêserober*
*Ev, rûgeha rengqemer*
*Ew, dilgeha birîn bi xencer...*

*Lûleper*
*Demsal di nava demsalê de, li çaleke bêbinî*
*Kêliyên herî watedar dinixumîne*
*Kêliyên ji temenê evîna min a talankirî*
*Evîna min a bizmêk lêkirî*
*Evîna min a di nava wan kêliyan de jibîrkirî**

*...*

* Ji heman dîwanê helbesta bi navê Lûleper.

# *Serkîsof*[*]

Di riya ku çar salan, her sihar tê re diçûm û her êvar tê re dihatim, sihar ekê, sihara rojeke têrbişirîn li xwe warqilîm ku sed gavekî dûrî riyê, li naverasteke nîvxewle, çar xaniyên bi hişkeberê ava, mezrayek heye.

Wê keliyê dîmenê ku bi ber awira min ketibû, mina kelemekî di çavên min rabibû û kiribû ku vê pirsê ji xwe bikim: Di çar salan de çi kiribû ku heyîna van çar xaniyên nîvkavil ji ber çavên te bireve?

Vê pirsa min ji xwe kirî, heta dawiya riyê, mêjiyê min di nava gerîneka bersivan de tevizandibû, û vê lêgerînê kiribû ku serê min bibe petixekî dewibî!

Soxî, min ji xwe re got, 'her rêwitî koratî ye hebekî'!

Ne koratî bûya di çar salan de min ê çawa nedîtibûna her çar malên ji hişkeberê lêkirî, di ber û li rex hev ristik?

Koratî ma ne xitimîna bîrê ye jî pirr, hindik?

Ji wê rojê de, her gava ku risteke helbestekê dikim rê û li serê dibim rêwî; kopalê koratiyê datînim rexekî, hemû paceyên girtî ên hest û dilînan vedikim, û paşê ferşê ser devê bîrê didim aliyekî.

Lê bîr, di geliyê bîranînên kêlîkî de gellek caran meriv sernişûvî têwerbûnine din dike. Ev sernişûvbûn ne nokbûna binê 'bîrê' ye pirrê caran; li yek tûşê di ber 'bîrê' re bihûrîn e!

Di bîrê bibihurin jî; bîr, bîra wê kelîkê ser nixumandî; wekî çavpêkatina min û pê re dîtina xaniyên ji hişkeberê, serban ax, bi derî û pace, bi şirînek û sifirne; ristên helbesteke bîrkol di rêwitiyeke di nava erdnîgariya helbestê de dikare bîra jibîrbûyî bike ku bikeve bîra me.

---

* Selpakfiroş, Kawa Nemir, Wş. Rewşennameyê, 2003.

Helbest bîr e jixwe! Bîreke li gel hest û dilînên ji me dûrketî, hizr û têramîn û tahmijînên jibîrbûyî jî dixê bîra me.

Ku ne ji bîrê be, mirov bi xwe jî cendekekî xwîn jê kişiyayî, termekî sik î sar e.

Bîr, me yê ji herikîna jiyana xafil, dijîne û vedijîne.

Û em bi saya bîrê, bi saya bîra ku me dixe hêlekana zeman û me doş dike, di nava bîrên rabirdû û dahatû û kêlîkî de diçin û tên... Bo mînaka bîritiya helbestê, Kawa Nemir bi helbestên xwe yên li ber dest geh me di bîrên dûhî werdike û noqî bîrên binîdem dike, geh jî bîrkêlîkên jibîrbûyî dixe bîra me ya îro.

Helbesta bi navê 'Serkîsof' –ku yek ji wan helbestên ku ez jê hez dikim e– mînaka herî sereke ye.

*li deştên dipdirêj hespên çargavî*
*difnên wan hilma tivingên Kurmancî*
*qerpûzên vala, bêhnefişk misk û emberî*
*ji kîjan çaxê dibezin, dibezine kîjan dastanê*
*Derwêş lê hiştin, bi xwînê şûştin herasa meydanê*
*li deştên dipdirêj dîroka çargavî*
*li nava du tiliyên min Cixareya Biharê*

*dikişînim, wezê nemirim, sozên min hene hê*
*yek, çiya dikevin bextê min*
*yek jî, katjimêraSerkîsof a kalikê min*
*dest hişkehişk li bijiyên kuriyên bayî*
*çawa jî şevekê ji çiyayên Pinyanişî rabûye*
*hogiro, lo zar û zimanê mino*
*di bêrîka êlegê min de ye mîrata te hê*
*neviyên te welatekî qerisî li serên xetan*
*serma dikin, min hembêz bikin kuliyên berfa zarokatiyê*

*zivistan'im çîrokên min di binê berfê de*
*çil sal e dizivire, dizivire Serkîsof*

Serkîsofa mîna ku siwarek rişmê hespê ragire û bixwaze bisekinîne; bi zeman re sercotik dibeze ha dibeze...

Bi vê bezînê re Kawa bi Serkîsofê me di kîjan bîrê werdike?

# *Portre*[*]

Mîna ku barê dinyayê tev li ser piştê be, milên wî xuz in. Bi sih û du diranan bikene jî xemgîniya salên ku li yek tuşê bihurîne û li beyara rûyê wî hiştine û çûne, wenda nabe. Bibişire jî hurik hurik, ew hindik caran dikene. Yê ku nedîtibe jî, bi çavlêkitina ewil re, ji meşa wî ya sivik î ling li dû ling, ji çenteyê wî yê mîna turikê şivanan timî bi milên wî ve daleqayî, ji gijola porê wî yê ku berfê hûrik hûrik lê kiriye û riha wî ya mîranî, meriv dê tê derbixe ku wênesazek e. Heta vir, we nas nekiribe weyê navê wî bihistibe. Behsa Fewzî Bîlge dikim. Fewzî Bîlge'yê ku –kêm zêde- her kes wî wekî wênesazekî nasdike.

Min jî ew wekî wênesazekî nasdikir. Lê vê dawîyê min dît ku firçe, boyax, tuwal, keval, wêne, suret, reng têrî Fewzî nekirine, kela wî bi wêneyan neşikestiye; pênus kiriye hespê bezê, lê siwar bûye û berê xwe daye deşta wêjeyê, zewiyên çîrokê.

Wî bi berhema xwe ya ewil 'Jidilara' 'pêlava xwe avêt nava pêlavên çîroknûsên kurd.

Di pêşangeha li Amedê de min jê re got, 'Fewzî ez ji te aciz im, bira'! Fewzî li ser vê gotina min, bi şik pirsî bû, 'Çima mamoste'? Min ev bersiv dabûyê: Minê çîrok binivîsandina...te berî min nivîsand, te xweş nivîsandiye, ji te aciz im, bira!

'Aciziya' min li hesabê Fewzî hatibû, ku wê kêlîkê di bin simbêlan re bişirîbû.

Li hola Şaredariyê di bin seqaya pêşengeha wêneyan de min kêfxweşiya xwe diyar kiribû û min gotibû, 'Min berhema te' 29+1'[**]

---

* Portre, ji dîwana 'Têbiniyên Bajarekî Wêran, F. Bîlge, Weşanên Belkî, 2011.

** 29+1, F. Bilge, Çîrok, Weşanên Belkî, 2005.

xwend. Ziman heta tu bibêjî herikbar e. Wêne ji ber xwe ve tên ber çavê meriv. Vegotin şek e, şahîk e. Hin çîrok kurtik, du hevok in. Baş e...ez ji te aciz nebim, kî dê ji te aciz bibe, Fewzî'?

Wekî gotina pêşiyan 'dîkê çê di hêka xwe de bang dide'; xuyaye ku Xweda ji bo afirandinê ew daye dinyayê. Ne wênesazî têrî wî dike, ne jî çîroknûsî. Di kovara Çirûsk de dema ku rastî helbestine wî hatibûm, min ji xwe re gotibû, 'ev kur bi fereafirîneriya xwe ya warê di wêne û wêjeyê de dê bike ku em tev ji afirandinên xwe şerm bikin'!

Digel vê ku ew evçend afirîner e, ew wisa jî nefsbiçûk e. Li xwe nanihe ku wesfê xwe bide, rutbe û payeyan bi xwe ve ke.

Vê pêlê, min berhema wî ya dawî, –li Navenda Cegerxwîn wî diyarî min kir– dîwana wî ya bi navê 'Têbiniyên Bajarekî Wêran'* xwend û min xwest ji dîwanê çend helbestan bineqînim bo antolojiya Bakûrê Helbestê/Antolojiya Helbesta Bakûr'. Helbestên di dîwanê de kirin ku ez li hev biherbilim. Her helbesta ku min xwend ji min re got, 'min hilbijêre'! Bi rastî min nema zanî kîjan helbestê hilbijêrim, kîjanê bihêlim. Heke hûn jî dîwanê bidest bixin û bixwînin, hûn ê bibînin ku Fewzî wênehelbesta xwe ji çarçoveya kevalê derxistiye; welatek, axek, êşek, evînek, bajarek kiriye peyve-tuwal; dilê xwe kiriye firçe û di nava boyaxa 'bîrê' dakiriye û rengekî sor daye helbestê... Di vê xebatê de peyvên ku tu caran neyên bîra helbestkarekî û her helbestkar nikaribe wan di ristê de bi cih û bi wate bike: rîtm, rîtûel, replîk, fregman, praksîs,fîguran, pastoral... peyvên ku hew û bi tenê Fewzî Bîlge dikare wan biêxe nava ristê û jê rengexelekên wateyî bispêre 'bîra' me, aniye pê.

Sê çar helbestên di dîwanê de 'posterhelbestan' bixin bîra meriv jî; helbesta Fewzî rêçşikandinek e, rêçdagerandinek e ji ser rêça helbesta berdest a li bakûr.

Li ser vê rêçê, her helbest 'kêlîbîra niha' û a raborî û dahatûyê bi hev ve dike û bergeha helbestê ferewantir, peyvê watedartir, ristê risastir, awaza helbestê senfonîtir dike, Bi kurtasî Fewzî helbest veguherandiye wênehelbestê:

---

* Portre, ji dîwana 'Têbiniyên Bajarekî Wêran, F. Bîlge, Weşanên Belkî, 2011.

*Destên min tenê li deriyê dilê te dixe*
*Serhildanên serjêbûyî rengên min tev sor kirine*
*Xezaleke spehî ji çeka xwe pê ve bi tu kesî re ranezaye*
*Li peravên xeyalên xwe bi ramûsanan ji xwe re welatek ava kiriye*

*Ez wênesazekî şêt*
*Li dû serhildanê serjêbûyî*
*Bi dû şopa delaliya te ketime*
*Çirûskên çavên te yên kesk mirarkî ji sihî bihurîne*
*Xeyalên te utopîk,yên min Spartakusekî qelender*
*bi xaçê ve çarmîx bûne*

*Ez wênesazekî bikêrnehatî beredayî*
*Di fona wêneyê te de min welatê te newênandiye*
*Li min bibuhure*
*Di rûyê te yê rojhilat de çav li ava ne*
*Di şara te kesrewan û deqdeqî de firçeya min gurrî bûye*
*Dest bişike, ji min bimîne, tenê rûyê te diwênîne.*

*03.08.2011*

# *Helbest: ya her kesî*

Bo bernameya helbestxwendinê mêvanê Y.N.Kurd Tayê Duhokê bû. Wî jî mîna min dabû nava salan.Yanî mîna min ew jî navsere bû. Çavên wî yên di nêva serî de reşik î hûrik, bi dilsozî li meriv dinerîn. Bi qasî ku tayelibên spî li zeviya rûyê wî şîn hatibûn, İçmo'yê şa'ir esmerekî xwînşîrîn bû! Vê xwînşîrîniyê dikir ku meriv zû hogirî wî bibe. Jixwe wilo jî bû:

Li hewşa Yekitiya Nivîskaran, destê wê êvara havîna ber bi payîzê de hênik, İçmo* bi dengê xwe yî 'xeneqotkî' û newaya 'xweşxwan' a helbestên li dû hev, mîna dilê min dilê gellek beşdarên li qaê(hewş) amede, şa û hênik kir. Helbestxwendina İçmo –Seyda Cegerxwîn di gellek ristan de navê helbestê weke 'xweşxwan'ê hildide– ne dişibiya ya çi helbestkarên ku heta niha min helbesta wan xwendibû, an guh dabû dengê helbesta wan: İçmo ne dixwend; distira.

Vê helbeststirînê, wê kelîkê xiste bîra min, ku li Amedê, di sohbeteke li ser piyan Abdulla Peşêw gotibû, 'Bakûrî ji şi'irê re dibêjin helbest,em dibêjin xundrewa'. Yanî? Yanî ravekirina bi xwendinê/xwendina rave kirî. Xwendina ravekirî ji serdema rîtuelên kevnekone ta bigihe ayînên îro miqambarkirina li peyvê ye.

Sêhra peyvê bi sêhra deng re bi sêhrtir bûye, ku li tevî Qur' an'ê xwendina hemû pirtukên pîroz, diayên ku tên kirin, lavayî û berzûrî, li tevî bangdanê bi miqam in. Gellek mela ji dengê xwe yên xweş bêhtir, bi miqamê bangê balê dikêşin bi ser selayê de. Jixwe ji cureyên helbesta klasîk qesîde û xazel jî bi miqamekî xweser têne xwendin.

Ji xwendina qesîdeyên derwêşên kurd em tê derdixin, ku qesîde li gel amûreke muzîkê –defê/erbaneyê- hatine xwendin.

* Ferhad İçmo.

Bi baweriya min, qesîdeya Mele Şexmûs 'Can... can... can...' îro jî têrî dike ku merivê ne sofî û ne mirîd jî bi surr û cizbê bikeve...

Pêwendiya muzîk û helbestê ne hewceyî destnîşankirin û ravekirên cudwel be jî; bi her helbestkarî re her helbesthez dizane, ku di navbera helbest û newayê de pevgirêdaneke xurt, têkiliyeke zexm heye.

Ew têkilî bi sê şeweyên jihevcuda derdikeve pêşberî me:

1. Xwendina helbestê a helbestkar
2. Xwendina helbesta teatrel
3. Xwendina xwênerê/a helbestê.

Xendina helbestê a helbestkar bi du şêweyan e:

1. Xwendina bi dengê kêlîkê
2. Xwendina bi dengê lêbarkirî

Xwendina bi 'dengê kêlîkê' lêvegerina dema/kêlîka nivîsîna helbestê ye. Ev şêwexwendin xwedînewa û miqameke xwe î xweser e, ku helbestkar her helbesta xwe bi yek miqam-newayê dihoyîne. Ji vê şêwexwendinê re meriv dikare bibêje xwendina bi dengê dil jî. Jiboney; di kêlîka xwendinê de, dil dibe mîna amûreke muzîkê, û dijene. Ev jenîn mîna mizreba di destê sazbend de, peyv li têlên dilê helbeskar dide, û dike ku peyvên helbestê nola notayên stiranekê miqamdiyar ji gewriyê derbikeve...

Ev şêwe resentirîn şewêxwendin e û bo her helbestkarî/ê derbasbar e.

Bo vê mînakê meriv dikare du helbeskarên tirkî wekî mînak bide: Ahmed Arîf û Nâzim Hikmet.

Li layê din, rexnegirin wekî qelsesistiyeke di navbera helbestê û helbestkar de şîrove bikin jî; xwendina bi dengê lêbarkirî ew xwendin e, ku helbestkar ne bi dengê kêlîkê, bi newayeke din, bi dengekî bi dû re hatî peydakirin, helbestê bixwîne.

Wekî ku me li jorê jî got hemû kitêbên pîroz bi dengekî pîrozwer hatine/têne xwendin. Heman 'pîrozweriyê' bi şêweyeke ji şêweyan xwe hilgirtiye xwendina helbesta klasîk... Ji ber hindê, li Îranê helbest hê jî li ber newaya şîmşalê/bilûrê, an jî neyê têne xwendin. Û jixwe

miqamekî her xazelê, yê qasîdeyê, yê çarînê heye, ku ra û rîşalên wê ji serkaniya berî hezarên salan avê vedixwin.

Bo vê şêwexendinê, ji helbesta kurdî du navdartirîn navdaran wekî mînak meriv dikare hilgire dest: Ehmed Huseynî, Şêrko Bêkes.

Herdu xweşhelbestkar jî- bi qasî ku helbesta serbixwe û bendazad lêdikin, dema ku dixwînin, helbesta xwe ya xweser û serbixwe dişikînin û mîna ku beyte-ristên qasîdeyêkê bixwînin, helbesta xwe wisa bi dengçêjî, sermestî û konenewayî dixwînin. Li hêla din, biqasî ku ji heman ekolê tê, Abdula Peşêw berevajî Bêkes bi 'dengê kêlîkê' helbesta xwe pêşkêş dike.

Xwendina teatrel: Meriv dikare navekî din jî li vê şêwexwendinê bike: Xwendina demrîtûelî. Ji ber ku xwendevan- ew dikare leyistikvanê şanoyê an jî kesekî dengraveker be-di kêlîka xwendina helbestê de li gel deng bi dest û pê, çav û awir û hemû mîmikên pêdivî, helbestê raberî temaşevanan dike. Ev şêwe, li gorî têgihiştina kes a ku ji temayê/naverokê werdigire dikare cuda û veguherîner be.

Xwendina xwîner: Em dikarin bibêjin şêwexwendina herî azad e ev şêwe. Ji ber ku her xwendevan di seqaya kêlîka ku tê de dijî,- bi ser dengê hûndirîn ê ku helbest vedihewîne vebûbe venebûbe- bi dengê xwe yê hûndirîn(bêhiska) an jî derkirî dikare bixwîne. Û ew, bo her xwînerî têt guhertin. Bi qasî ku têt guhertin, evyek bi biservebûna dengê helbestê ê hûndirîn û lêguhdarîkirina şêwexwendina helbestkar re- dikare veguhere, bibe dengê helbestkar bi xwe...

Û, jixwe helbest bi qasî ku ya helbestkarê/a xwe ye, ew ya herkesî ye!

# *Hilmek jiyan*[*]

Wekî her tiştê zindî û bi jiyînê ve girêdayî, bi ziman re wêjeyê jî bi pêlên veguher, berê xwe daye nûjentiyê û di qonaxên xweguher re derbasî qonaxin din bûye.

Ev pêl û qonax li hin der û deveran berîya veguherînxwêziya siyasî, civakî, desthelatî; di destpêka pêngava hêzên vegurînxwaz de wekî amadekirina bingehekî çandî pêkhatibe û bi têkoşîna siyasî, bîrdozî û civakî re sercotik meşiya be; li hin deveran jî ji ber zext û fîşara desthelatên zordar, bi astengî û qedexedariyê re rûbirû bûye, fersend û delîve nedîtiye ku xwe veguhere delavin din, û veguherîna ku dihat xwestin pêk were...

Ji ber giringî û giranbûhayiya ziman, hişmend û aqilmendekî têkoşer gotiye, 'rizgariya netewekî di heman katê de rizgariya ziman û çanda wî ye'![**]

Vê destnîşankirina diyarker, meriv dikare wisa jî biguhere: rizgariya ziman serxwebûn û biserxwebûna çanda neteweyekî ye û ev yek rasterast rizgariya wî netewî û wî welatî ye.

Li ser rûyê gerdûnê, welatekî bêziman û netewekî bêçand heye?

Bi vê pirsê ve girêdayî, di sohbetên li ser piya û bernameyên derbarê ziman de herûher vê mînakê didim: Mirov û dar yek in! Dar bi ra û rîşalên xwe ve bi axê ve, mirov bi zimanê xwe ve bi civat û axa welatekî ve girêdayî ye. Civata ku bi zimanê xwe neaxive dişibe 'daristina' bivir miselitî ra û qurmên wê bûyî! Heke hûn nexwazin 'bivir' we kit kit bibirre û heke hûn nexwazin Kurdistan bibe çolistan, bîrdoza we, bîr û baweriya we çi be bila bibe; li zimanê xwe xwedî derkevin!

* Bendek ji helbesta 'Hilmek jiyan', Sînan Sutpak, Girtîgeha Elbîstan.

** A. Cabral.

Xwedîderketina li ziman xwedîderketina li hemû hêjayî û giranbuhayiya mirovî, civatî, û netewî ye.

Mirovê ku bikaribe xwe ji bo azadiyê bide kuştin an jî bikuje, li hemberî azadiya zimanê xwe çawakî kare bêxem be, bi sersarî tevbigere!

Bi taybetî, di vê serdema ku li serê çiyê di bin şert û mercên zordijwar de her şerker, bi coşa zarokê elîfba di stû de, xwe fêrî zimanê xwe dike?!

Şertên îmanê şeş bin, şertê mirovbûnê li gel şert û erkên din, hima bêje yek e: Ziman

Ziman, di çavên Xweda de ne evçend giranbûha bûya, pirtukên pîroz bi zimanê qasidan nazil dikir?

Ji vê; her pêximber bi qasî ku qasidê Xweda ye, ew, qaside zimanê xwe ye jî.

Ji ber vê baweriyê ye, Xanî'yê ku bi sê zimanan: erebî, farisî, osmanî dizanî; xwest bi kurdî bibe 'qasidê 'zimanê qewmekî çarkenar!

Qewmekî ku 200 sal e bi gir û înad dixwaze xwe ji çarkenariyê rizgar bike; piştî şikestin û şewişîn û sergêjiyan be jî, dît ku li gel çekên din 'çeka ziman' jî çekeke 'neteqandî' ye...

'Teqemeniya' ku li tevî Xanî, her nivîskar li hêviyê ye ku di bazara kurdî de dengvede, li pawika 'Godot' rawestiyayî dest li ber rû be jî; van salên dawî, 'Wêjeya Zîndanê' bi hewldana kesine ta ebed cezeya zindanê li temenê wan hatiye birrîn, derdikeve ber 'rewacê'.

Li gel vê rastiyê, ji ristegazindên 'girtiyên' wekî Sînan Sutpak, em tê derdixin, ku ziman; wekî li der, di hundir de jî 'serêşa' kesên di ber azadî û rizgariya wî welatî de girtî ne.

Cihê xweşhaliyê ye, ku di 'hundir' de rêjeya nivîskarên ku bi kurdî dinivîsin û berheman didin, her ku diçe zêdetir dibe.

Wejê, –çi di hundir de çi li der– di hêtên jiyanê de pace-vekirinek e. Xasma bo yê di hundir de!

Bihara ku her kes dipê hê nehatibe jî; nivîskarê girtî êdî ne wekî Fatma Sawcî li ser pelên çixareyan; li ser kaxizên wekî çarşefan fere, bi destxeta xwe helbest û çîrokên xwe dinivîsin û wan ji hundir derdixin der.

Ji berhemên ku têne çapkirin û yên ku ji min re tên têderdixim, ku wekî pêla Hawarê, nifşê Tîrêj 'ê, cîlê Rewşenbê; bi saya 'nivîskarên zîndanî' têgehek din dê li wêjeya kurdî zêdê bibe: Wêjeya Zîndanê!

Ji girtîgeha Sêrtê heta bigihe ya Dîlokê, ji ya Elbestanê bigire heta bigihe ya Kirikkaleyê; hogir û hevrêyên ku demekê di qada siyasî/çekdarî de, di nava tevgera azadiyê de cih girtibûn- ku hinek ji wan di 15-20 saliya xwe de hatine girtin, di girtîgehê de rih û por spî kirin- bi afirîneriya xwe ya di hûndir de dê hilmeke nû, çêjeke nû hilgirin wêjeya kurdî...

Bi taybetî bi helbestê:

*Nepirse ji min, beşişîna te bi xwe ye jiyan*
*Her ku dilê min seh dikî, şahî dilwelidin*
*Hilmek jê hêviyên hilbeyan,*
*Hilmek jê hîvrona viyanşo*

*Nepirse ji min, tême bextê te*
*Ji awirînê têrbûna çavan û hêviyên ji raborînê diherikin dil e*
*Xemgîniyan bi qurtek şadî/viyanan bî... û viyanan bi ava zemzemê*
*Dibexşîne hilmek jiyan/ji birîna viyana kana dilzîz*
*Xem û dilgiraniyan bi dilgeşiyê re dike berberî...*

*Etarê hilmekê me*
*Qetek jê salên bêhnhesin ê zingarî*
*Qetek jê rengdîwar/neyîniyan bi zinaran de werdike*
*Hilmek jê qurtek hibir, evînê diniqutîne ji pênûsê rebên*
*Ku wateyê ji hêmayên çarbend biguherîne*
*Dîwar çavnebar, dîwar zikreş û dilxincik*
*Hêvî çavên li ê, hêvî taştêya evîndarî***
*Hilmek ji dijberan pêkhatî, hilmek jê daristana bejn û balên pîroz*
*Di qurtek avê de, di qurteke beyaniyê de, tim car di tava rojê de*
*Vexwarina çilkek xwîdana te ye hilmek jiyan*
*...*

*5.05.2011*

# *Tu tî, ez tî...*

Yên ku teyr difirîne bask bin, ya ku meriv hildifirîne hez e.

Weyê jî hez tahm kiribe: Lê ne weke ku hûn gezekê li sêvekê bidin, an jî porteqalekê biqeşêrin û bi sihûdu diranan tî û birçî biçinê: bi çavlêketinekê re wendabûna di du deryayan de, di hembêzekê herî bi têhn û bîhne-emberîn de bi raketinê; li taxekê, li kolanekê li ser pêya bi çend gotinên ku bi heyvan di guhên we de kiribin zingînî...

Û hûnê wê kêlîkê heta dawiya temênê xwe, heta ku çavên we bi axê şa bibin, ji bîr nekin!..

Bibêjin, dilê ewil kê ji bîr kiriye ku ez ji bîr bikim.

Û kê kariye ji bîr bike axa li dû xwe hiştî?

Û pêsîrên dê, yên ku me tevan birçî birçî mijtiye..?

Hima bêje ji roja ku meriv ji ber sêngên dêya xwe vedibe û pê ve, serancama mirov û lêgerîna li hezê destpêdike. Xasma; piştî şikestina her hezê; li der li dûr li nêz...meriv li wê têhna germ ya piştî jişîrvebûnê jê bêpahr mayî, digere.

Heza ku hez bi me tahmijandî ye ev hez; û em, piştî her derza li dil ketî dixwazin xwe bavêjin bextê wê hezê, û dilê xwe î 'şikestî', 'birîndar' pê bikevînin.

Di çîrokeke xwe de Hesenê Metê dibêje, ... 'Ku îro jî dayê bi hîkmeteke îlahî ji gornê rabe û ez wê bibînim, dibe ku ez wê nasnekim lê ku ez wê bêhna pêsîrên wê hîs bikim, ez ê bibêjim dayê ev e!..'*

Bîhna stêlmên dayê li hêlekê; li ser rêya Vardoyê di kêlîka bi şid û leza bayî ku tu siyarê diajo, ji nişkê de tu li çav ya ku te çavên wê ji zû ve wenda kirine bikevî, siyara te dê çend teqla bavêje, Hesen?

* Hesenê Metê, Kovara Çrûsk, Jmr. 1.

Hez jî weke gelek tiştan, weke nexweşiyeke bêderman dikare serî li merivan bigerîne!

Navê wî nadim, hevalekî min ê di wan serdemên ku em li hêviya 'şoreşa di berbangê' bûn; rojekê nameyekê ji dildara xwe dişîne, dibêje, 'Heta wê rojê, wê roja ku her tişt bi navê me ji nû ve ava bibe...' Û, cuwanmêr evîna dilê xwe rûbalî/taloqî piştî 'şoreşê' dike!

Wê gavê jî mîna niha min gotibû weeyyy li minê!

Li vir, ezê çîroka mêrikê ku gotibû, 'na willeh weyyyy li minê; kerê min çû li tevî barê minê' bihêlim careke din, û ezê dagerim ser mijarê:

Ya ku Hesen di gerînekên çîrokê de lê digere 'bêrîkirin' be, ya din xwezî ye, hisreta ku kesî nedî ye!

De ka...kê bêrî tahm nekiriye, kê hisret nekişandiye, Hesen?

Kula xelk û alemê yek be, yên me 'bêwelatan' yek ji sedî ye:

Zilm, zordarî, bindestî, bêmafî, birçîtî, koçberî, zindan, berxwederî, serhildan, têkçûn, hêvî, şikestin, rabûn, ketin, mirin, kuştin, xwekuştin, xerîbî, dûrî, bêderfetî, bêwelatî, mişextî... û tî û hey tî...

Û kekê min Helîmê bi qasî navê û zêdetir helîm radibe di 'Dema ku masî tî dibin' de dibêje:

'... Tenê ez dizanim Masî li welatekî Ewrûpayê ku nedixwest kesek navê wî zanibe, kolan bi kolan digeriya. Hewa wan welatan sal diwazdeh meh mîna hewa zivistana welatê wî bû, lê yê wî havîn bi ser de hatibû. Xwêdan dida û mîna ku tiştekî xwe wenda kiribe dimeşiya. Bi xelkê re dipeyivî. Xelkên van welatan mîna xelkên welatê wî, tê nedigiştin ka çi dibêje,yan çi dixwaze. Li wan kolanan her dem zimanê wî ji devê wî dikişiya:

*--Ez tî me, tî!'**

*Kî ne tî ye?*
*Kî, ne bi qasî masiyê j' avê derketî ne nehişî û ne tî ye?*
*Û kî ye ne tiyê welêt, tiyê dayê, tiyê yarê?..*

* Dema Ku Masî Tî Dibin, Helîm Yûsiv, Wş. Lîs.

Wey li min ê di ‘deryayê’ de tî, wey li we yên li çiyayên têrkanî, û li ‘qeraxê welatan’ tî!

Û wey li tiyê me yê ewilê ewil jî:

*...*
*Disojim suhfê mektûbê, bi emrê yar û mehbûbê*
*Dema dil dim bi metlûbê, didem ez dîn û îmanê*
*...*
*Bi zulfan hate ser xalan binefşa tîtek û alan*
*Dil û canê me ebdalan dibit dîsa di talanê*

*Di talanê ku sed ser çûn, hezaran genc û gewher çûn*
*Dilê sed pare kerker çûn, tu Xanî bes ke efxanê!*[*]

*29.10.08, Amed*

* Ji Xanî bo Mem Qewdek gul, H. Mem, Wş. E.K. ya Stenbolê.

# *Ji min re helbestekê bixwîne*

Korê ku li ser perê riya pirê her roj li heman cihî destê xwe vedigire û ji yê ku diçe û tê re dibêje, 'ji bo xatirê Xwedê li vî kwîrî werin rehmê', bi saya şairekî, wê rojê nizane pereyan têxe ku!

Şairê ku dilê wî bi yê kwîr dişewite, li ser kaxizê hevokekê dinivîse û wekî fermanekê bi sînga kwîrî ve dike: Bihar tê û ez ê nebînim!

Çend biharên me-nedîtî hatin û çûn...

Yên ku çûn; yên ku bi fermana paşeyekî berê wan ket riya çûn û nehatê, hê bihar neqediyayî, di wextekî ku xecxecok* mîna birînên wan gewez gewez vebibûn; di heyveke nîsanê de bi şûnwarên xwe re naqosên dêrên xwe, cîranên xwe û bihareke çilmisî li dû xwe hiştin û çûn!

Her çûn/çûyîn di hundirê xwe de dilînên 'bi şûn de vegerekê' vehewîne jî, ew ên 'çûyî' nema çav li bihara li dû xwe hiştî ketin!

Ne li dû wan be jî, şair piştî 'têkçûyînekê' wiha gotibû:

*Ey felek, bo te dinalim bo çi nergiz çilmisîn*
*Ew çima bextê me hoye, em bêdost û bêkesîn***

Niha jî ji 'bêdostî' û 'bêkesî', ji bêrojiya bi şev roj; li tevî nêrgizan xec jî, lîloz jî, binefş û beybûn jî hatine sînorê çilmisînê, di nava çar dîwaran de!

Seredanekî Tewfîk Hêja*** bi 'pîvazterkan' re qevdek nêrgiz bişîne jî jê re; ew, neynûkên xwe dike bizmar û wêneyê bihara ku Rahşanê gotibû, 'Ez diçim bibim Newroz'; bi xêzên bizmarî wisa diwênîne li ser hîmên betonî:

---

* Stiraneke M. Şexo, Helbest: Dr. Bedirxan Sindî.

** Stiraneke M. Şexo, Helbest: Dr. Bedirxan Sindî.

*** Tewfîk Hêja, Şerker û helbestkarê Girtî, Zîndana Bolu, Tîpa F.

*Xewnên rewan û zirziyên jiyanê*
*Têkel hev bin di mista êvara Newrozê de*
*Dê jê pira di navbera Amed û Zapê de bizê*
*Dê jê xewnereşkên gurebozan*
*û girnijînên xwe dirêjî endekoyan dikin*
*Endekoyên xwe dirêjî hinarokên yaran*

*Erê, Newroza serhildanan*
*Erê, rûmet û azadî û xelasî*
*Erê, min ji kevirên kolanên Amedê ramûsa*
*Lê ez di bextê de me*
*'maçek bide min yar'*
*Ez di bextê te de me*
*bila ji serkeftineke hişk î hol*
*xwîna Newrozê neçe*
*'maçek bide min yar*
*cejna te pîroz e'*[*]

Heke hûn rahijin dîwana Tewfîk û dest bi xwendina helbestê bikin, hûnê bibînin ku ji ber çi û çima hinekan gotiye, 'Helbest qîrîn e'!

Piştî Ehmed Huseynî sewta herî bilind e sewta helbesta Tewfîk Hêja. Ew, wekî ku ne ji zîndanê, ne ji pişt çar hîm û deriyên hesin î dubask; mîna rêwiyekî berî li ewran, li serê sukra çiyayekî berê xwe bide beriyê û biqîre; her ristê dike dengvedanek:

*Çû û bû Newroz*
*Çû û bû Newroz*

*Û porê xwe yê şahmeran*
*Hişt ji Amedê re*
*...*
*Îro ji A Me Dê ji min re helbestekê bixwînê!*

*28.04.2011*

* A me dê, Tewfîk Hêja, Wş. Aram, 2011.

# *Hinekî ziman, hebekî wêje*

Ziman bi deng, bi kite û bêje, bi risteduristkerî û hevoksaziya xwe ve; di hizirîn, axaftin û nivîsandinê de diyardeya herî sereke ye di berhema/ên wêjeyî de.Yek berhema hûnerî nîne, ku têkiliya wê bi ziman, şêweya bikaranîna ziman, şikl û şêwaza vegotinê re tunebe. Her berhema zimanî –devkî an jî nivîskî– ne di asta wêjeyî de be jî, ew berhemeke zimanî ye.

Li gel vê taybetiya ziman a di wêjeyê de, ziman ferebazneyek e ku çanda her neteweyî hembêz dike ye jî. Û ew wekî saziyeke navendî ye. Ji ber hindê, em çandê dikarin wisa rave bikin: Di prosesa pêşveçûna dîrokî û civakî de tiştên ku têne pê, pêkhatina her cure nîrxên maddî û manewî, û bi hemû derfetên destûrdar ragihandina van nîrxan bo cîlên siberojê, pîvana serweriya mirov ya li ser surişt û civakê...

Ji vê pênaseyê/ravekirina li jorê jî diyar e, ku ziman, û ber û berhemên jê teşegirtî: wêje, alavên ku dikevin nava bazneya çandê dene. Ji ber vê taybetmendiyê jî, heta ku ziman û wêjeya civatekê neyê xwendin, neyê helsengandin, em nikarin di derbarê çanda wê de nirxandinekê bikin.

Li hêla din di warê zanistê de, felsefeyê, derûnnasiyê û hwd. de ziman di berhem û bermayiyan li vî rexî, di rewşeke navgînî/alavî/hacetî de ye. Ji ber ku di zanistê de ya girîng, biservebûna rastiyê ye û lêkolînên di vî warî de hatine/têne kirin in. Di felsefeyê de raman be diyardeya sereke, di psîkolojiyê de rûdanên derûnî, di resmê de xêz û reng; di muzîkê de newa û deng, di peykersaziyê de şikl û fîgur; di endazyariyê de avadanî û estetîk, –ji ber ku xîtabî çav dikin– diyardeyên girîng in.

Lê di wêjeyê de?

Di wêjeyê de ziman, ne hew û bi tenê alavek e: avahî, avakarî, şêwe û şêwaz, kewn û kemilandin û bi watekirana berhemê bi xwe ye.

Bi kurtasî em dişên bibêjin: Wêje hûnereke zimanî ye. Ji lew, şêweya herî pêşketî (di berhemên serkeftî de) a zimanekî jî di wêjeya wî de dikare were dîtin. Wekî mînak, em dikarin vegerin dev Ehmedê Xanî'yê ku dibêje:

*Hasil, ji 'înad, eger ji bêdad*
*Ev bide'te kir xilafê mu'tad*
*Safî şemirand vexwarî durdî*
*Manendê durê lîsanê kurdî*
*Înaye nîzam û întîzamê*
*Kêşaye cefa ji boyê 'amê*[*]

Wekî ku ji peyvên 'nîzam: Teşe, pergal û 'întîzamê: Teşadayî, pergaldar, bi rêk û pêk jî diyar e, wêje, bi her berhema wêjeyî zimanekî ji rewş û reng û durvê li ber dest, hildigire û hildikişîne asteke bilindtir.

Ev asta bilind a ziman, bi navê zimanê wêjeyî dikare were binamkirin.

Her zimanî di serdeminan de berhemine ku 5 hezar sal in têne xwendin, lê mîna ku berhemine îroyînbin hê jî me bi spehitiya xwe ya zimanî, bi hûnandina xwe ya bedewî xîtabî hest û derûnê me dikin hene.

Evyek, ne ji kevnitiya berhemê; ji hêza bikaranîna zimanê wê têt!

Ji vê encamê; qewm li tevî şop û şûnwarên li dû xwe hiştî qirr bibin jî; wêjeya wan –di qahfikek kîlî de, an jî li ser qeteçermekî/papîrusekê– li şûn wan dimîne.

Li vir wekî mînak Dastana Girgamêş were dayîn.

Ji Girgamêş û qewmê wî kitek nemabe jî li ser van axan, dastan bi xwendina bi zimanên din, bi her xwendinê vedije, zindî dibe.

Û pê re, leheng û cihê bûyer lêrûdayî bi her xwendinê re me vedigerîne zemanên konekevn, dem û serdemên di gelî zeman de rawestiyayî.

Bi hêviya ku zimanê evçend xwedî genciniyeke dewlemend, zimanê kurdî, bi aqûbeta zimanê Sumerî rûbirû nebe!

---

* Mem û Zîn, E. Xanî, Wş. Lîs.

# *Li Zagrosan*

*Hûmayûn im serê çiyê weten e*
*Gerdûnê seyr dikim,her der çemen e*
*Na mal heye ne milk ne jî saman*
*Ku ez bimrim per û baskê'm kefen e*[*]

Hemedanî'yê 'per û bask kefen' bi zimanekî re wêjeyek jî bi per û bi bask kir, û çû!

Ew çû, lê wî çarînin wisa 'pirrperî' û 'baskfere' li dû xwe hiştin; îro jî hestên merivî li ser çengên teyrê helbestê siwar dikin û berê meriv didin ger û geşteke ku tehm li ser zimanê merivî bimîne, meriv jê têrnebe!

Wêjeya ku bi saya serê serkêşên wekî Ûryan mil dispêrê hîmê hezar sal berî niha, di şert û mercên zortund û dijwar de, geh di nava sînorên mîrektiyekê de bi serberzî, geh li xewletgehên xef û xewlecî bi xetkêşiyeke ku îro jî dilê merivî bibijîne xwe...û geh jî; ji ax û xwîner û pêaxivên xwe dûr, li biyanistanên sar bi dillerizîna zarokekî sava xwe bi piyan xist û bi berhemên ku îro her yek stûnek e, avahayî peyva kurdî ragirt, û wekî perestgehek be li ber piyan hişt!

Di vê 'perestgehê' de her nivîskar 'perest' û 'pastar'ekî zimanê xwe ye.

Ew, vê 'peywir' û 'pastariyê' bêyî ku destûrê ji hinekan bixwaze; mîna leşkerê di şerekî de rahije ala aldarê li erdê ketî, peyva ku diviyabû 'ala wê li banê gerdûn hatibûya daçikandin'; bi her berhema nû bilindtir dike, berztir dike.

Rûspîkerên wêjeya ku heta dûhî berhemên wê yên zimanî ji sedî heştê helbestbûn; îro li der û li hundir 'sefar'ên rûspîker ên romana kurdî ne..

---

* Baba Tahir, Wergera S. Kara

Di Festîvala Gelawej de piştî ku Zahir Rojbeyanî babeta xwe ya li ser' Romana kurdî li bakûr' pêşkeş kir, ez jî rabûm û wekî têbinî-agahiyekê min ev got: Çar xelekexakên romana kurdî hene: Qafqasiya, Rojhilat, Başûr û biyanistan...

'Bav'ê romana kurdî kî dibe bila bibe; eyan e ku îro zarokên bi her şêweyê li 'bavê' xwe zêde dikin, hene.

Li vir bêyî ku di babeta romanê de 'zêdegaviyekê' bikim, ez ê raste rast dagerim ser navê romannûsekî nû: Mahabad Felat Arda.

Wekî nivîskarekî ne nasraw be jî, wî bi romana xwe ya yekem Zagros û Zerdeşt, ji welatekî dûrî welatê xwe, bi romana xwe pê li axa welatê xwe kir.

Jixwe; nivîskarekî ku kurd be û welatê xwe neke welatê romana xwe, heye gelo?

Wekî kes Mahabad çendî dûrî me be jî; tişta ku pê re jiyaye û li dorê qewimiye: rûdanên di mal, malbat, civat û welêt de... mîna yekî ji me û di nava me de be; dibîne, dijî û pêşkêşî me dike.

Heke hûn jî bixwazin derkevin rêwîtiyeke rê-ji-ber-we-windabûyî, hûn dikarin romana Zagros û Zerdeşt wekî 'nexşeriyekê' deynin ber xwe û berê xwe bidin heza di navbera du birayan; Zagros û Zerdeşt de.

Di dawiya rêwitiyê de di şiveriyeke çiyayên wî welatî an jî li newaleke kurr, hûn li mirina birayekî bi destê birayî; Zerdeştê bi destê Zagros hatî kuştin rast werin, ji bîr mekin ku birakujî hê jî birakuj e li ser van erdan:

Keleşa zerdeşt hîn di dest de bû, lê berê namlûyê êdî li erdê bû. Agir bi sînga wî ketibû û xwe berî nava laşê wî dabû. Ji bo nekeve, pala xwe da zinêr û li nav çavên pêşmerge nihêrî. Pêşmerge di cihê xwe de sar bibû. Hîn keleşa wî di destê wî de û berê namlûyê li Zerdeşt bû, lê ew jî ketibû şokê, nedizanî çi bike. Zerdeşt hew li ber xwe da û li ser çokên xwe ket erdê, keleşa wî ji destê wî ket,tenişta wî hîn li zinêr bû. Pêşmerge mîna ku ji xeweke kûrr şiyar bûbe, hat bîra wî ku keys a Zerdeşt bû, lê wî ew nekuştibû. Qirînek pê ket:

--Hey waaaxxx li min, min çi kir![*]

*20.04.2011*

---

* Zagros û Zerdeşt, Mahabad F. Arda, Wş. Lîs, 2011.

# *Mirina xweşik*

Zarokekî ji hembêza dayikê bike!

Bikî; tu ê bibînî ku ne destê dê ji zarokê dibe, ne yê zarokê ji yê dayikê diqete.

Welew biqete/bêtqetandin jî destên wan ji hevdu, çavên dayikê heta xirrîna mirinê di gewriyê de bixilqe, li zarokê digere.

Wê kêlîkê, heke çavê dê bi zarokê bikeve, bi bextewarî ruhê xwe dispêre destên rûhstên.

Gelek mirov hene, li ser doşeka mirinê çaverêyê zarokeke xwe ne.

Demên wisa di seranserî jiyana mirov de demên herî pêjnoker in. Mîna ku dizanin kengî dimrin, ku destê xwe ji hatina zarokê şuştin; awirên wan mîna du pirprînkên baskşikestî li valahiyê dialin û bi wê hisretê koçî hêla din dikin!

Zaroka ku nagihe ser çaverêya xwe, vêya wekî poşmaniyekê heta dawiya temenê xwe di hinavên xwe de hildigire.

Ev poşmanî, hebekî be jî naşibihe hisreta merivê ji axa xwe dûrketî?

Ax jî, wekî dayikê ma ne hem hembêzek e, hem jî pêçekek.

Zarokên ji ber dawa diya xwe bi piyan ketî, bi qasî ku 'dayê' nedixwest jê dûr bikevin; hinin ji wan rabûn çûn çûn, di sînoran wernebûn?

Di vî temênî de, bi qasî ku bostek axa min nîne li ser vê axê, bo çi destên min jê nabin, û ez jî wekî zarokin wê nikarim pişta xwe bidimê û biçim û hey biçim?

Gelo, gotina min a 'her şair dişibihe axa xwe' bû bela serê min..?

Nizanim...van deman ji xwe re di ber xwe de dibêjim, 'tu li ser vê axê jiyayî, ma tu nemecbûrî li serê bimrî'!

Min ê ku wekî gellekan 'jiyîn' hilbijart li serê, difikirim û didim ber bala xwe: ji bo lêvegerê, lêvegereke bi rûmet û bi helamet, yên ku mirin hilbijartin û xweşik xweşik mirin, ne hindik in!

Zanim; mirin ne xweşike û mirina xweş nîne!

Lê, li ser van axan mirina hinekan wisa xweşik, wisa xweşik e, meriv dike şair:

*berxikên berdûş*[*]
*zû ji dergûşên xwe bi dûr ketin*
*di çardehsaliya xwe de*
*ji çekên çardederb çak hezkirin*
*di bîstûçar saliya xwe de*
*–hê tayekî spî neketibû porê wan–*
*mal şûr*
*talde cercûr*
*milk şikeft*
*û gor şikart hilbijartin*
*birayên min wisa xweşik mirin*
*wisa tahm stiran mirin*
*hûn bibînin*
*hûn ê ji kêfa bimirin...*

Tilîliyên diyeke l' ber kêla kurê xwe yê li dû yara xwe, li dû azadiya pêşanebûyî 'mirî', ma ne mirineke ku meriv li dû ji kêfan bimire ye?

Ji ser vê axê pê ve, li ser kîjan axê mirin bi nemirtiyê, peyv bi heza mirinê hatiye tahmandin?

De, bihizirin... helbesta li jêr bixwînin... û paşê bersiva pirsa min bidin:

*min ji te hez kir*[**]
*pirr pirr pirr*
*dibû pirpira çivîkan li her qefesê*
*û te li ber firê çavên xwe kil dikir*

---

* qesîda qedexe, janya, Rênas Jiyan, Wş. Doz.

** mirî mirî, ev çiya rûspî ne, A. Arî, Wş. Avesta.

*reş bûn ji xwe*
*zivrrzivrr, kevanî*
*reştir dibûn bi kilê suphanî*
*her evîn bi navekî binav dibû*
*û te, di dilê xwe de azadî xwedî dikir*

*min ji te hez kir*
*li dû her koçberiyê pirrtir*
*û gelekî ji xwe,ji gelekî gelektir*
*her ku mirina kevokan dihat tu jî dimir*
*baz xayîn ketin Sarya min*
*min ji mirina te hez kir!*

*06.04.2011*

# *Şabaş ji bo şaira di zîndanê de!*

Di roja helbestê a cîhanê de nivîskarê navdar ê rojnameya Radikalê, Yildirim Turker, ku dikare pênûsê xwe biêxe herdu çavên dinyayê, piştî ravekirineke durûdirêj, hatibû ser kartekeriya helbestê a li ser derûnê mirov, û gotibû, 'Helbest...ew xwevederîna herî xweşik û nazenîn...xwezî min bikaribûya helbestek bi tenê binivîsiya...'

Di destpêkê de, daxwazeke bi vê şêweyê a nivîskarekî ku bi pênûsa xwe nanê xwe ji tehta hibrê derdixe, ez şaş û metal hiştibûm, û bibû sedemê bişirîneke di bin simbêlan re...

Lê, piştî ku hinekî ramiyam û hate bîra min, ku gellek nivîskar û romannivîseran ji ber 'bêkêrkêriya' xwe – bi taybetî yên kurd- dev ji helbestê berdane û dageriyane bi hêla taxa pexşanê ve, wê gavê, bivê nevê min heq da nivîskarê Redikalê ê ku di ber nivîsê re porê xwe spî kiribû.

Beriya 'xweziya' Turker kurdan gotibû, 'bi xweziya dest nagihin keziya'!

Mêrxasiyê bîne bîra meriv jî; ji vê peyvê em têderdixin, ji demên berê berê ve, di nava kurdan de şabûna mirov a bi jinê, destavêtina keziyê, ango mistdana porê wê ye.

Evyek tê wateya ku kurdan nirxeke giranbuha bi jinê dane: Hingavtin!

Bîhneke 'pederşahî' jê were jî; qelenê ku kurdan bo jinê xwestine, di destpêkê de girîngî û giranbuhayiya jinê ye; ne wekî bazareke kirîn û firotinê...

Di gel ku ev mijar ne babeta vê nivîsêye, lêbelê hey ku peyv ji peyvê vebûye divê ez bibêjim: Bi îslambûnê re, qelenê ku giranî û

hêjayiya jinê bû di çavên civata kurd de, ji ber nêrîna erebkî a eraban a li jinê, û pê re ruwangeya îslamî a derbarê jinê de –ku hê jî piştî kera wan jina wan tê– wekî kirîna malekî, jin kirin alavê bazarê, ê kirîn û firotinê!

Kêlîkekê; dinayaya malkir û malperest ji bîr bikin, û paşê bihizirin û bi nêrîneke din nêzî vê gotina gel a ku hê jî rojane ji devê hinekan dertê, bibin: Ev jin bi qasî giraniya xwe hêjayî zêr e'!

Li vir di vê gotinê de, ji ber ku herkes 'zêrî', dê wekî 'alavê' dewlemendî û maldariyê, ne wekî diyardeyeke hêjayî û peydakirina wî zor bibîne, jîn jî dê wekî 'alavekî' kirîn û firotinê were dîtin!

Lê na! Jin ne têt kirîn, ne jî têt firotin!

Îro jî, di vê serdema ku her tişt 'alav', her tişt pere ye, jin dikare were kirîn wekî laş, wekî beden... Lê wekî ruh? Hez û jidilbûna wê? Ya lêbanîn û jidilşabûnên wê?

Çawa ku hez nayê bazarê, û bazar bi dil re nabe, heza jinê hezeke wisa ye, ne hewceyî tu wê fetih bikî; ew bixwaze 'keleh û bircên xwe dirûxîne, ew bixwaze wekî sifreyekê heza xwe li ber te radixîne, ew bixwaze agirê şoreşê bi bedena xwe û jiyanê dixînê...

Jixwe, jin findek e ku ne şev; roja meriv bi xwe ronî dike.

Ji bilî jiyanê; wêjeya bêjin ma ne 'savara' rijî ye?

Di nava dengê evqas mêr û nêr de, dengekî din ê jinê, ê jiyanê, ê dê û mê, ji zîndanê dertê, tê ku me bi jinbûna jinê bihesîne:

*şerma pêşî şîrheramî ye*[*]
*şê û şêbiskê hûre*
*şahidbûn li şiliya çava ye*

*nalînê destpêkê mirin bixwe ye*
*jana destpêkê*
*gavavêtina ber bi jinbûnê ve ye*
*ne ber bi jînê ve*

* Ji dosyaya helbestan a bi navê 'Gulîbir', Şevêşa Şêro, Girtîgeha Bolu

*ger ku jinbûn jiyan be*
*ez hîn keç im*
*na, ku jinbûn jan be*
*ez êdî jin im!*

Li welatekî ku diruşma 'jin, jiyan, azadî' têtberzkirin, ez dibêjim tu bi xêr hatî nava jiyana helbestê!

Û dibêjim, 'şabaş ji şa'ira di zîndanê de, şabaş!

*13.04.2011*

# *Kaya Kevn*

Pêşiyên min ên ku ev 50 sal e min çand û zimanê wan ji xwe re kiriye mebesta jiyînê, rabûbin û gotibin 'kaya kevn nedêrin' jî, ez ê vê nivîsê bikim melhêb û 'kaya' ku Ozdemîr İnce ji zû ve bi sura bayê xwe dêrandiye, dîsa û ji nû ve ez ê bidim ber weryana bê!

Zanim, bayê ku kurdî kurdî biwere, ji vê 'kaya' li ser bêndêra Ozdemir İnce dê 'qilçixinan' jê bivirvirîne û bi ser çavên hinekan de bibe!

Bila...

Pêşiyan gotine, 'serê ku neêşe ne tu serî ye'!

Ozdemîr İnce di qurçika xwe ya di Rojnameya Huriyetê de wisa nivîsiye:

'Pirsgirêkine girîng yên şair û nivîskarên esil-kurd ku hemwelatiyê Tirkiyeyê ne, û xwe bi tirkî îfade dikin hene. Ev pirsgirêk di demên pêş de dê kêm nebin; ji kêmbûnê wirvetir dê zêde bibin'.

Çi rê û bijartineke din ji bilî ku bi tirkî binivîsin nebû ya şairê mezin ê kok-kurd Ahmed Arîf û nivîskarê esilkurd Yaşar Kemal! Lêbelê ji herduyan jî, bi taybetî ji Ahmed Arîf, ne min xwendiye, ne jî min bihîstiye ku rojekê gotibe, 'Xwezî bi kurdî min binivîsiya'.

Berî ku derbasî nivîsa xwe bibim, ez ê du pirsa bikim: Osmanî çawakî nebû asteng li pêşberî Yûnanî, Sirbî, Bulgarî, Romenî, Suryanî, û Erebî; û hişt ku ev ziman tev bi nivîsê û rêya edebiyatê bi pêş bikevin; lê hew û bi tenê bû asteng li pêşberî pêşketina Kurdî?

Eger berpirsiyariyeke Osmanî nîn be di vî warî de; tawan, guneh tev yê Komara Tirkiyeyê ye?

Ji rewşa îroyîn ya Kurd û Kurdî qet tiştek nakeve pahra Kurdan?

Pirsgirêka şairên ciwan yên ku mecbûr dimînin bi tirkî binivîsin heye; 'pirsgirêka li cihekî'* xwebicihkirinê!

Ji ber ku qedexeya li ser weşana bi kurdî rabû, azadiya xwefêrkirinê ku fêkiyê xwe bide, pirsgirêk dê zêdetir bibin: Di warê nivîs û zimanê nivîsê de dê mecbûrî hilbijêriyekê bibin: Bi Tirkî, bi Kurdî?

Heta niha, hima hima kêşeyeka wan a wisa nîn bû!

Dosyayek heye di kovara dumehî, jimara 6ê ya bi navê Yasakmeyve de: Şi'îrên Ku Ji Rojhilat Hiltên'. Şairê bi navê Sezaî Sarioglu, Mehmet Butakin,û Metîn Kaygalak bi mafdarî, dixwazin xwe vepesinînin û ji bo pêşeroja xwe jî bernameyekê amade bikin!

Ew şairên kok-kurd ku hemwelatiyên Tirkiyeyê ne û di heman demê de zimanê tirkî bi kar tînin, naxwazin weke 'Şairê Tirk' bêne binav kirin! Ji bo ku xwe ji kesên ku xwe weke 'Şairê Tirk' bi nav dikin cuda bikin û xwe veqetînin; serî li her rêyê didin. Dixuye ku sifata 'Tirk' li telê van mirovan dikeve! Hal ew hal e; bi vê pevgirêdanê, tu têkiliya sifata Tirk bi etnîsîteyê ve, bi nîjad ve, bi serûguh ve nîn e. Li vir, 'Tirk' di pevgirêdana zimanî de derdikeve pêş, û zimanê nivîsînê yanî Tirkî destnîşan dike!

Ev şairên kok-kurd ji bo ku nebêjin 'Şi'ira Tirk'; vêya diecibînin: Şi'ira bi Tirkî!

Ji bo ku bizanin ev rê rast e an şaş e, bila vê rêbaza min bi kar bînin: Bila Şi"ira Tirkî vegerînin İngilîzî û Frensawî. Binerin bê dibe çi: 'Poetry în Turkish' û 'Poêsîse en Turc' ya jî 'Poema en turc'... Wateya van ev e: Şi'ira ku hatiye weguhaztinî Tirkî, yanî şi'îra ku tercûme bûye!

Vêca ev bi tirkî dinivîsin!

Ji vê, tê vê wateyê ku şairên kok-kurd yên ku bi Tirkî dinivîsin xwe nikarin bi benê 'Şi'ira bi Tirkî' bigirin! Biyanî, mînak İngilîz û Fransiz şair ji kîjan nîjadî dibe bila bibe, şi'ira ku bi tirkî hatibe nivîsandin, dê bi vê pênaseyê bi nav bikin û binasin: 'Turkish Poetry', û 'Poêsie turque' yanî Şi'îra Tirk!'

---

* Ji bo ku têgih di cihê xwe de û bi wate be min lê zêde kir.

Şi'ira Tirk, Şi'îra bi Tirkî, Şi'ira Tirkî...

Pirs û pirsgirêka 'kî nivîskarê kurd e' di serê kurdan de zelal nebûbe heta niha, sedemek jê jî ev e: Melayê ku ev sed sal e mela ye, hima ku şaşikê datîne dibêje, 'na bavo, ez keşe me; kê gotiye ez mela me'!

De bila mizgefta me ji me re, kenîse jî ji wan re be!

Ku tu wisa dibêjî, tu dinerî ku xwe enirandin, mahdê xwe tirşo mirşo kirin û gotin, 'ma ne, em ji bo kurdan bang didin!'

Li vê ecebê!

Kesekî dîtiye ku nêrî hatiye dotin?

Hebe nebe nêrî, berî ku bibe nêrî tê xesandin!

Yên mîna min sal û demsal xwarî, dê bibîr bînin; dema ku em zarok bûn, mezinan mîna ku tinazê xwe bi me bikin, ji me dipirsîn:

--Ka bêje... bi Tirkî min gur dî çi ye?

Pêşiyên jîr û zana zanîbûn ku rojekê em ê bi 'tirkî gur bibînin', radibûn digotin, 'de bêje bavkê min, bi tirkî min gurdî, çiye?

Hûn ji min bipirsin bi tirkî min gur dî; duh Ahmed Arîf e, Cemal Sureya ye, Cahît Sitki ye...

Lê îro?

Têbinîyek: O.İnce, di gotara xwe de dibêje, 'Tirkî ne zimanê efendî ye. Û bi ser ve zêde dike, 'Ev pênase, hem zimanî-wêjeyî, hem jî ji hêla polîtîk ve şaş e'. Gelo?!

# *Niyet û helwest*

Dîroka nivîsê ango ya alfabeyê xwe dispêre berî 5000 sal, ji hêla simmeriyan ve peydakirna alfabe û nivîsa bizmarî.

Piştî alfabeya simmerî/bizmarî, misriyan alfabeya hiyeroglîf peyda kiribe jî şaristaniyên kone yên nişteciyên Mezra Botan û li derdorê; aqadiyan, hurriyan, babîlî û hitîtiyan bi vê alfabeyê zimanê xwe veguheztine ser qahfikên kîlî, berdên reş, qeteçerm, papîrus û kaxizê...

Li vir, ku ez bibêjim bapîrê hemû alfabayên berdest (ji bilî alfabeya Çînî û Japonî, û şaristaniya kone ya Maya, ku heta niha jî elfabeya wan nehatiye deşîfrekirin)alfabeya simmeriyan e, gelo ez ê bibim armanca tîrên rexneyî?

Weke ku têt zanîn, di alfabeyên abeceyî de her tîp/pît bi tena serê xwe xwediyê dengekî xweser e, û heta ku tîpine din neyên ber hev maneyekê nadin; hew bi saya zengelork û ziman ji gewriyê bi kêrî dengdayîn ango derxistina dengî tên.

Di gel ku ereb alfabeyê bi 'elîfbayê' bi nav dikin, çavkaniyên biyanî gotina 'alfabe'yê bi xwendina herdu herfên yunaniya kone 'alpha' û 'beta've girêdidin.

Wisa dixuye, deng û tîpa 'a', mîna ku kurd di jimartinê de dibêjin 'yek, Xweda yek', di alfabeya her zimanî de deng û tîpa destpêkê ye.

Çavkaniyên berdest radigihînin, ku kurdan ji serdemeke salixdayî heta bigihe îro 9 alfabe bikar anîne: Simmerî, avestî, aramî, pehlewiya kevn, sorî matî,xuruc el sir, erebî, latînî, kirîlî*...

Ger em ji navê dosyaya ku li dor vê mijarê têt amadekirin derkevin ser rê; tê zanîn alfabeyên ku kurd niha jî bi kar tînin; aramî, latîne

* Em Zimanê Kurdî Binasin, Wş. Enst. Kurdî ya Stenbol, 2001

û kirîlî ne 'îm' û îşaretên ku ji hêla kurdan ve bo dengên zimanê kurdî hatine peydakirin in; ew alfabeyên zimanên cuda ne, û li gorî dengên di zimanê xwe de hatine sazkirin.

Bi baweriya min hemû alfabeyên ku di destpêkê de bo zimanekî ji hêla xwediyên wî zimanî ve nehatibe peydakirin, herûher dê kêmasîninan bihundirîne.

Jixwe ku em bi baldarî dênê xwe bidinê; piştî ku hezar û tiştek sal di ser bikaranîna alfabeya erebî re derbas bûye jî, weke kêmasiyên ku Mîr Celadet li şûn xwe di alfabeya latînî de hiştiye, ya erebî jî bo zimanê kurdî ne evçend tekûz û bêqisûr e!

Rastiyeke Rojhelata Nawerast e, ku olan/dînan di mayîn û dahatû û mayîndebûna desthelatê de, di liserpêmayîna qewm û gelan de roleke girîng û sereke leyistiye; pirtûkên pîroz li layekî bûne mertalên parastina ziman, ayîn û netewetiyê; li layê din bûne sedema têkçûna zimanan, jiholêrabûna qewm û gelan, û wendabûna çand û şaristaniyên dêrîn û kone...

Weke ku Boraboz bi ristên helbesta xwe: 'hurmuzgan riman atiran kujan... 'me bi qir û qelaneke bûyî dihesîne, em dibînin ku 'xwediyên dawî yên Xweda' li gel ayîna xwe ya dest bi şûr, 'şûrê' zimanê xwe jî li ser qewmê ku 'anîne ser rê' ferz kirine.

Li vir naxwazim bibim sedemê nîqaşeke olî; lê belê divêt bêt zanîn ku alfabeya aramî ya ku îro weke ya erebî têt bi navkirin, berî Resûlê Ekrem bi 300 salekî hebû...

Kurdî:Zimanên herî qedîm, lê belê bêalfabe!

Ne ku dilê min dixwaze û ne ku bi aqilê dilê xwe dibêjim: Yek ji zimanên herî qedîm e kurdî.

Li gorî lêkolîneran kurd mîratxwirên 33 şaristaniyê windabûyî: simeriyan, babiliyan, elamiyan... gut'î û hûrriyan in.

Ji vêya; çawa ku erebî ji deryaya Qur'anê, İbranî ji çem û rûbarên Tewrat û Zebûrê, Suryanî ji gol û delavên İncîlê vedixwe, kurdî jî ji deryaya Avestayê, ji xweşdestanên 'ava heyatê' ya simer û babiliyan, vedixwe.

Jixwe, vekolînerên Avestayê balê dikişînin ser peyvinin ku niha jî di zaravayin kurdî de zindî û weke di Avesta de resen, ji reng û deng û durivê xwe tiştek winda nekirî, têne bikaranîn:

Homa: Homa, dujah: Dojeh, parştî: Pişt, paşt, zanu:zenû...û hwd...*

Li gel vê pêwendîdariya dîrokî, ev ziman ji çar zaravên sereke; kurmancî, sorî, kirdkî, û lorî...û bi sedan devokan pêk têt.

Pirrzaravî û fere-devokî ne kêmasiyek an jî taybetiyeke kurdî ye. Hima hima her ziman mîna kurdî xwedî zarav e, û pirrdevok e.

Li vir bi qasî hêza desthelatê, di yekkirin ango berbihevanîna zaravayên zimanekî ku bi demê re ji sedemên xweziyê û derxwezayî ji hev dûr ketine, çar tişt roleke sereke û bingehîn dileyizin:

1. Heyîna pirtuka piroz.

2. Desthelat.

3. Zimanê desthelatê (zimanê fermî)

4. Yek alfabe.

Di gel ku pirtukên pîroz Mishefa Reş û Kitêba Cilwe bi kurdî ne û xwediyê alfabeyeke taybet in, û weke serkaniyên berdewamiya ayîna kon Êzdayetiyê têne pejirandin, ji ber ku pirraniya kurdan misilmantî qebûl kiriye û di vê biwarê de hişkebawer in; rabûna bi daxwazeke wiha dikare bibe destpêka arîşeyine navxweyî, û ji hevdûrketina hêlên ayînî û civakî...

Her du tiştên mayî; zimanê fermî û alfabe di insiyatîfa desthelatê de ye, yanî yek ji karûbarên dewletê yê ku divê pê ve rabe.

Îro 'herêmî' be jî, şikir, Dewleta Kurd heye.

Bi qasî ku dizanim ji sala 2005 ê de çi li ser Axa Azad, çi li Bakûr û li Rojhilat ev mijar bû sedema goftûgo û nîqaşên dûdirêj...

Yekalfabe û yekzimanî du sê welatên Rojavayî Belçîka, Swîsre...ne tê de xususîyetên dewlet û dewletbûyînê ne.

Desthelat ne li gorî hest û dilînên xwe,li gorî siyaseta neteweyî, bo berjewendî û dahatûya netewekî xwedî-yekxak, yek al tevbigere dê

* Zarathuştra, M.S. Bilgin,Wş. Doz, 1996

desthelat be; berevajî siyasete millî cîbicîkirina siyaseteke ne Kurdistanî, dikare karê rêveberiyeke ji rêzê be.

Mixabin, roşenbîr û akademîsyenên Başûr yên mîna berêz Ferhad Shakely di vê biwarê de bi helwesteke bêmane û şermkarane radibin, dibêjin 'bikaranîna alfabeya latînî xizmetkariya Kemalîstan e'!

Li gorî min berêz Shakely û roşenbîrên di feraseta wî de çikyayî, rast dibêjin, belam; piştî damezrandin û daxuyandina Komara Tirkiyeyê, ji hêla Mustafa Kemal û peyrewên wî de wergirtina biryara bikaranîna alfabeya latînî, ne biryara guhertina alfabeyekê bû: biryara qutkirin û hilkirina rehên tirk û tirkitiyê ji ayîna Muhemmedî û mîrateya Osmanî bû!

Li Bakûr Kemalîstan bi vê biryarê bi 'tîrekî du çivîk' dane erdê: yek jê redkirina mîreteya Osmanî û xwedûrxistina ji îslamê; ya din jî weke ku berêz Malmîsanij jî di nivîsa xwe ya bi zarê tirkî 'Zimanê me:Kurdî' de destnîşan dike ye: 'li Bakûr yê ku ji çand û wejeyê xwe ya berdest bi dûr ketin, û pê re ketin nava valahî û xizaniyê, ne tirk; kurd bûn, kurdên ku destên wan ji destê Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî... hate derxistin...'

Malmîsanij kêm gotiye: Piştî vê biryarê, erê destê kurdên Bakûr êdî nema gihişt genciniya wêjeya kilasîk a kurmancî, lê li hêla din 'destên' ku di navbera kurdiya jor û kurdiya jêr de berhem 'serbiser' dikirin, û di ser Behdînan re direjî Silêmanî û Mahabad dibûn, hatin birrîn.

Berêz Shakely bila li min bibore; di biwarê alfabe û zimanê resmî yê dewletê de wisa dixuye, ku karteka 'neqşitî' û 'sorantiyê' van tiştên berevajî pê dide gotin!

Roşenbîr û ramanwer û mêjîmiştên welatekî û ji nîjadekî ew kes in -bo yê ku xwe aîdî wî welatî û wî nîjadî dibînin dibêjim-di hizra yekkirina axekê û welatekî de serkêşiya vîna/îradeya neteweyî dikin in; ne yên ku rabin bibêjin, 'ev zarav an ev alfabe di ser vî zaraveyî di ser vê alfabeyê re ye'!

Di encamê de her alfabe bi îm/îşark/xîzên destnîşankirî û denglêbarkirî alavên derbirîna zimanekî ne, û mafê her kurdekî ye ku

di mijarê alfabe û zimanê fermî de xwedî bîr û boçûn be, û van bîr û boçûnê xwe bilivîne, ragihîne raya giştî...

Lê; biryarên di vê biwarê de ne ew biryar in ku bi dengdayînê bêne wergirtin.

Li vir divêt bibêjim ku bakûriyên 'ziman li ber sekerata mirinê', di siberojê de bibin xwedî desthelat jî biryara bikaranîna alfabeya erebî dê wernegirin.

Her kes dizane ku bi biryara alfabeya latînî re Komara Tirkiyeyê berê civaka xwe ji Rojhilat dagerand ber bi dinyaya Rojava de.

Jixwe ku wisa bidome; sînorên heyî yên di navbera zaraveyan de, di navbera ziman û wêje û çand û peywendiyên din de jî her ku biçe dê bibin kelebendên asê!

Biryara hilbijartina alfabeya latînî –ku di nava alfabeyên heyî de hêsantirîn alfabe ye di warê hîndekarî û perwerdehiyê de– biryareke siyasî Kurdistanî ye, û ev bi îradeya Hikumeta Herêmê û Parlamentoya Kurdistanê ve raste-rast girêdayî ye.

Hikumeta Herêmê, ku biryara bikaranîna alfabeya latîne wernegire, Dewleta Tirk ji doh de, û siyasetmedarên Bakûrî yên ku bi tirkî 'bindestiya kurdan dikin nîvişkê ser nanê xwe' ji niha de, amade ne ku destên xwe hinne bikin!

Weke peyva dawî, ez hevalbend û piştgirê biryara ku xeyala Kurdistana Gewre di dil û mêjîyê min de vejîne re me, û ez ê wê biryarê bipêm...

# *Qabil û xebîr**

Wêjeya ku ji demên bêsalix heta serdemên peydakirina nivîsê bi gotinê/zardevî, û paşê dîsa bi riya gotin û nivîsê bi her berhema bixwedî/bêxwedî wêjeya netewekî dike kelepûr û saman û semiyanê netewî; di qonaxinan de bi serkêşiya nivîskarekî/berhemekê: Herîrî, Mela, Feqî, Xanî; di qonaxinan de jî bi handanên hevpişk: Hawar, Gulistan, Tîrêj, Rewşen, Nûbihar... dibe/bûye destpêka nivşenivîskariyeke nû!

Em jê bêhay bin jî; wêjevan bi zar û zaravên kurdî: Kirdkî, Kurmancî, Hewramî, Sorî ...li ser erdnîgariyeke 'têrgo' û 'têrko'; dabeşkirî û bi sînoran ji hev vedûr, bi alfabeyên cuda: Aramî, kirîlî, latînî berhem dane/didin.

Sînorên bi destê dabeşkar û lixwepahrvekerên xakekê hatine kêşandin, îro jî serekesedema yekemîn a kêmpêwendiyan e, û pê re kêmhevdûnasîn û kêmpêhesîna berhemên li qetên din çap û belav bûyî...

Ji lew; em ên bi 'pişka tirkan ketî', di ser weşandina wan re piştî 70 salan, wekî berhemine nûbere bin li Çîrokên Hesen Qizilcî, Romanên Erebê Şemo, helbestên Hêmin rast hatin.

Wêjeya ku li ser welatekî 'pirrex' û 'pirrhêl' hatiye pê; li Kafkasan, li surgunê jî herûher di liv û bizav û berxwedanê de bûye.

Kêm berhemin hatibin nivîsandin jî li xeribîyê; bi taybetî, bi dû mişextiya ber bi welatên Rojhilata Navîn a piştî 12ê Îlonê a endamên rêkxistinên siyasî, û vê paşiyê jî bicihbûna wan a li welatên Ewrûpayê, bû sedema ku wêjeyek bi navê 'Wêjeya kurdî a li surgunê' peyda bibe.

---

* Behremend û şareza

Surgunkirin, bi darê zorê ji Kurdistanê bidûrxistin û pê re jî girtin û zîndankirin; piştî şikestina serhildana Bedirxaniyan hima bêje 'qedara' hevbeş a roşenbîr û kurdên kurdperwer e.

Piştî şikestina serhildana 1925ê ji Bakûr dersînorbûyî û dûrketiyên ji axa bav û kalan: Cegerxwîn, Qedrî Can, Osman Sebrî, Reşitê Kurd... tev di zîndana bi nav û deng di Mezê de sal bihartin, mil sipartin hêtên pêşerojeke ron, rewnak.

Ji bilî Cegerxwîn, Reşîd ê ku di navbera salên 1959-1965 de dibe 'mêvanê' zîndana Mezê, wan rojan wisa hildigire bîra me:

*Wek bedenê ev zîndan*
*Pêçandiye çar kenar*
*Asê kirine nerindan*
*Da pê milet bikin jar*[*]

Pahrvekerên axa kurd ji roja ku pê li axa kurd kirin, xwestin welatê kurdan li kurdan bikin 'girtîgeheke dorsênckirî'!

Îro jî Reşîdên hemdem bi tewana 'propogandaya rêkxistinê dike'; endamê Komeleya Nivîskarên Kurd Hemîd Dilbihar, Muharem Erbey, Qaher Bateyî, Alaatîn Aktaş; li Başûrê Rojava nivîskar Pîr Rustem, Loqman Huseyn di zîndanan de girtî ne.

Zîndanên ku destpêka salên 80'yî de 'mêvanên' xwe bi jop û serposk û emirberên destbiqalas ên Esat Oktay Yildiran, û bi dirûşma 'bi Tirkî biaxive pirr bixaive' pêşwazî dikir; niha bi berxwedêriya dîlên dilpola, bûne 'Medresayên Sor': Di 'hucre'yên van 'Medreseyên Sor' de 'feqî'yên hemdem: Sînan Sutpak, Zekî Kayar, Mizgîn Ronak, Hemît Adiman, Tevfîk Hêja, Mûsa Altûn, Enwer Ehmed... hima bêje îcazeya xwe wergirtine ji destê perwerdegarên wejeyê: Melayê Cizîrî, Feqî, Ehmedê Xanî...

*Ma ne, Xanî gotibû:*
*Ye'nî ne ji qabilî û xebîrî*
*Belkî bi tee'ssub û eşirî*
*Hasil, ji 'înad, eger ji bêdad*

---

* Ez, Reşîdê Kurd, Wş. Avesta

*Ev bide'te kir xîlafê mu'tad*[*]

Xanî, nefsbiçûkî kiribe jî; pêşengên 'Wêjeya zîndanê': Sînan Sutpak, Zekî Kayar, Mizgîn Ronak, Tewfîk Hêja, Hemît Adiman, Hayrettîn Ekîncî, Evdê Cano êdî 'qabil' û 'xebîrê' karê xwe ne.

*06.01.2011*

* Mem û Zîn, E. Xanî, Wş. Lîs

# *'Alema kelama mewzûn'*

Çi bêdestpêk e? Û wisa bi hêsanî çi ji ezmanan bi zembîlê hatiye xwarê?

Hişmendî û feresata di 'roja fereh de kurê bavê xwe', nezîkatiyên 'nanê wî li ser çonga wî' bi bejn û bala kijan miriovî/ê ê vê civatê bikeve jî; bi bejna kes û kusên peyrev û dapêyên Mella û Xanî, yanî yên ku zend û bendên xwe badane û dest avêtine gewriya xameyê û dinivîsin, neketiye/nakeve.

Wekî serboriya her tişta ku hatiye pê û xwedî raûrîşal e; dem û serdem serencameke dûrûdirêj; şop û dews û karteka helbestkarên beriya helbestkar, di jiyan û huner û aferindina wî/ê de eyan-beyan e.

Ev beyanî, di rist û bendinan de wekî navlêvandinê be, di helbestinan de di avakirina rist û hêmayê de veşarî ye.

Ev 'veşarîtî' di berhemdariya berhemdarinan de carinan zêde nixumandî, carinan jî eşkere, servekirî ye.

Jîritî û behremendiya afirînerê nûhatî, di vê 'eyanbûn' û 'veşarîbûnê' de an xweveqetandinek e, an jî wekî bi 'tevlêbûnekê' dertê pêşberî me.

Dubare be jî, li vir destnîşankirina ku gellek caran min gotiye ez ê dubare bikim: Her helbestkar bi qasî xwe, tevahiya helbestkarên beriya xwe ye.

Vê 'tevahiyê' meriv dikare bi navê 'kamilbûnê jî bi nav bike.

Jixwe, camêrekî gotiye' heke hûn bixwazin bi ser helbesta helbeskarekî/ê ve bin û têbigihijin, wî bi helbestkarên beriya wî jiyayî re bixwînin, binîrxînin'.

Kirîtîker û nirxandînerên helbesta kurdî zorkêm, û ên heyî jî pirr

kem û kurr bin jî; divê bibêjim: Ez ne wekî mirov ne jî wekî helbestkarekî ne 'bêberî' me, ne jî 'bêdawî'!

Çawa ku ez 'bavek' im, wisa jî ez ne 'bêbav' im'!

Ji bilî 'baviti'ya biyolojîk; bavin helbesta min hene. Navê 'bavekî' min Xanî ye, yê yekî din Cegerxwîn e, yê yekî Osman Sebrî ye...

Û ez bi 'bavitiya' her 'bavî' şanaz, kêfxweş û bextewar im!

Bextewar im; ji ber ku ne 'bêjîyekî bêpizî' me, ne jî destpêka destpêkeke bêdestpêk im.

Hebe nebe; ez jî wekî yên berî xwe li ser vê riya dûrûdirêj 'piyawek"im.

Û ez nizanim ez ê li ku raht bibim, rawestim.

Mebesta min; qet nebe wekî rêwiyekî berê wî li oxirê; qonaxinan bibirrim, kêl û kêlikinan li dû xwe bihêlim, û paşê bigihim duryanekê.

Ew 'duriyan' riyeke ku ji riyekê veqete, dagere ser riyeke din e.

Gelekan li wê 'duriyanê' li şûn xwe dews û şopine ku neyine maliştin, hiştine. Gelekan kul û xem û xweziyên xwe bi xwe re birine. Û gelakan jî bi 'hiştinên' xwe li ber serê xwe kêlên bejnî, kêlên 'alema kelama mewzûn*' daçikandine, û çûne.

*Xweziya min bi kêla wî yê ku gotiye:*
*Hebûya me jî xudanek*
*Alîkeremek latîfedanek*
*...*
*...*
*Min dê alema kelama mewzûn*
*Alî bikira li banê gerdûn*

Wî 'bêxudanî' bi saya şiyana xameyê yezdanî al bilind kir, kêl çikand û li ber serê xwe danî!

*12.02.2011*

* Mem û Zîn, E. Xanî, Wş. Lîs.

# *Em; ez, tu, ew...*

Berî her tiştekî ziman, berhem û bermaya herî bi wate a ji pevrejiyîna civatî derketî ye. Mirovê di nava civatê de takekes, bi saya ziman nêzî civatê dibe, û bi nasnameya di devê xwe de dibêje, 'ez jî yekî ji te me'! Û jixwe; zimanên heyî lê ne wekî hev, mirovê di çavê mirovî de mirov, dike ku bibe 'yê din'. Yên mîna min çiqasî hebin, yên ne wekî min jî pirr in. Sedema vê pirrbûnê qulzema pirrçavî a zimanan e. Ji lew; zimanên heyî jî weke darşecereya malbateke pirrşax a xwedî gulî û çiqlî, ji hêlekê de xwediyê şaxezimanekî bi ser zimanekî din ve teviyayî ne; li aliyê din şaxin jê ji darê vediqetin, dibin guliyên zimanekî din.

Wekî ziman, darin hene- nola dara berû, dara lûrê, a hinarê- ji kokequrmê xwe zêde dibin. Evcure darên zayok/xwezêdeker ji ajên ji xwe, ji ajên ku hemû hêza xweşînkirinê ji kokequrmê dara ku ji ber zêdebûye werdigire, rê dide ku bi demê re bibe derx, derx bibe devî, devî jî li gel hev bibin dar û daristan...

Ji lew, serzemîn biqasî dara daristanan 'daristan'a zimana ye.

Li gorî daneyên serjimariya bi destê zanistan hatîye kirin; kurdî jî di navê de nêzî 6500 ziman hebin jî li darê dinyayê; digel ku zimanin her roj sînorên jîngeha xwe ferewantir dikin, hinin jî ji ber kêmketina bikaranînerên xwe, bi taya mirinê dikevin. Ji ber hindê ne her roj be jî, her serê pêlekê, zimanekî radikin 'morga zimanên mirî'!

Mirovahiya zayok û xwepirrker di nava 'doş'a zayîn û mirinê de 'mêzînekê' pêkwerîne û bi vê şêweyê xwe ji qirrê rizgar bike jî; tu hêzê nekariye zimanekî mirî –serboriya Yahudiyan ne têde– vejîne, û wî li jîngeha li dû xwe wala hiştî, vegerîne!

Zimanê ku em dibêjin zindî ye, di eslê xwe de û rasterast bi vên û şiyana mirovên xwediyê vî/wî zimanî ve girêdayî ye.

Em û em-civat bi 'dûnde'yên xwe dikarin heyîna xwe bidomînin; lê ziman?

Ziman, bi qasî xwedîderketina me ya lê; heye, zindî ye.

Em û civata em jê (em bi ser ve) ku berê xwe bidin zimanekî din,

-sedem û mebestên me çi dibin bila bibin- bi bikaranîna bi salan re zimanek dikare xwe li zimanê me, pê re li giyanê me, pê re xwe li hest û hizr û her cure pêjnên me mîna marekî rapêçe.

Wisa dixuye ku îro, ne marekî; pîtonekî, fitlo fitlo xwe li me daye hev!

Ev 'pîton' li bakûr tirkî be, li rojhilat farisî; li başûr û başûrê rojava erebî bi xwe ye!

Hinek bi mînakdayîna çerm û kinc vebêjin/şîrove bikin jî; zimanê biyanî: yê dagirkeran, yê ayînê, yê çandî, yê edebî, ku di destpêkê de kinc e, hêdî hêdî, wirde wirde dikare bi çermê me ve bizeliqe, bibe yekpare.

Zimanê biyanî, bi taybet yê dagirkeran, yê xakdabeşkeran, yê dîn û ayînferzkeran; bi herîkîna zeman re di gewdeyê mirov û civat û gelên di destpêkê de ayîncûda, zimancuda, çandcuda de birîninên ku bi tu derman û melheman rehet nebin, peyda kirine...

Rewşa zimanê serçaveya zimanê erebî, suryanî eyan beyan li ortê ye.

Demên berê, wexta ku textor û bijîjk mîna niha ne pirbûn, ku birînên mirovekî pirr û xedar bûna, hekîmên gundan pezek dugu-randin, birîndar tazî dikirin, û kevl li laşê wî dipêçan.

Em ji hêla birînên xwe ya zimanî ve, di rewşeke wisa de ne.

Li ser erdnîgariya me ya ferewan, sînorê me yê ziman her ku diçe tê hev û tengtir dibe.

Li bakûr, bandora siyaseta dewletê a inkarker, imhaker û wekîx-weker (ji hêla me ve) wekî giringtirîn sedem derdikeve pêş di dabaşa bikaranîna zimanê serdestan de! Evyek, ev rastî wekî amentûbillehî, rast û eşkera û eyan e! Lê belê; di vê rewşa heyî ya îroyîn de, –ku em wekî pêvajoya herî xeternak bi nav dikin bo têkçûna zimanê xwe– heta kengî em ê vê biwêjê dubare bikin: Xeta xwar ji gayê pîr e?

Gayê pîr dewlet e!

Dewlet gayê pîr be; cotkar kî ye?

Gayê pîr dewlet be, halet kî ye?

Dewlet be gayê pîr, gîsin kî ye, misas kîye?

Li vir, em dikarin 'kî bûn' û 'çi bûn' û 'çerbûn'an dirêjtir bikin!

Peyvdirêjkirin, carinan, bi mebest şêlûkirina avê ye.

Ji lew; bêyî ku em di babeta vê nîqaşa girîng û giran de li bersivên xwe bigerin û pirsên bi me ve têkildar ji xwe bikin, her kes ji hindama xwe ve, rastûrê û li yek tûşê berê xwe dide' gayê pîr'!

Belê û sed carî erê; 'gayê pîr' ji zû ve em xistinê bin nîrê xwe!

Baş e, divê pirsa ku em ji xwe bikin ev be: em ê çawakî ji vî nîrê di stûyê xwe de, xwe û stûyê xwe jê rizgar bikin?

Heta ku em guh nedin gotinên hev; em nexwazin di hev bigihijin, em ê bi ser riya/riyên ji stûderxistina nîr ve nebin!

Di civîna ku ji hêla KCD (Kongreya Civata Demokratîk) Koma Xebatê a Ziman û Perwerdehiyê ya Navneteweyî" li Amadê hate li dar xistin, gellek kesên hêja û ezîz ji der û deverên dûr hatibûn û beşdar bibûn. Li gel bîr û boçûnên ronîker, rêveker, û çaredestnîşanker ên beşdaran; mixabin pirsa merivekê di serê min de ma: Kurd di daxwaza xwe ya rewa, di xwesteka perwerdaya bi zimanê dayikê de çendî/çiqasî samîmî ne û xwedî vên û hêz in?

Li gorî min, herkesê ku xwe kurd dibîne û dahatûya ron û azad di xwestin û bidestxistina mafê perwerdeya bi zimanê dayikê de dibîne, divê vê pirsê ji xwe bike: Digel karteka 'gayê pîr; vî zimanî ez çiqasî ji dilê safî dixwazim, wekî mafê xwe yê bingehîn û suriştî dibînim, û di ber de têdikoşim, diwestim?

Di serî de alîcanebên ku li ser navê vî gelî siyasetê dikin; rojekê peyveke pêşiyan ji devê we derketiye?

We kurtehelbesteke şairekî kurd xwendiye?

Bi ristekê we Ehmedê Xanî bi bîr anîye? Ehmedê Xanî'yê ku gotiye:

Aşiq û bulhewes cuda ne

Hin faîdexwaz û hin fîda ne!

Birastî, hûn ji 'fîda'yan in, an ji 'faîdexwaz'an in?

# *Şeqşeqçî*

Îro jî weke gellek rojan, min derdawên kirasê xwe hildan, lewendî li zend û bendê xwe badan û min xwest bi du dest û deh pêçiyan dakevim qada nivîsê.

Xuyaye vê qanê jî dixwazim mîna agirê bi pûş ketî, nivîsê û mijarê û şêwazê bidim ber xwe ...û piştî ku biqede, bibêjim 'erê welleh, hêjabû'!

De ka... ez û tel'a xwe!

Berî şoreşa teknolojiyê gidîno, gidiyanino min jî weke hin nivîskarên 'gewrey gewrekan' ji kaxeza spî û xameyê ku di hibirdankê de dihat dakirin, hez dikir!

Lê niha?!Niha vê kompiyûterê jahr xistiye nava nivîskariya min; ne kaxizên mîna pivazên qeşartî sîngsipî mane li ser maseyê rex rex vezilandî, ne jî xameyên 'parker' ê di xamedankê de bi perûbask û nikil-eylo, ku xuşka min a li vî serê dinyayê, bo helbestên herî law û spehî binivîsim diyarî min kiribûn...

Lê şikir, sed carî şikir ku maseyek min heye ji ferşekî ji van ferşên limêjê ferehtir û dirêjtir.

Ku tînim bîra xwe, pê re dişêkirînim û xweziya xwe bi halê xwe tînîm: Niha mîna seydayê xwe Cegerxwîn ji ber destê Desthelata Baas'iyan di kadîn û axûrinin gundên Binxetê de 'qaçax' bûma, min ê çi bikira?

Dîsa sed carî şikir, sed hemd û sena ku piştî giregir û gewrey gewrekan ên mîna Biraboz û Xanî û Namî... ez jî yek ji helbestkarên vî qewmî û vî zimanî me!

Kalê kalê min, Xanî'yê 'kuhensal' gotibe: Ger dê hebûya me jî

xwedanek/Alîkeremek, latîfedanek... bi saya wî em jî niha xwedî xwendevan û piştevan û berevan in!

Kit kit bin jî, hezkiriyên me yên ji dil û can hene ku name û enameyan ji me re rê dikin û dilê me şad û xweş, û rûyê me spî û geş dikin:

'Axir tu heyî, lomekar, qelemşûr, xwediyê Eroûtîkayê. Ezbenî, nayê bîra min ev dubara çendan e serî li hember "çiyayên rûspî" diçimînim, bi xwendina Eroûtîkayê dihesidim, hildiweşim, wek stêrka li asîmanan dixuricim. Bi eroûtîkayê, kolan û taxên Amedê razên xwe pêşkeş kirin. Hemû xortên bajêr tevî min, bûn mirîdên te. Me jiber kir helbestên te lê mixabin hê me kesek nedît em bixwînin ji wan re. Arjen Arî, tu ji me çi dixwazî em bê yar bûn dildar. Dengê seriyên ku li yar digerin û li hev dikevin nayên te? Em weke te li esmeran, kinikan, hûrikan, lêv erxewaniyan digerin. Ezbenî, sedema serkeftin û têkçûnên me tu yî.'*

Piştî ku min nameya hêja û xoşewist Şevger Çiya bi ve re pahr ve kir, ez bêm ser' kakilê gwîzê", 'memikê qîzê, ango termê vê nivîsê:

Weke Xwedê, vê siharê qet mahdê min nediçû nivîsê!

Lê... piştî xwendin û geryanekê di 'êvargeha' xoşewist Yeqîn H. –ku sihar sihar meriv ji can û dil, ji mêlak û mil ve ditengijîne– derbasî 'taxa' Şêxmûs Sefer bûm, û min dit ku Sefer hemû nivîskar vexwendine ser sifreya tore û edeba qewmî.

Ji ber ku cîranê hevbûn, nedibû ku ji wir jî nequlipim 'dol û guherên' Çiya yên mişt çîrok û dîrok û rastiya heqîqetê, ku me bi mêrxasî û ciwanmêrî û xayintiya qewmî dihesîne, û pê re jî bi romana Heciyê Cindî ya ku di sala 1960'î de hatiye nivîsîn...

Saete her nivîskarî xweş be, dibêjim.

Lê... ji 'sefarê sefaran' Ehmedê Xanî heta bigihe Osmanê Memed yê hêlekî wî şûm, hêla din givark givarkî, ku li helbestinan an jî li nivîseke ji milk û zeviya dil ya nivîskarekî kurd derketî rast têm, serbilindiyeke bêpawan eniya min berztir û berjortir dike!

Ji ber ku di nivîsê de ez weke xwendevanekî li du-sê tiştan; li teperepa dil, li aqilê aqilmend, li vegotina şîpî digerim; her ku li ber

vê mîrata kompiyûterê rûdinim, berî ku hevokekê saz bikim, nexş û nexşînkariya qîzên berê tînim bîra xwe, û bi dû re mîna paleyê ku rahije dasê û bibeje 'ya ellah', dikevim ber berê xwe.

Her 'ber' wisa bi hêsanî naçe serî...

Tên bîra min; di hênikahiya destê êvaran de li wê nawçeya her ku çû, ber bi bajarvaniyê de beziya û zû xişn bû, li devê deriyê xaniyên bi hewş qîzên bi ser hîzarê çik-spî de xûzbûyî, bi wê derziya hûr î hûrik bi wan tayên rengîn î zirav di kêla her nexşeyê de dahatûyeke rengîn dixemilandin di asoyên pêşeroja aşopa xwe de...

Niha têdigihijim ku nivîs durvekî îbadetê ye:

Dema ku di ber şibakeya kek Rifat Arya re dibihurîm, dibêjim fersend ev fersend e, sûretê maqûlekî dikim tûrik, û hêdî hedî didim evrazê nivîsînê.

Carinan nivîs bêhnê li min diçikînê! Carinan jî mîna yarekê, bi destê min digirê, û ez û wê serberjêrî kûrahiya çalên têramînê dibin, di bendavên hest û dilînan werdibîn... û piştî yarî û laqirdî û henekên dilsotîner ji milkê xewn û xeyalan dadigerin kêlîka 'niha'yê!

'Niha' tûne di nivîsê de!

Yê ku bidin dû 'niha'yê, dê 'mehkûmê niha' bin!

Her 'niha' divê bibin 'kilîla dergehên' 'niha'yên zemanên din!

Ez, niha, di niha de niha û kêlîkên nihayan bi her bêjeyê dispêrêm 'niha'yên sibe!

Û zanim, zanim bi qasî ku niha karibim 'niha' bisprim sibe, ez ê jî hebim û sibe bim!

Niha, vê kêlîkê, vê kêlikê ku mîna keleka li qerexa Tigrîs bi her pêlê re diçelqim bi wir û bi vir ve de, sê tişt çongên min giran dikin:

1. Mitirbên ku ji bo du quruşan lodên şabaşê didin ser hev.

2. Nivîskarên ku binê bîrekê û serê sîrekê didin ber hev.

3. Û ...şeqşeqçiyên piştî nivîsê ku destên xwe didin ser hev...

# *Ez ji mirîyan...*

*Maçek bide Seyda û bi carek tu mexeyde*
*Sed heyf e ku dilkul herî bin ax û nebûnê*

*Hingî wekû sax e bere dilxoş û ciwan bî*
*Lê kengî serî danî bi carek meçe şûnê.*[*]

Piştî ku mir, bi qasî ku min dizanibû gorna wî di hewşa mala wî ya li Taxa Xerbî[**] de ye, û bi qasî ku pirr caran rêya min bi Qamişlokê ket; ne bi tenê, ne jî bi hinekan re neçûm serdana gorna Seyda.

Jixwe carekê çûbûm serdana cenabê wî; havîna 76 ê.

Di gel vê helwestê; di her çûnê de min 'bênan û xwêtî' nekir, bi telefonekê be jî, min li dostên xwe Konê Reş, Rezo Osê, Deham Evdilfetah, bi dû re Elî Cizirî, kurê Miradê Sêvê Silêmanê Miradê Sêvê, Nesrî Têlo...û li hêjayên din pirsî...

Rêz û hurmet bo hemû hêjayan... Bi yadkirina wan re serê xwe bi siyanet diçimînim û bejna xwe ditewînim li ber ked û tab û jiyana wan kesayetên ku di her şert û mercî de bîrûbaweriyên xwe bi mirinê, bi zîndanê, bi koçberî û sûrgunê parastine; bi hez û hisreta welatekî jiya ne, û di vê rêyê de can dane...

Her yek –bêyî ku navên hineke bilêvînim hinekan ji bîr bikim– kite kit giranbuha ne, yeke yek hêjayî ne ku di her salvegera mirin û jidayikbûna de bêne yad kirin, berhemên wan bêne çap kirin, hunera wan bêt eşkerekirin, jiyana wan bêt vegotin; bêyî ku azarkêşî, xizanî û renckêşana ku kêşane bêt veşartin!

Peyva pêşiyan e, wan gotiye, û ji ber ku wan hiştiye, bicihkirina

---

* Ronak, Cegerxwîn, Wş. Avesta, Rp. 185.

** Taxa Xerbî: Miheleke bajarê Qamişlo, gorna Seydayê Cegerxwîn li vê taxê ye.

wê di vê nivîsê de dê ne bêedebî û bêtoretî be; dibêjin, 'Ku mirî dimre qûnzêrînî dibe'!

Weke hişmendî û feraset, bi baweriya min her mirov roja ku ji dayikê dibe, jixwe 'mirî' ye!

Mirin ji roja ku em çavên xwe li dinyayê bel dikin, –mîna qederekê– ne li pêşiya kîjan evdî/ê ye?

Gilgamiş/Girgamêş geyayê heyatê çendî bi dest nexistibe jî, her nivîskar bi afirîneriya xwe, bi bidestxistina bilind-huneriya edebî, bi berhemekê an deh berheman dixwaze bikeve nava kerwanê nemirên ku ne sal, ne sedsal nikarin wan biavêjin binê newala jibîrkirinê...

Mirin...

Ez ji miriyan hez nakim.

Û ji yê ku ji miriyan hez dike jî hez nakim!

Ku ez jî bimrim, li tevî yarê bila kesek ji min jî hez neke!

Meriv dikare çawakî ji tiştekî 'tûne' hez bike?

Ji tiştekî ku meriv dizane êdî venagere, êdî di binê axa sar û cemidî de dê birize?

Ev çand, ev 'çanda ji-mirî-hezker' ji kû, kengî, bi kê re kete nava vê civakê, û ma û ma?

Ha ev, ev pirs gellek caran dibe sedemê arîna ûlsera min!

Min ji Peşêw bihist, Peşêwê ku Bakûrî wî bi dîwana wî ya bi navê 'Birakûjî'* dinasin:

Li Slêmanî û Hewlêr, Peşêw dixwaze helbestên xwe bigihîne gûhê gelê xwe. Berpirsê ewlewergerên wê demê dibêjinê, 'Tu hêjayîyek î, tiştek bi serê te de were ... me navê ku tu van helbestan bixwînî!'

Peşêw e...bi ya xwe dike; derdikeve ser dikê, li Slêmanî û li Hewlêr ji hezaran merivên di holê de amede re her helbestê bi dengê dil û kerba ji kezebê, dixwîne.

Ji ber ku ji Cd ya ku wî bi destên xwe diyarî min kir, dizanim; rê û rêwanî nîn bû di holên li Slêmanî û Hewlêr.Yanî weke ku dibêjin 'te xwê biavêta, lib nediket erdê!

---

* Birakujî, E. Peşêw, Wş. Avesta.

Min bala xwe dayê, di dema helbestxwendinê de çepk nîn bûn.

Holên bi mirovan sik-sikî mişt, mîna ku hemû beşdar 'bi gera-gupê' bileyizin, aram û bêdeng bû...

Lê, di dawiya bernameyê de, ji daketina ji ser dikê heta derketina ji holê... dildarên helbestê li ser pêya, bi tofana çepikan Peşêw bi rê dikirin.

Di Mîhrecana Amedê ya sala borî de jî gotibû,'ji kerema xwe, çepikan bihêlin dawî!'

Ya ku ez ê li vir li ser rawestim ne ev e; bîranîneke wî ya ku li Elîhê bi min re par ve kiribû ye:

Wexta ku ji Fînlandê têt ser Axa Azad, piştî serdana li hin sazî û dezgehan, dostine wî jê dipirsin, 'tuyê neçî ser Mezarê Nemiran?'*

Carekê, dudu, sisê...

Peşêw ne dibêje 'erê' ne dibêje 'na!'

Xuyaye; ku ev jî ji zindî-miriyan hez nake; serê sibeheke zû, bi tena serê xwe; hew ew û sayiq û Xweda... berê xwe dide Herêma Barzan, Mezarê Nemiran!

Li ber gorna herdu hêjayan serê xwe diçimîne, fatîha xwe dixwîne, duayên xwe dike, û wedigere...

Piştî guhdarîyê min jê pirsî, 'Bo çi tenê, û bi dizî?'

Bersiva Peşêw ev bû:

Min nexwest ku ew serdan bibe 'alavê' kurtepistî, paşgotinî, û nûçeyên rojname û televizyonan!

Ji sewta dengê wî diyar bû, ku Peşêw ji Barzanî hez dikir.

Nemir jî ji Hejar hez dikir.

Yanî ji şa'irên şa'ir; ne ji yên şellafok û pesinkar!

---

* Mezarê Nemiran: Li Başûr li Herêma Barzan ebedîgeha Barzanî'yê nemir û Îdrîsê kurê wî.

# *H.N.H.*[*]

Bi dû her qirrê, qelanê de mirovahiya ji kirin û kiryarên xwe fihêtkar bi navê bajarekî, bi wêneyekî ku wê kêliyê vedibêje, bi kevalekî ji destê wênesazekî derketî, carcarina jî bi helbestekê karesata rûdayî dike mifteya vekirina deriyê bîra hevbeş ya mirovahiyê!

Navê 'Guernîka' çawa ku bêhemd û ji nişkê de zilma Franko'yê zilmdar û xeddar tîne bîra meriv, ev nav di heman demê de navê kevala wênesazê bi nav û deng Pîcasso, û pê re jî navê wî bajarê berxwedêr yê Îspanya'yê jî dixe bîra meriv.

Ev bîr, ev bîra ku mîna çala bi ava tavên biharî û helana berfa zivistanî bêt dagirtin, berxweş e û her roja ku diçe mişttir dibe ji qoq û hestiyên mirovan, ji êş û azar û jana gelan; ji celiyê, ji koçberiya qewman, ji xwîna jêrdest û bindest û bêgunehan...

Di dem û kêliyên wisa de çeka herî giran ya jêrdest û tepeseran nifirek e:

--Xwedê nehêle!

Bîhna Xweda fere ye, dibêjin.

Û em dizanin ku Xweda ne heval û berevanê zilma ku evd li evd dike ye!

Ya mixabin, gelek caran evd bi 'navê Xweda' zilma evd li evd 'ferz' kiriye, ku şa'ir jî rabûye dadaye gewriya peyvê:

Rewişt Zerdîştire manewe bê des

Bezêka nêka Hormiz we hêç kes[**]

---

* Hîroşîma, Nagazakî, Helebçe

** Helbesta ku li ser qeteçermekî li şikefta Çeşanê hatiye ditîn. Ev helbest, li gorî agahiya ku Nûradîn Zaza radigihîne, di destpêka serhildana Dersimê de ji hêla serhêldêran ve weke sirûd hatiye xwendin!

Şa'ir jî li vir mîna bêçareyan ne heval û ne hogir, berê xwe bi jor ve vedike, alîkariyê ji Xweda dixwaze: Bezêka nêka Hormiz we hêç kes:Ne Hormiz bi hawara me ve tê/dibeze, ne jî tu/hîç/yek kes!

Ma Xweda, ma di ber we re bindestino?!

Hê îro, serokwezîra Almanya Merkel di axaftina xwe ya li parlamentoya İsraîlê, bi navê dewleta xwe bexşîna xwe xwest ji ber zilma ku demekê bi destê Hîtler li Cihûyan hatibû kirin!

Û weke peyva dawî Merkel'ê ev gotibû: Em weke xelkê Elman û dewleta Elman amade ne bo her cure alîkariyê!

Bala xwe bidinê, weke ku pêşiyên kurdan jî gotine, 'dinya pêkarîn e', yê hêzdar rabûye û pê li serê yê bêhêz/lawaz kiriye.

Ev tirk evçend bi aqil in ku ev peyv gotine û hiştine:Masiyê mezin yê biçûk dadibeliîne!

Çerxa dinyayê ta niha wisa geriya ye, û weke ku pêşiyan gotiye, 'darê dinyayê' wisa bûye ku pêşiyan gotine, 'zor zane, zêr zane, devê tivinga bi mor zane'!..

Îro ji nava sedûtiştek dewletên li darê dinyayê dewletek heye ku ew xwediyê her sê tiştên ku pêşiyên me jimartine: zêr, zor, tivinga bi mohr e: Emerika!

Heman Emerîka'ya ku îro li rojhelata navîn li du projeya 'Rojhelata Navîn a Gewre' ye ji du bombeyên nukleerî yek neavêtibû Hîroşîma? Piştî sê rojan ya din jî bi ser serê bajarê Nagazakî de bernedabû?

Wexta ku Hîroşîma tê gotin, bêhemd sûretê wê keçika ku tikûtenê û şilf î tazî, di devê wê de tofanek qîrîn, di çavên wê de çemek girî...û ketibû ser rê, tê bîra min!

Niha ku ez bibêjim Helebçe, ev nav wê çi bîne bîra we?

Bajarê Helebçe, Sadam Hiseyn, Elî Kîmyewî... an bi sedhezaran mirovên ku xwe avêtin sînorê Tirkiyeyê?

Ê min ew sûret, ew sûretê bavê ku zaroka xwe di dema mirinê de jî bernedabû; himbêza xwe lê pêçabû û bi dev û rû ve çûbû erdê, tîne bîra min navê Helebçe!

*qutbûn ji biharek din, bi jînê şa nebûn*[*]
*hinek pûç bûn di Helebçe de hinek kor*
*û hinarkên rûwan sor sor,*
*ji heyva nîsanê nêrgiz*
*bilbizêq*
*û beybûn*
*tev zarok bûn!*

*tev zarok bûn, tev de jin bi jahra xerdelî mirî*
*dilê min perçe perçe, dilê min parî parî*
*bi adarê re bihar digirî li sikakên Helepçe!*

*û ez helbestkarek im di hêlekê de*
*birînên min Nagazakî, êşa'm piç piç Hîroşîma*
*bi dû ewrên jahrî de tiştek nema*
*di Helebçe de ji nêrgiza*
*ji bilbizêqa,*
*ji beybûna...*

* Helebçe, Dîwana 'ramûsan min veşartin li geliyekî'

# *Eger hat, û...*

Heta ku ji min tê, bi qasî ku wext dest dide û nivîs jî bibêje,' min bixwîne,' bêyî ku bibêjim ev ev e, ew ew e; nivîsên ku diweşin dixwînim.

Gellek nivîskar, bi nivîsên xwe yê bi tahm û çêjdar refikeke xweşbîniyê di dîwarê dilê min de vedikin.

Bi min du ziman hene; yek zimanê dil, yê din zimanê mêjî.

Herdu jî, di nivîsekê de, bi qasî ku dikarin yekitî û xemleke bêhempa pêk werînin, di heman nivîsê de dikarin berê xwe ji hev biguherin, weke ku me got yek berê xwe bide dil, yê din mêjî ji xwe re bike armanç...

Mella gotiye, 'Qulzema dil işq e!

Lê ya mêjî?

Zanîn, - ne zanîna ku pêşiyan gotiye 'yê ku zane zane, yê ku nizane baqê nîskan e'- ku nebe bi meriv re, û meriv xwe mişt nekiribe danegirtibe bi ezmûnên berî xwe, di 'darê dinyayê' negihiştibe, nizanibê dinya li dora xwe çawa diloqe; civatê nas neke, deshelatê nebîne, li hemberî rêveçûna ku ditewtihe bi vî alî wî alî de helwesteke mirovane û mêrane wernegire bi wêrekî... û vêya jî bixe stûyê 'nezanînê'?!

Zana jî car caran weke gellek kesan 'cilik' bi ser serê xwe dadikin, xwe li kerrahiyê datînin û dibêjin, min ne dît, min ne bîna!

Wey... zana?!

Zana, berî her tiştî ne 'şeqlebaz û hoqqebaz e!

Û weke ku gotine, 'fituyê di bêrîka xwe de  nagerîne!'

Bi hêz e, lê ne 'yê hêzdar' e.

Û, ji ber ku divê ew nûnerê wêrekiyê be,û zirav bide yê li dû xwe hêza livê bide wan; derba pêşî, derba rastiyê lazime ku ew; yanî zana di kelehên neheqî û bêdadiyê werke!

Lê wexta ku zane, ji nezanan tirsonektir be?

Tirs jî mîna cûreyên nexweşiyan cûr be cûr in!

Lê tirsek heye, ku bi paxila mirov girt evçend bexîl e, evqas bêdelîl e... tişta meriv ya herî pîrozwer bi mirov dide firotin: Tirsa birçîbûnê!

Dema ku min nivîsa Şêxmûs Sefer ya ku her bend bi 'Eger hat û...' destpêdike xwend, bîstekê ponijîm, di ber xwe de min wêrekî û newêrekiya xwe teqiland; bi dû re daketim 'sûka wêrekiyê' li bazarê geriyam, li tevî xwepêşandanên civakî, siyasî bûm... û min gûhê xwe da peyvên xişn û xapînok yên bazirganan:

*Hêviyê didêrin hêviyê!*
*Xweziyê didêrin xweziyê*
*Hêvî; kaya li ber bê!*
*Xwezî çivîkê li ser darê!*
*Jarê jaro, nanê tisî be jî hêvî jiyan bêhêvî nabe!*

Lê hêviya ku di nivîsê de dihat hêvîkirin, ji hêviyê wirvetir, destdanîna ser birînê bû.

Li vir ya herî baş, berî ku berê nivîsê bidim kaş; dorê bidim nivîsa Şêxmûs Sefer, û mefera ku hûn jî li tevî wî bibêjin, 'Eger hat û...' bidim we:

'Eger hat û tu xwe mecbûrî nivîsê bibînî, di ser de jî nikaribî hevokekê binivîsî yan tu ji xwe ne razî yî yan jî ji nivîsê...

Eger hat û girî wekî kenê ji ber xwe fedî nekir di nav civatê de jin nema bi şerpeyan ber devê xwe digirin...

Eger hat û zilam bi zarokan şa bûn di nava kolanan de êdî zarok dikarin bi derenceyên mirovî hilkişin ser piyan û dinyayê xweştir bibînin...

Eger hat û qîzek hivdeh salî gava birayê wê ew li cem yekî dît û tenê silav da wan û derbas bû û keçik ji tirsa xwe ji avahiya heftan neavêt xwarê wê li wî welatî gul sortir vebin...

Eger hat û bajarê te derî vekir ji nasnava te re û tu neşiband xwe wê gavê welatê te hinekî din rizgartir e...

Eger hat û zimanê te meşiya pêşiya te li nav mirovên welatê te, êdî hewce bi tanq û topan nemaye...

Eger hat û me bi "siyasetî" negot "rojbaş" pê re jî me got sibeha

we bi xêr be û bi şevbaş re me got şeva we ya mayî xweş be ma wê şevbuhêrkên me venegerin şevên xwe gelo...

Eger hat û zimanê siyasetê qulibî, siyasetmedarên me tirkî li wasitayeke ku firênê wê teqiyayî siwarkirin serberjêrkî û kurdî jî li pişta xwe kirin bi kaşkaşkî, wê gavê dê Cegerxwîn helbesta "ey heval Robson" bixwîne ji wan re, di mezel de...

Eger hat û zimanê bav û kalan nebû hinceta ku tenê siyaset li ser bê kirin û jê pê de nebû parsekê ber deriyê sazî û rêxistinan ma hîn em ê çi bixwazin...

Eger hat û piraniya ew kesên ku li ser navê me di parlementoyan de, di şaredariyan de siyasetê ji bo me dikin gelo bi zimanê gelê xwe bizanibûna û ya baştir bipeyivîna ji hêla civaknasiyê ve ma wê tiştek sosret bû ya...

Eger hat û dengbêjê welatên min wekî solîstê filan komê bihata naskirin û moçadî nan û ava tisî nebûya strana Çeto Lawo beleheq wê nehatiba gotin...

Eger hat û helbestvanê me, rewşenbîrê me nivîskarê me, peykervanê me di paneleke wêjeyî de yan jî di pêşengehekê de gavekê li "pêşiya" siyasetmedarên me bisekine bêhemdê xwe û ev yek wekî tiştekî asayî bihata dîtin wê terfiyê kê biketa yan jî wê kî/ê biçûk biketa...

Eger hat û siyasetmedarên kurdan di hilbijartinekê de- çi komele çi sazî û çi jî rêxistinên siyasî –piçikekî mutevazî bibûna û xwe nekirina berendam, di ser de jî komîsyona heyî biçûya cem wan û bigota wî/wê "em pir dixwazin hûn di vê hilbijartinê de bibin berendamê me" ma wê dinya biqeliya...

Eger hat û wî/ê kesî/ê bigota "zor memnûn im, filankesê yan jî filankeso ji min baştir dikare bike" ma gelo hespê Îskenderê ku dinya kiribû gavek dikarî me kurdan ji nû de zevt bikira...

Eger hat û dawiya dawî "welatparêzî" tenê ji bo welat bihata kirin me yê sed hezar carî bigota û bilîlanda; "şabaş ji te re xaka min şabaş, tilîlîlîlî"*

Ew roj wê bên, gelo?

Ez bi hêvî me!

*30.07.08*

---

* Taxa Filla, Şêsmûs Sefer,Malpera Diyarname

# *Zarokên Evdêl*[*]

*Bo yadkirina Memed Uzun:*

Wan deman...

Wan demên ku av di tîşên axa de dibû lehî, girik girik diherikî ... û dibû tofan.

Wan çaxan...

Wan çaxên ku mirovan pêlav ji îşkên dewêr çêdikirin; ferên aşan bi lingê hinekan ve, di çîrok û çivanokan de hût heft serî... û mar bi stureh bûn...

Wan wextan...

Di wan wextên ku her Xwedayek xwediyê Xwedatiya xwe... û Ares[**] li erd û ezman şûrê xezebê bû... Khilos[***] ji dehan giravkên di Behra Spî de li dû hevdu ristik, giravek bû.

Ji qeraxên bejahiyê, di nava ava ken î kewzî de Khîos[****] kelekeke ezingvanên Dîcle... Xweda Poseîdaon[*****] çendî bi Xwedayê Xwedayan Zeus re ne li hev be jî, wê kêlîkê di qesre-berqefên Behra Spî de li ser piştê vezilayî, li dora wî Abarbareyen[******] avê; çavên 'wî li reqsa peqilk û belbelûsikên ku ji devên masiyan dertên... guhên wî miç li ser newaya awazekê...

Bi zimane Îonî ye awaz.

---

* Evdalê Zeynikê

** Ares: Di mîtolojiya Yûnaniyan de navê xwedayê şer.

*** Ev benda destên Ji pirtuka Azra Erhat hatiye wergerandin.

**** Khîos: Navê dêrîn ê 'girava Saqizê.

***** Poseîdaon: Xwedaye ava bahran.

****** Abarbare: Ferîşteyén ave.

Aodîos* beşek ji destana Îlyada distire.

Poseîdaon** ku demeke xwestibû Qeranê Xwedayan Zeus li qeyd û merbedan bide, bi dengê şalûlî yê dengbêj re vegeriya rojen şer, şerê Troyiyan û Akhayiyan:

"Xwadeyên di kêf û coşê de hevdu dane ber fîtan.

Şerekî dijwar û giran rakirin di navbera xwe de.

Bave mirov û Xwedayan (Zeus) ji cihê xwe î bala ezman li hev da, birûskan veda.

Li jêr Poseîdon keribî, erd lerizand, hejiyan çiyayên herî bilind bi lûtkeyên xwe ve

Ricifîn ji erq de Îdaye ter-kanî, hejiyan li dû hev bajarên Troyayê û keştiyên Akhayiyan..."**

Dem berî zayînê ye!

Dem mîna aniha wextê bûkaniya xwezayê...

Pilingê bê berî çend rojan ket nava hewrîşimiya bê.

Li girava Khîosê bi ketina pilingê avê re kulîlken beîvan spî spî, bûn sterkên berfê.

Wê kêlîkê bi wê pêl-nermiya Behra Spî re ezman sik i sayî, derûdor zarokeke şîre, di hêlana aramiyê de razayî...

Rhapsodosê*** Îonî di deste wî yê çepê de Rhabdos****, mîna hafizekî Qur" an-xwên an jî weke derweşekî qesîdebêj beşeke Îlyadayê ji beşekê vedixe...

Ew zarokek e.

Zarokek ji Zarokên Homeros

Di girava Khîosê de bi sedan in.

Ew, dibejin 'em ji ezbeta Homerosê Evdal in... Zaroken wî ne em, vejînerên destanên wî... Ne em bûna' dibejin "rist bi rist, bêje bi bêje me.

---

* Aoîdos: Di destana Îlyada de nave dengbéjiya Homeros..

** Poseîdaon: Xwedaye ava bahran.

*** Rhapsodos: Neve dengbejiyé.

**** Rhapdos: Nave şiva/kopalé di deste dengbéjan de.

Îlyada venegota, me ji zimanan negihandibûya zemanan... îro ne Homeros hebû, ne jî stiranan Evdêl

...
*Ez î Evdal im*
*Evdalê Zeynikê bûm*
*Dengbêje oda Surmelî Memet Paşa bûm,*
*Îro bûme pêkenokê qîz û bûkê Heyderan û Zîlaniyan*
*Hêy lêlê, lê heylêêêêê...*
...

Zarokên Homeros bi qasî Homerosê kal xwediyên Îlyada û Odysseîa ne.

Yên ku îro rûyê Evdêl spî bikin û bikin ku qîz û bûkên Heyderan û Zîlaniyan mest û ji xwe ve çûyî guh bidin dengê zingilî yê Evdêl; zarokên wî yên hemdem: Helbestvan, romannûs, çîroknûsên kurd in...

Mixabin; Zarokên Evdêl mîna yên Homeros ne Ii giravekê; her yek teriqî ne bi hêl û derekê de.

Yek ji van Zarokên "teriqî" Memed Uzun e.

Uzun bîst û tiştek sal e heza romanûsiya xwe ji spehîtî û delaliya zimanê Evdêl digire; bi berhemên xwe yên bi zimane zaravayê zimanekî (!) ji kevî û kêlên vî welatî dûr, li ...istaneke bi surr û seqem, navê berhemeke xwe dike "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê", yê berhemeke din dike "Tarî Mîna Mirinê, Ronî Mîna Evînê"...

Her nivîskar –bi taybet her helbestvan– bi afirandin, şêwaz û hunera xwe nivîskarekî din bi xwe re diwejîne.

Nerûdayê rist-hesin û deng-guherçîlî wiha dibêje: "Kedkarê herî kedpîroz ê welatekî hunermendên wê bi xwe ne."

Berî çend salan bû?

Di şeveke bi xwarin û vexwarin de li Amedê, min ev peşniyaz kiribû:

Birêz Uzun, werin mîna Zarokên Homeros em jî bi Evdalî li vî welatî, seranser bigerin.

Uzun ji ber axaftineke xwe 8 ê Adarê li Amedê di Dadgeha Ewlekariya Dewletê –ew ne amede– tê darizandin.

Banga min e: Werin, em biçin piştgiriya Uzun!..

*15.03.2002, Azadiya Welat, jmr: 319*

# *Tucholsky'ên* kurd*

Ji ber şert û mercên dijwar ê li welatê xwe, wekî gellek şairên li erdnîgariya Amerîka Latînî Nerûda jî gellek caran axa xwe terk kir.

Lê, piştî her 'terkkirinê', Nerûda wegeriya welatê xwe yê ku li ezmanê wî teyrên albatros ba dijendin, û hesin û guherçîleyê ji binê erdê dewlemendî vedijend û bexşî xelkê Şîlî'yî dikir.

Nerûda herî pirr ji axa Şîlî hez dikir, an ji Mathilda'yê?

Çavên Elsa'yê, çavên ku bi şairekî helbestan bidin nivîsandin û wekî di şi'ira tesawufê de çav û welat li tevî hev bibin; em ê 'hikmeta' vê 'hezê' bi welatekî ve, an bi du çavan Elsa-Frensa ve girêbidin?

Ez; Lîlî, Elsa û Mathilda'yên wan nas nekim û li tevi min hûn jî nizanibim bê hene an tunene; herdu Dêrikî: Reşîdê Kurd û Qedrî Can ne di 'hembêza' Dêrikê de li bin siya darên hejîrên Xabê; li 'xerîbîyê', bi hisreta nêrîneke dawî li darên zeytûnan, çavên xwe dan ser hevdu.

Osman Sebrîyê ku piştî mirina apên xwe diviyabû bibe serokê eşîra Mirdês, piştî efûya giştî kariye were ser war û wargehên xwe bav û kalên xwe ên li Kolikê.

Ew li Meletiyê ye, pismamên wî –ji sedî sed ji ber timaya mal û milkan– kurê wî dikujin.

Piştî vê qewimînê, Osman wekî bibêje 'ev welat ji min re nabe', vedigere Binxetê û mala xwe bar dike, li Şamê bicih dibe.

'Çûyina' Cegerxwîn bi Apo tahl be jî, ew jî ma ne li Şamê, li Hara Kurdan wekî yekî mişext jiya, û li wir çû ber rehma Xweda?

Sedem çiye ne çiye pê nizanim; lê bi qasî ku dizanim, bi qasî ku di seranserê jiyana xwe de welatek xwest û di ber de bû pêşmerge û

* Toholskî

têkoşiya, û ev daxwazî di her deliveyê de di helwest û helbestên xwe de derkir, Peşêw'ê ku niha 'xwediyê' welatekî bi al û parleman û desthelat e, ne li welatê ku bêriyê dikir; niha, vê kêlîkê li xerîbiyê, li Fînlandê dijî.

Wekî gotina hinekan, gelo şair 'bêwelat' in?

Heke bêwelat bin, şair dema ku dimre çima qewitiya ku termê wî li welatê wî were veşartin, dike?

Berevajî Cegerxwînê gewre, Cegerxwînê ku di dawiya emrê xwe de berê xwe da Swêdê; Kurt Tucholsky'ê ku ji ber xezeba naziyan direve, piştî rûxina desthelata naziyan jî venagere Almanyayê; wekî mirovekî ji rêzê li Swêdê dijî, li Swêdê dimre...

Piştî mirina wî, Swêdî nû pê hesiyan ku şairek hatiye welatê wan, li wir jiyaye, li wir miriye.

Ji bo ku vê 'şerma' xwe bikin rûspîtî, Swêdî piştî mirina Tucholsky bi gellek salan dixwazin rûmetê bidinê, û her sal bi navê Xelata Tucholsky a Wêjeyê xelatekê didin şairekî xerîb, şairekî ku ji neçarî xwe avêtibe bextê Swêd û Swêdiyan.

Ji wan şairên xerîb ez du kesan nas dikim: Yek Şêrko Bêkes e* yê din Selîm Berekat e...

Şêrko di ser Şamê re piyê xwe davêje Swêdê. Selîm ji Kibrisê, ji rexê rûman xwe digihîne welatê li wî 'serê dinyayê'.

Herdu şair jî piştî wergirtina Xelata Tucholsky destûra nîştecîtiyê, û vê paşiyê jî hemwelatiya Swedê disitînin.

Selîm'ê ku di nava ereban de zornavdar e, di nava kurdan de jî bi berhemên: 'Sîsirkên Hesinî', 'Pif Bike Sur'ê', 'Ber bi Olimpiyata Xwedê ve' xwediyê rêzgirtinê ye, û ew hê jî li wir, li Swêdê dijî... Lê, Şêrko piştî 'tifaqa' herdu partiyên sereke, vegeriya Herêma Kurdistan û demekê bû wezîrê rewşenbîrî...

Şair li her derê, li her cihî şair be jî; kela dilê şair herî pir li xerîbiyê dikele, an li ser axa ku li serê dijî, difûre?

Digel helbestên wî yên bi tevahî di çêja stiranan de, xwediyê peyvên stiraneke Şivan:

---

* Şêrko Bêkes sala 1988'ê xelatê werdigire

Rê dûr e delîv teng e / Huner evîn û ceng e/ Şivano lêde lêde / Êvar e li me dereng e' ma ne helbesta Sebrî Botanî ye, û wî ev helbest ma ne li xerîbiyê veristiye?

Wekî Cegerxwîn'ê ku helbestên wî sê qatê helbestên Boudler ji hêla muzîkjenan ve bûne stiran; ma ne Sebrî Botanî jî, Sebrî Botaniyê ku di dawiya temenê xwe de seba 'piçek ewleyî' û 'pariyek nan', sala 92'ê pişta xwe da axa pê şanebûyî, û berê xwe da xerîbiyê?

Yên ku berhema bi navê 'Jînenîgariya Min' a Cegerxwîn xwendibin, di dawiya pirtukê de, di wêneyên ku bi hev re girtine de, dê bibînin ku Cegerxwîn û Sebrî Botanî bi kincên pêşmergetiyê, di sewrê de ne, şerker in!

Hinek; şairan mîna mirovine hesttenik û xwediyê tiliyên nermehevrîşmî bihizirin jî; li ser erdnîgariyên ku xwîn li axê, bahrûd li hewayê vedaye, dê bibînin ku helbestkar pêşî bi pênûsa xwe, paşê jî bi çeka xwe di şer de ye.

Piştî 'şoreşê' bibin serperişt û xwediyê dezgehinan, û hukim li dolaran bikin jî; şairin jê, niha jî di etra çapkirina dîwaneke xwe de ne.

Ne ji çavnebarî; lê wekî gotina pêşiyan gotî, 'hinek dikin hinek dixwin'; wisa dixuye ku di destpêk û dumahîka her şoreşê de 'gellek dikin', 'hindek dixwin'?!

Ev 'gellekî' û 'hindekî', raste rast bi sekna helbestkar ve, bi helwestwergirtina wî a polîtik ve, bi dûrbûn û nêzîkbûna wî ya desthelatê ve girêdayî ye.

Ji ber ku desthelat, li her cihî xwediyê 'destkeftiyan' e; şairên mîna Tucholsky dikarin li xerîbiyê bijîn û bimrin, yên wekî Mayakovskî jî dikarin bibin 'serêş' û 'goriyên' şoreşê!

*13.05.2011*

# *Enûma elîş: Demekê... li jor*

Ji destpêka bê salix heta ku bigihe dema pejirandina evditiyê û peydakirina yek-Xwedayî, mirovî geh da ser rêya çê, geh ji ser dageriya.

Herdu têgeh; çêyî û neçêyî –çi di mîtolojiyê de çi di dîrok û jiyana mirovî ya rastîn de– mîna du nihîtên ku ji cih neyêne leqandin, di jiyanê de girîngiya xwe parastin.

Li hêla din di pirtûkên pîroz de jî em dibînin ku li ser navê bîr û baweriya olî, ol jî ji wê ferasetê ne bêpar in:

Taîmatê ku di mîtolojiya Babîliyan de remza xirabiyê ye, bi kirin, durv û tevgera xwe çibe, di mêjî û baweriya misilmanan de şeytanê 'naletlêhatî' ew e.

Li vir mirov dikare bipirse: Berizîn, şer, pevçûn ji Xwedayan giha mirov, an mirovan bi zanîn Xweda bera pêxîla hevdu dan?..

Di demên dêrîn û bi xumam de Xwedayan çendî ji 'acizî' di navbera xwe de şer rakiribin jî; ji bo ku teşkên xwe biavêjin ser hev û li ser textên xwe î zêrîn û bala xwe veparimînin, evdên ku ji bo suxrekariyê ji heriya çiravî afirandin, kirin şirîkê şerê xwe î navxweyî!

Ev şer kengî qediya?..

Ya rast, di çir-çîrokên gelêrî û mîtolojiyên qewmên berî Qalûbelayê de şer her dem bi kuştina 'hût'û têkçûna 'Xwedayê ne çê' biqede jî, li gorî bîr û baweriya Zerdeştiyê ev şer heta ku Ahur li Ehrîman bête xezebê, didome. Di vî şerê bêdawîn de barê herî giran dîsa dikeve ser milê mirovî. Ahûrê hêzdar bi qasiditiya qasidê xwe, hewara xwe digihîne mirovê ser-reş î neçar:

Heta wê rojê... wê roja ku qirrêjî bi lehiya hesinê helîyayî ji ser rûyê erdê bêt maliştin... mirov, li dijî neçêyiyê şer bike!

*Sibe Newroz e.*
*Sibe hûtê raht ji xewa zivistanê şiyar dibe.*
*Sibe ne roj ji şevê ne şev ji rojê dirêjtir e.*
*Sibe Marduq Taîmat, Kawa Dehaq dikuje.*
*Sibe Newroz e.*
*Ehmedê Xanî berî 350 salan wusa salix dide:*
*...*
*...*
*Zanayê miemmerê kuhensal*
*Ev rengê ha go bo me ehwal*
*Go adetê pêşiyê zemanan*
*Evbû li hemû cî yû mekanan*
*Wextê wekû şehsiwarê xawer*
*Tehmîl-î dikir di meha Azer*
*Yanî ku dihate bircê Sersal*
*Qet kes nedima di mesken û mal*[*]

*...*
*Sibe Newroz e.*

Sibe li ser vê axê, li her malê li her taxê; ji rêzeçiyayên Zaxroj heta bigihe berpalên Cûdiyê Kal ji duhezarûşeşsed salî ve cejnek dê were pîroz kirin.[**]

Bi vê boneyê, cejna we û Roja Helbesta Cîhanê bi bendehelbestekê li we piroz dikim:

*agirê daran tîrêja rojê*
*şevqa adaran pêşengê dozê;*

*doza biharî, bîhna nêrgizê*
*kewê serdarî, destpêkê bezê;*

*serdarê teyran, teyrbazê çiyê*
*spartakusê arê azadiyê!..*[***]

---

* Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, Wş. Hasat

** Azadiya Welat, 2002, Jmr. 321.

*** Destana Kawa, Arjen Arî, Wş. Mîr. 2003

# *Min ji bîr meke*[*]

*Soxî...; azadî ku tu hatî*
*Û derkevî ser riyan, bigerî li vî welatî*
*Min jî ji bîr meke, were ser gorna min*
*Were; da em bimeşin di riyên nas de careke din*
*Bi hev re, careke din da em bibînin xelekê zincîrên şikestî*
*Û em meyzênin bi hev re li rûxîna darazên kirêt*
*Û êşên ku hatine bexşandin, û wendayên jibîrkirî!*

*Bo ku wan bibînim, azadî, te û wan tevan*
*Belkî bikarim rabim ji nava miriyan!*
*...*
*...*

Dema ku min ev helbesta şa'irê Afrîkayî[**] xwend, bêhemdî xwe vegeriyam sala 2003yê, kêlîkên daxuyandina Herêma Kurdistanê!

Wan rojan bi bihîstina vê daxuyandinê re; li Başûrê Rojava, li Bakûr gelek mirov çûbûn ser gornên bav û kalên xwe, mizgînî dabûn wan, û gotibûn, 'Raaabinnn... rabiiiin ji gornên xwe! Kurdistan ava bû!

Kurdistan, axa bav û bapîran, li tevî me; pêçeka zarokên di pêçekê de û ên ku niha rabûne/radibin tena û hêdî hêdî hînî meşê dibin; bi qasî ku stargeha em ên li serê dijîn û li serê dê bimirin; bi dar û daristanên xwe, bi şkêrr û şikeft û berqefên xwe wargeh û jîngeha kêzik û kurmika ye, ya teyr û tilûra ye, bi her buhist axa xwe!

Ew war, ev diyar, ev erdnîgar bi navê Kurdistanê bi nav nebe jî,

---

* 'Min ji bîr meke': Don Mattera, Helestvanê Afrîkiya Başûr

** Paul Êluard, 'Azadî' Sacha Ilitch, Wş. Avesta

weke ku em bixwazin miriyekî şîrînê ber dilê xwe bi navlêkirinê re ji nava miriyan rakin, em navê wê didin zarokên xwe: Kurdistan!

Kurdistan... dayikek li ber Kurdistana xwe rûniştibe û bi şeheke diranhûr ketibe şehkirina porê wê;şa'ir bi bihîstin û pêjnkirina vî navî re, di wê kêliya ku bêriya Kurdistana xwe kirî de, rista xwe lê kiriye, û spartiye newaya hozan:

Kurdistanê Kurdistan/ baxçê gulan derdê dilan!

Wekî gotina pêşiyan, 'Xweda derd dabe,derman jî daye'; li tevî em ên ku li serê dijîn, dermanê şev û rojê, dermanê stêrên li asîman... û yê vê axê ye jî azadî!

Azadî; ji ya takesî heta bi ya civakî û gelêrî; li ser axa xwe, li gel heval û hogir, hezkirî û dildar; di nava xizm û yaran de xweş e!

Ev axa ra û rehên me be, em ên li ser kit kit darhenar in!

Wekî darhenarê pêdiviya me jî bi rojê heye, bi hewayê heye.

Lê heke tu darê bibirî ji axê, an jî hilbikî/rakî li tevî ra û rêhên wê?

Wê gavê weke dara hatî birîn, mirovê mirî dê çi bike ji tîhna rojê, ji guvvîna bayê ku dê bê?

Weke kes, carinan şûm û zirziya şa'irtiyê mîna 'mozika' kerb û kînê hatibe bi dor min de û min eyan û beyan gotibe, 'weke şa'irekî... gelî berêzan, ez bi saya serê we bindestan, di nava we de bindest im...' jî; di wê hişmendiyê de me û dizanim ku bindestiya min jî azadiya min jî bi ya vê civakê, bi ya vî gelî ve mîna xelekê zîncireke qayim, vebestî ye!

Ji ber vê şêwe hizirîn û ferasetê ez ê di dil û di çav xwe de bi bikaranîna vî zimanî serê 'benê azadiyê' bidestxistî; dibêjim, 'azadiya min ya her kesî, ya her kesî ye azadiya min'!

Û ne ez; ne tu, ne ê din, em nikarin wisa xwelîser, derbeder û tepeser li ser vê axa ku bi me re li hêviya azadiyê dibawişke û dipawe, bêyî wê û bêyî azadiyê bijîn!

Em bijîn/ qima xwe bi bindestiyê, bêmafiyê, bêrûmetiyê bînin û bixwazin torr torr bijîn jî; loooo heyran, ne ji mafê min û te ye ku em zarokên ku ji niha de pêçiyên xwe vedikin û dikin 'V'; ji devla

hembêzên dayikan bispêrin çar dîwarê zîndanan, û dahatuyeke tar î taristan!

Ji hindê û hindeyin din, êdî wext hatiye ku deriyê her zîndanê vede/bêt vekirin!

Êdî wext hatiye ku kevok bi kevokî firrekê li xwe bidin û bifirin!

Êdî wext hatiye ku ji lûtkeyên çiyan qewdeberfîn û refebazin werin ber bi war û kîşwera biharîn ve...

Û... edî wext hatiye ku em bi yek dengî biqîrin û bibêjin:

*Li ser hemû rûpelên xwendî*
*Li ser hemû rûpelên spî*
*Kevir xwîn kaxez an jî arî*
*Navê te dinivîsim:*
*Azadî!**

* Kurdî A. Arî, ji weguheztina tirkî a Ahmet Yalçinkaya.